# ÇIRA

*kovara kulturî*

kovara komeleya nivîskarên kurd li swêdê

sal 2
hejmar 6
havîn 1996



6

www.arsivakurd.org

www.arsivakurdi.org

# Naverok

**Sal 2 • Hejmar 6 • Havîn 1996**

**Dewleta Benî Hesenweyhiyan 3**
Îbn Xeldûn

**Çend rûpel ji jiyana Ereb Şamîlov 14**
Wezîrê Eşo

**Bavê Fexriya û Felîtê Quto 23**
Hemit Kilicaslan

**Çend pirsên rêzimana Kurdî 29**
Mûrad Ciwan

**Çend kilam li ser bûkan 44**
Berevkar: Zinarê Xamo

**Kirdkî (Zazakî) di suffîksî 48**
Malmîsanij

**Kirmanckî (fekê Dêrsimî) de zuhûmariye û zafhûmariye 64**
Mûnzûr Çem

**Kirdkî (fêk Çebaxçor û Palî) di nêrî û maykî 71**
Seyidxan Kurij

**Hesenê Alikê 78**
Arêkerdox: Endam Ronas

**Kovareke nû bi zimanê Bulgarî: "Kurdisko Slovo" 89**
Lewend Firat

**Cîhana pirtûkan 91**
Amadekar: Rohat Alakom

www.arsivakurdi.org

**Sal 2**
**Hejmar 6**
**Havîn 1996**

| | |
|---|---|
| **Xwedî** | Komeleya Nivîskarên Kurd li Swêdê |
| **Redaksiyon** | Rohat Alakom<br>Osman Aytar<br>Firat Cewerî<br>Mahmûd Lewendî<br>Zinar Soran |
| **Şertên abonetiyê** | Salek: 200 SEK<br>Nîv sal: 100 SEK<br>Hejmarek: 50 SEK<br>*Ji bo welatên din mesrefa posteyê lê zêde dibe.* |
| **Îlan** | Rûpelek: 1 000 SEK<br>Nîv rûpel: 500 SEK<br>Çarîk rûpel: 200 SEK |
| **Pergala rûpelan** | Osman Aytar |
| **Rismê bergê pêşî** | Du Kurdên Hezoyê (Kozluk)<br>(Globus, cild LVII, 1890) |
| **Postgiro** | 46 32 31-1 |
| **ISSN** | 1400-528X |
| **Çap** | Apec-Tryck |

*Berpirsiyariya her nivîsê, ya nivîskarê/nivîskara wê ye.*

---

**Navnîşan • Adres • Adress:**
c/o Tayfun, Hyppingeplan 21, 2 tr., 163 62 Spånga/SWEDEN,
Telefon: +46(0)8-760 69 38

www.arsivakurdi.org

# Dewleta Benî Hesenweyhiyan

## Îbn Xeldûn

*'**Ebdurrehman îbn Xeldûn el-Mexrîbî** (1332-1406) ji nav dîroknasên Îslamê wek fîlozofê pêşî yê dîrokê hatiye nasîn. Ew hê bêhtir bi "**el-Muqeddîmeya**" xwe ku cildê pêşî yê dîroka wî ya "**Kîtab el-'Îber we Dîwan el-Mubteda' we el-Xeber fî Eyyam el-'Ereb we el-'Ecem we el-Berber**" e, nav û deng daye. Di "el-Muqeddîme"ya (pêşgotina) xwe de ew dîroka civak û fîlozofiyê dide nasîn û hinek dîroknivîserên Îslamê ên berî xwe mîna **el-Mes'ûdî û el-Waqidî** rexne dike. Bı vê re ew salixan ji awayên pêşveçûna civakî, olî, siyasî, aborî û zanistî jî dide û herweha ew awayê damezrandin, bipêşveçûn û hilweşandina dewletê bi şêweyekî hêsayî û pêlbipêl (kronolojîk) diyar dike.*

*Li gor Îbn Xeldûn "Şahîtî ji tevger û libata jiyaneke hêsa û ji çînên cuda dest pê dike û bi pêş ve diçe. Hin bi hin ew berfireh dibe û kesên din jî tên li hawîrdorê wê kom dibin, ew wusa pirr dibin ku cih li hin damezrênerên berê teng dibe û ji dora serokatiyê vedikişin. Bêguman ji bo nav û deng û jiyaneke bi xweşî û şadî çiqas diçe mirov li dora şah zêde dibin û ev yek jî bi xwe re xercên (mesrefên) zêde derdixe holê. Ji bo peydakirina vî xercî jî bac û xeraceke zêde dikeve ser milê xelkê û ev jî dibe sedemê xebateke zahf ku zêdeyî biriya (qeweta) xelkê ye. Ji hêlekê ve vekişandina hevalbendên damezrêner ên mîrîtiyê û ji aliyê din ve jî westandin û acizbûna gel ji kar û xebatê dibe sedemê qelsbûn, perçebûn, û bidawîanîna hêza wê dewlet yan jî şahîtiyê". Stîla Îbn Xeldûn stîleke klesîk û tevlîhev e, duberekirin tê de pirr e û herweha jî ew hêsayî û bi gelemperî ye.*

*Îbn Xeldûn ji malbateke kevn ya Erebên Başûr e ku di saraya Sevilla de rolekî mezin leyistiye, lê piştre hê berî çêbûna Îbn xeldûn ji wir koçî Tûnis kirine. Ew li **Tûnis** ji diya xwe çêbûye û li wir nêzî sarayê mezin bûye; hê di bîst saliya xwe de wî gellek karmendiyên bilind li sarayên cuda mîna yên **Fas û Granada**, girtine. Ew li gellek deverên cîhanê mîna Misir, Şam, Hîcaz û Endulusê geriyaye û ji bilî vê berhema wî ya hêja wî doktorayek jî li ser mentiq*



www.arsivakurdi.org

*û felsefê nivîsiye.*[1]

*Îbn Xeldûn di gellek cihên vê berhema xwe ya dîrokê ku navê wê li jor bihûrî de fena xelkê din qala Kurdan jî kiriye. Min li vir hinek ji wan cihên ku tê de behsa rewşa mîrîtiyeke Kurdan ya Hesenweyhiyên (Hesenmeyh) ku di navbera salên 950'î û 1050'î de desthilatdarî kirine, dike û peywendiyên wan bi xelîfetî û der û dorên wan re dide zanîn, wergerandiye. Min di çend cihan de jî ew daye ber tarîxa* ***Îbn el-Esîr a el-Kamîl fî et-Tarîx.***

***Emîn Narozî***

**Dewleta Hesenmeyhiyên ku di rabûna bi doza 'Ebbasiyan de ji Kurdên pêşî yên Dînewer (ed-Dinawer) û Samexanê (es-Samexan) ne û destpêka kar û bar û tevgera rewşa wan.**

Hesenweyhê kurrê Huseynê Kurdî ji qebîleya Kurdên **er-Rîzenkas** e [2] ku ji eşireke wan re "**ed-Duweyletiyye**" (Duweyletî) jî dihate gotin. Ew xwediyê keleya **Seryac** [3] û mîrê **el-Birrifkan** [4] bû. Ew milk jê re ji xalên wî **Wendad** û **Xanemê** kurrên **Ehmedê** kurrê **Elî** mabû. Ew [Xalên wî] ji kurdên el-**'Ebabiyye** [5] bûn û nêzî pêncî salî li ser dora **ed-Dinewer,** (Dînewer) **Hemezan** (Hemedan), **Nehawend, Samexan** û hinek herêmên Azerbaycanê heyanî sinorê Şehrezorê bandorî kiribûn û heryek ji wan bi hezaran leşkerên wan hebûn. Di sala 349/960'î de Wendadê kurrê Ehmed mir û kurrê wî **Ebû el-xenaîm Ebd el-Wehhab** hate cihê wî ta ku qebîlayeke kurdên **eş-Şadincan** [6] (Şandincaniyan) ew dil girtin û teslîmî Hesenweyh kirin, wî jî dest danî ser kele û aqarên wî hemû.

Xanem di sala 350/961'ê de mir. Kurrê wî **Ebû Salim Desîm** [7] li keleya **Fetenanê** [8] kete cihê wî ta ku **Ebû el-Fet'h ibn** (kurrê) **el-'Emid** wî ji holê rakir û keleyên wî yên Bustan,[9] Xanemefaq [10] û yên din tev vale kirin.

Hesenweyh mirovekî xuyxweş û ji kar û barê xwe re serdest bû, wî keleya **Sermacê** bi tatikên mîmarî [11] avakir û herweha li Dinewerê jî camiyeke wusa çêkir. Wî gelek xêr û bêr li mekke û Medîneyê didan. Dema **Benû Buweyh** (Buweyhî) li welat hatin ser hukum û **Rukn ed-Dewle** danîn ser **er-Rey** (Reyyê) û der û dorên wê dane ser hingê ew bû alîgir û alîkar ji bo hêza neyarên wî (Heseweyh). Wî jê [Rukn ed-Dewle) re siyanet girt û çavên xwe ji kirinên wî re digirt ta ku di navbera serdarekî **ed-Deylem** yê bi navê **Îbn Mîsafir,** hin giregirên wan û wî [Hesenweyh] de bûyerek qewimî. Hingê Hesenweyh têde (di wê bûyerê de) ew [Îbn Mîsafir] şikand, xiste cihekî asê, dora wî girt û agir berdayê. Ew nêzikî mirinê bû bes piştre ji bo wî ewleyî hat xwestin lê Hesenweyh pêre xedir kir û sozê xwe şikand. Ev yek pirr li zora Rukn ed-Dewle çû, hêrsên wî rabûn, xeyidî û di sala 359/969'an de, wezîrê xwe **Ebû el-Fedl îbn el-'Emid,** bi leşker ve şande ser. Ew çû Hemezanê [Hemedanê] û



www.arsivakurdi.org

dor li Hesenweyh teng kir, lê piştre Ebû el-Fedl mir û kurrê wî Ebû el-Fet'h jî li ser hinek mal, pêre li hev hat û ji ser dagerîya.

## Mirina Hesenweyh û mezinatiya kurrê wî Bedir

Di sala 369/979'an de Hesenweyh mir û zaruyên wî ji bo şerê navbera **'Îded ed-Dewle** û birayên wî **Muhammed**, û **fexr ed-Dewle** ji hev qetiyan. Birrek zarûyên wî hebûn: **Ebû el-'Ula, Ebdurrezzaq, Ebû en-Necm Bedir, 'Asim, Ebû 'Ednan, Bextîyar** û **'Ebdulmelik.** Bextiyar ku li keleya Sermacê dima û mal û zexire jî tev li cem bû name ji 'Îded ed-Dewle re rêkir û kete ber fermanrewayiya wî, lê piştre ji ber fermandariya wî derket, 'Îded ed-Dewle jî leşker şande ser keleya ku lê dima wê û yên din tev ji wan sitand. Dema 'Îded ed-Dewle çû şerê birayê xwe Fexr ed-Dewle, Hemezan [Hemedan] û Reyyê vegirt, da birayê xwe **Mueyyid ed-Dewle** û Fexr ed-Dewle jî çû gihişte **Qabûsê îbn Weşemgîr,** [Mîrê çaran ê malbata Benî Zeyyad e. -E.N.] hingê 'Îded ed-Dewle zivirî ser walîtiya Hesenweyhê Kurdî. Wî Nehawend, ed-Dînewer (Dinewer), Sermac vegirt û mal û zexîreyên wî ku gellek pirr bû, giş zeft kir. Bi wan re wî dest danî ser hinek keleyên Hesenweyh yên din jî. Zarûyên Hesenweyh çûne cem 'Îded ed-Dewle, ew rabû wî 'Ebdurrezzaq, Ebû el-'Ula û Ebû 'Ednan girt û ji nav wan wî Ebû en-Necm Bedir îbn Hesenweyh ji xwe re hilbijart. Wî ew [Bedir] perrû kir, zilam danê, ew xurt kir û kire mezinê kurdan. Wî [Bedir] jî ew navçe tev zeft kirin û nehişt ku dijîtî û xirabiya kurdan li wan hêlan bibe. Rewşa wî pirr baş bû û [ji ber vê yekê] birayên wî jê hesidîn, ji nav wan 'Asim û 'Ebdulmelîk serî rakirin û Kurdên li dijî wî dane hev. 'Îded ed-Dewle leşker şande ser Asim, êrîş birinê, ew şikandin, hêsîr girtin û birin Hemedanê. Piştî vê yekê ku di sala 370/980'yî de bû êdî tu xeber jê nehat. Zarûyên Hesenweyh yên din giş hatin kuştin û Bedir li ser karê û barê xwe qenc bi cih bû.

## Cengên Bedirê kurrê Hesenweyh û leşkerê Muşerref ed-Dewle

Gava 'Îded ed-Dewle mir û kurrê wî **Samsam ed-Dewle** hate cihê wî, hingê birayê wî **Muşerref ed-Dewle** li Fars serî li ber rakir û piştre jî Bexdadê jê sitand. Piştî mirina birayê xwe Mueyyîd ed-Dewle, Fexr ed-Dewle îbn Rukn ed-Dewle jî ji Xorasanê zivirîbû Esfehan û Reyyê û di navbera wî û Muşerref ed-Dewle de xirecir derket, çiku Muşerref ed-Dewle berê kîn jê girtibû. Dema wî [Muşerref ed-Dewle] Bexdad ji destê Samsam ed-Dewle ku **Qaratekin el-Cehşarî** serdar, rêçenas û desthilatdrê ser dewleta wî bû û ev yek jî pirr li zora Muşerref ed-Dewle dihat, derxist û lê bi cîh bû hingê wî (Muşerref ed-Dewle) jê [Qaratekîn] re ji bo şerê Bedirê kurrê Hesenweyh leşker amade kir, qesta wî yek ji herdu aliyan bû [yanî dixwest ku yan Bedir yan jî Qaratekîn yê din ji holê rake -E. N.]. Ew di sala 377/987'an de çû Bedir û li newala **Qermîsînê**

www.arsivakurdi.org

leqayî wî bû. Bedir şikest, reviya xwe veşart, wan ew nedît û xwe berdan nav konên wî. Piştre Bedir li wan zivirî çû pêşîbirrê ji wan sitand, ji nedî ve êrişî wan kir wan ji hev dêrdexan kir û şelihand. Qaratekîn di çolekê de xwe ji wan xelas kir û çû pira **en-Nehrewanê**, hevalên wi yên şikestî jî li wir gihîştinê û çûn Bexdadê. Bedir deverên çiya giş zeft kirin, hêza wî pirrtir û rewşa wî baştir bû. Ew her serkeftî û payedar ma. Di sala 388/998-999'an de di heyamê **Sultan Beha ud-Dewle** de Ew ji aliyê dîwana Xelîfetiyê ve hat xelat kirin û bi nasnavê **Nasîr ud-Dewle** hat gazî kirin. Wî pirr xêr li mekke û Medîneyê didan û li Hîcazê zahf xwarin dida nobetdarên 'Heccê. Wî nehişt ku hevalbendên wî yên Kurd xirabî û şêlandinê bikin û ji bo vê yekê jî her ku çû qedrê wî bilind bû û navê wî bi başî belavbû.

## Çûyina Ibn Hesenweyh bi Ebû Ca'fer îbn Humuz re ji bo dorvegirtina Bexdadê

**Ebû Ca'fer el-'Heccac îbn Hurmuz** li Îraqê nazirê Beha ud-Dewle bû, piştre wî ew jê avêt û seydayê (mamosteyê) hurmuz Ebû 'Eliyê kurrê Ebû Ca'fer anî cihê wî û kir serleşker. Lê Ebû Ca'fer jî li navçeya Kûfeyê ma û şerê serdarê leşker kir, serleşker ew şikand lê dûvre di sala 363/973'yan de dîsa di nav wan de çend caran şer derket. Wan (Ebû Ca'fer û hevalbendên xwe) li ser xirabiya bi Erebên **Benî 'Uqeyl** ['Uqeylî], **Xefface** û **Benî Esedan** [Mala Şêran] re domand û ew ditirsandin. Wê demê Beha ud-Dewle jî bi şerê **Îbn Wasil** ve ku heyanî sala 393/1002'yan domandibû, mijûl bû. Îbn Wasil jî qesta **Qilîçê** xwediyê Xorasanê kiribû çûbû cem û li dijî serleşker, ji bo xirabiya wî li hev kiribûn. Di wê salê de ew (Îbn Wasil) mir û serleşker jî rabû neyarê Bedirê Kurrê Hesenweyh **Ebû el-Fet'h Muhemmed îbn Qilîç 'Ennan** (12) danî cihê wî. Wî ['Ebû el-Fet'h] ew Kurdên, ku çendî Şadincanî bûn jî lê dîsa hemberiya Bedir dikirin, li ber wî rakir. Hingê 'Hulwan di destê wî (Ebû el-Fet'h) de bû, Bedir bi vê kirina Qilîç 'Ennan pirr hêrs bû, xwe da hêla Ebû Ca'fer û gellek bavikên Kurdan mîna yê **Mîr Hindiyê Se'dî, Ebû Îsayê Se'di** (13) yê kurrê Muhemmed, **Weramê** kurrê Muhemmed û hinekî din li dora wî civand. Eliyê kurrê Mezîd el-Esedî jî bi wan re bû, Teva bi hev re ajote ser Bexdadê û bi qandî qonaxekê nêzî wê danîn.

Ebû el-Fet'h îbn 'Ennan xwe da cem serdarê leşker û ji bo parastina Bexdadê pê re ma ta ku nûçeya şikestina Îbn Wasil û serkeftina Beha ud-Dewle ji wan re hat, hingê ew bi lez ji ser Bexdadê rabûn, Ebû Ca'fer jî tevî Ebû Îsa û peyamê Beha ud-Dewle çû 'Hulwanê. Di pey de Îbn Hesenweyh çû wîlayeta **Rafi'ê îbn Me'anê** 'Uqeylî ku li Muqelledê bi **Benî el-Mesîb** (Mesîbiyan) re bûbû yek. Dema Bedir Ebû el-Fet'h îbn 'Ennan ji 'Hulwan û Qermîsînê deranîbû hingê wî (Rafi') ew hewandibû [û ji ber vê yekê] jî Bedir çû dest danî ser wîlayeta wî û leşker şande ser cihê Rafi' **el-Cenabê**, ew şewitand û



www.arsivakurdi.org

hedimand anî xwar. Ebû el-Fet'h îbn el-'Ennan xwe gihand cem serleşkerê Bexdadê û jê sozê alîkariyê sitand. Gava Beha ud-Dewle Îbn Wasil kuşt û ji şerê wî vale bû hingê ferman li leşker kir ku here ser Bedir îbn Hesenweyh, çiku wî alîkarî bi wanên ku çûbûn ser Bexdadê re kiribû û çûbû hawara Îbn Wasil. Ew (serleşker) çû heya gihişte Cindîsabûrê, li wir Bedir ji bo lihevhatinê qasid şande cem û xercên (mesrefên) leşkerê wî dayê, ew jî vegeriya.

## Serîhildana Hîlal îbn Bedir îbn Hesenweyh dijî bavê wî û şerê nav wan

Diya Hilalî ku ji bavikê Şadincaniyan bû, meriva Ebu el-Fet'h îbn 'Ennan û Ebû eş-şewek îbn Muhelhil bû. Bavê wî di destpêka çêbûna wî de, ew (dîya wî ) berdabû û ji ber vê yekê jî ew ji bavê xwe dûr ketibû. Bedir, kurrê xwe Ebû Îsa ji xwe re çêtir dît û bi tenê es-Samexanê da Hilal. Wî (Hîlal) cînariyeke xirab bi **Îbn el-Medadiyê** (14) xwediyê Şehrezorê ku dostê Bedir bû, re kir, çendî ku bavê wî xwest ku dev jê berde jî lê ew jê neqeriya. Wî her dişande cem Îbn el-Medadî û gefan lê dixwar. Bavê wî xeber şande cem û sondika wî xwar, li ser vê yekê wî jî di keleya Şehrezorê de dora wî [Îbn el-Medadî] girt û li ser sekinî ta ku ew zeft kir, Îbn el-Medadî kuşt û dest danî ser mala wî. Hingê nava wî û bavê wî zahftir xirabû û ji ber ku bavê wî xwegirtî bû [Ji bo ta'et û îbadet xwe ji kar û barê dinê gitibû - E. N.], hevalbendên wî tev bi ser Hîlal ve çûn û ew çû şerê bavê xwe. Ew li Dinewerê rastî hev hatin, Bedir şikest, hêsîr bû, lê Hilal piştî vegirtina keleya ku ew lê dima rabû têra wî mal dayê û wî ji bo îbadetê berda. Gava Bedir li keleyê bi cih bû ew [kele] qenc asê kir û xeber şande cem Ebû el-Fet'h ibn 'Ennan û Ebû Îsa Se'dî îbn Muhammed ku li **Esterabazê** (15) bûn û ji bo girtina aqarê Hilal ew xirandin. Ebû el-Fet'h hingê çû Qermîsîne û ew der zeft kir. Wî ji wir berê xwe da Deylemê Hilal jî li pey çû wir û şûr xiste nav Deylemiyan. Îbn Rafi' fersend dayê ku Ebû Îsa bigire lê wî [Hîlal] ew bebixişand û bi xwe re bir. Bedir jî ji keleya xwe şande cem Beha ud-Dewle û jê daxwaziya alîkariyê kir. Wî wezîr **Fexr el-Melik** tevî hinek leşker jê re şand û çû heyanî Sabûrxwastê. Hilal bi Ebû Îsa îbn Se'dî Şêwirî, wî nîşan da ku ya baştir ketina ber fermana Beha ud-Dewle ye. Ger ku nekeve ber emrê wî jî bira leza şerê pê re neke û heya jê bê dereng bixîne. Ew li gotina wî kete gumanê [bi ya wî nekir](16) û bi şev çû dora Fexr el-Melîk girt. Fexr el-Melîk bi leşker re siwar bû û li ser rawestiya heya ku Hîlal bêgav bû û şande cem, diyar kir ku ew ji bo ketina ber emrê wî hatiye wir. Gava peyamê wî çû cem Bedir wî ew qewirand û ji wezîr re diyar kir ku ew xayin e û li wan dek dike. Wezîr bi vê gotina wî kêfxweş bû û gumana wî ji ser Bedir rabû û emrê leşker kir ku êrîşî wî bikin. Ji dîlgirtina Hîlal û bi leztir qet hew dibû. Wî [Fexr el-Melîk] jê va ku keleyê bide Bedir, wî [Hîlal] jî bi şertê ku bavê wî ne ji destê wî bigire erê kir û daxwaziya êminîyê ji bo diya xwe û kesên ku di keleyê de



www.arsivakurd.org

diman kir, wezîr jî ewleyî da wan. Wî (wezîr) keleyê zeft kir, dest danî ser malê ku tê de bû. Tê gotin ku : "Ew çil hezar **budre dinar** (zêr) û çarsed **budre dîrhem** (zîv) bûn [17] ji bilî cil, çek û gewherên hêja. Wezîr Fexr el-Melik keleyê da Bedir û dageriya Bexdadê.

## Girtina Zahirê [18] kurrê Hîlal bi ser Şehrezorê ve

Bedrê kurrê Hesenweyh ji Şehrezorê xwe berdabû Bexdadê cem serdarê leşker û nobetdaran danîbû ser Şehrezorê. Di sala 404/1013´yan de gava Hîlalê kurrê Bedir girtîbû hingê kurrê wî Zahir çû ser Şehrezorê. Di nîvê salê de wî bi leşkerê Fexr el-Melik re şer kir û wê [Şehrezorê] ji wan sitand. Wezîr xeber jê re şand, lome lê kirin û lê ferman kir ku hevalbendên wî yên dîl hemû berde, wî ew berdan û Şehrezor jî di destê wî de ma.

## Kuştina Bedirê kurrê Hesenweyh û Hîlalê kurrê wî

Piştre mezinê çiya [19] Bedirê kurrê Hesenweyh çû ser **Hesen îbn Mesud el-Kurdî** [20] da ku welatê wî vegire. Wî ew li keleya kusceyê [21] xiste hesarê, Hesara wir dirêj ajot, hevalên wî pêre xayin geriyan û şêwra kuştina wî kirin. **Cureqaniyan** (el-Cureqan) ku bavikek ji yên kurdan bû karê kuştina wî girtin ser xwe, wan ew kuşt û bi lez çûn ketin ber emrê xwediyê Hemedanê Şems ed-Dewle îbn Fexr ed-Dewle. Dema nûçeya kuştina Bedir gihîşte Zahirê kurrê Hîlal ku hingê ji ber wî (Bedir) reviyabû herêma Şehrezorê, lê xist hat ku milkê xwe bi paş ve bistîne. Şems ed-Dewle pê re şer kir wî şikand, dîl girt, li Hemedanê xiste hebisê û dest danî ser aqarên wî. Kurdên Kurî (El-Kuriyye) [22] û Şadincanî ketin ber fermana Ebû eş-Şewk. Hingê bavê wî Hîlalê kurrê Bedir jî li Bexdadê li cem sultanê dewletê girtî bû wî ew berda leşker pê re amade kir ku here welatê xwe ji Şems ed-Dewle bistîne. Şems ed-Dewle rabû avête ser wî şikand, hêsîr kir, piştre wî kuşt û leşkerên wî jî şikestî zivirîn Bexdadê. Di nav aqarê Bedir de **Sabûrxwast, Dinewer** (ed-Dinawer), **Berûcird, Nehawend, Estrâbaz**, hinek ji herêma **Ehwazê** û hinek beşên din ji kele û wîlayetên mayî hebûn. Ew mirovekî dadimend pirr qencîxwaz û himmetbilind bû. Dema ew û kurrê wî Hîlal mirin nebiyê wî Zahir jî li Hemedanê li cem Şems ed-Dewle girtî bû.

## Kuştina Zahirê kurrê Hîlal û vegirtina Ebû eş-Şewk welat û serkariya wan

**Ebû el-Fet'h Muhammed îbn 'Ennan** mîrê kurdên **Şadincanî** bû û 'Hulwan di destê wî de bû. Nêzî bîst salî ew li wir mezinê eşîra xwe bû. Wî di wîlayet û deverên çiya de gellek tengî û zoriyê ji Bedirê kurrê Hesenweyh û kurrê wî

re derdixist. Ew di sala 401/1010'an de mir, kurrê wî **Ebû eş-Şewk** kete cihê wî, ji aliyê Bexdadê ve leşker hatin wî, ew [Ebû ş-Şewk] çû şerrê wan lê şikest û nehiştin ku here 'Hulwanê heyanî navbera wî û wezîr Fexr el-Melik ku piştî serleşker **Beha ud-Dewle** ew anîbû wir, baş bû. Dûvre Şems ed-Dewle îbn Fexr ed-Dewle îbn Buweyh, Zahir îbn Hîlal îbn Bedir - piştî ku wî ji xwe re da sondê - berda, danî ser welatê wî yê çiyan û wî kire mezinê xelkê wî.

Di navbera wî û Ebû eş-Şewk ê xwediyê 'Hulwan û es-Sehlê de gelşeke kevn hebû. Zahir rabû leşker da hev, çû şerê Ebû eş-Şewk, wî şikand û birayê wî **Se'diyê** kurrê Muhemmed kuşt. Piştre careke din leşker civand û çû ser Ebû eş-Şewk, dîsa zora wî bir û wî ji 'Hulwanê derxist. Zahir Besîtê hemû vegirt û li **en-Nehrewanê** rûnişt. Çendak dûvre ew li hev hatin û Zahir bi xweha Ebû eş-Şewk re zewicî. Bes dema Zahir li Ebû eş-Şewk ewle bû û pişta xwe dayê wî bi dizî avête ser û heyfa birayê xwe jê hilanî. Hevalên wî (Zahir) ew birin li gorîstanên Bexdadê veşartin û Ebû eş-Şewk jî erdê wî tev zeft kir û heya Dînewerê pê ve çû.

Di sala 414/1023'yan de dema **'Ela ud-Dewle ibn Kakeweyh** bi ser Hemedanê ve girt, wê xiste bin destê xwe - ji xwe hingê leşkerê **Şems ed-Dewle îbn Buweyh** jî şikestibû - rabû berê xwe da ed-Dinewerê, wê ji destê Ebû eş-Şewk derxist û piştre çû Sabûrxwast û deverên din jî zeft kir. Wî da pey rêça Ebû eş-Şewk lê sultanê Bexdadê **Muşerref ed-Dewle** doza bexşandina Ebû eş-Şewk li 'Ela ud-Dewle kir û ji ber vê yekê ew ji pey zivirî. Di sala 420/1029'an de dema Xuziyan avête ser Reyyê, hingê wan Hemedan jî zeft kir û li wan der û dorên Esterábazê û gundên ed-Dinewerê xirecir derxistin. Wî çaxî Ebû el-Fet'h îbn Ebû eş-Şewk derket çû şerê wan, ew şikandin û gellek ji wan dîl girtin. Piştre ew li ser berdana hesîrên wan bi wan re li hev hat û ew bi paş ve zivirîn. Di sala 430/1038'an de Ebû eş-Şewk avête ser yek ji devera çiyayê Qermîsînê û xwediyê wê ku kurdekî **et-Terehiyye** [Terehî] bû, girt. Birayê wî jî çû li ser navê Ebû eş-Şewk keleya Ermeniyan girt û leşker şande ser bajarê **Xûlincanê** ku ew jî yê wan (Ermeniyan) bû, lê ew bi ser neketin û bi paş ve zivirîn. Dûvre wî leşkerekî din hazir kir û di eynî rojê de şand ku pêşîbirrê ji leşkerê wan bistînin. Ew di nav deverên Ermenîyan de bihûrîn, terşên wan talan kirin, kesên ku ketin ber wan kuştin û pê ve çûn heya ku gihane Xûlîncanê û ji nedî ve bi ser wê ve girtin. Gelê bajêr ewleyî ji wan xwest, parêzgerên bajêr di keleya nîvê bajêr de asê bûbûn, wan dora wê girt û di zulq'edeya wê salê [meha yazdemîn ji salnameya Qemerî (hîvî) ye ku dibe hezîrana sala 1038'an - E. N.] de ew der vegirtin.

## Gelşa navbera Ebû el-Fet'h îbn eş-Şewk û apê wî Muhelhil

Ebû el-Fet'h îbn eş-Şewk li Dînewerê (ed-Dînewer) nazirê bavê xwe bû. Roj bi roj ew li wir bi hêz bû, çend keleyan zeft kir û aqarê xwe ji Xuziyan parast,

[ji ber vê yekê jî] wî xwe eciband û raserî bavê xwe dît. Wî di meha şabana sala 431/1039'an de avête ser keleya Kurdan ya **Bekûra** ku xwediyê wê winda bûbû û jina wî lê dinihêrt [Şaban meha heştan ji salnameya Qemerî (hîvî) ye li vir dibe pêşberê meha nîsanê ya sala 1039'an - E. N.] . Wê xeber şande cem **Muhelhil**, jê re got ku, ger ew zora Ebû el-Fet'h bibe dê keleya xwe bide wî. Hingê birreke mezin ji leşkerê Muhelhil li hêla **es-Samexanê** bû, ew sekinî ta ku Ebû el-Fet'h ji keleyê fitilî, gava ew zivirî hingê wî leşker li dora wê civand. Ebû el-Fet'h çû keleyê, wî (Muhelhil) xwe ji ber veşart û bi paş ve kişiya, Ebû el-Fet'h jî da pey. Apê wî rabû pê re şer kir, zora wî bir, wî dîl girt û xiste hebsê. Ebû eş-Şewk jî rabû leşker da hev û çû dora Şehrezorê girt, piştre ber bi welatê Muhelhil ve çû. Nakokiya nav wan dirêj bû, Muhelhil înad kir di ber xwe da ta ku wî 'Ela ud-Dewle îbn Kakeweyh han da (teşwîq kir) ku here ser welatê Ebû el-Fet'h. Wî di sala 432/1040'î de ed-Dînewer (Dînewer) û Qermîsîn zeft kir. Di dûvre Ebû eş-Şewk çû **Deqûqa**, kurrê xwe Se'dî şand dora wê girt û li pey wî çû, sûra wê neqeb kir. wan ew sitand, hinek ji bajêr xira kirin û cil û çekên Kurdan giş ji wan sitandin. Ebû eş-Şewk şevekê li wir ma û dûvre xeber gihîştê ku birayê wî **Serxab**ê kurrê Muhemmed avêtiye ser hinek ji deverên wîlayeta wî. Ew ji [bavikê] **el-Bendenecîn** (Bendenecînan) tirsiya, zû dageriya û mirov şande cem Sultanê Bexdadê **Celal ed-Dewle** û jê daxwaza alîkariyê kir. Wî [Celal ed-Dewle] hinek leşker jê re şand û ew ji bo parastinê li cem wî man. Muhelhil jî çû cem 'Ela ud-Dewle îbn Kakeweyh ku ji bo vegirtina keleya **es-Seyrewanê** dijî birayê wî Ebû eş-Şewk alîkarî bidê. Piştre xeber şande cem 'Ela ud-Dewle û diyar kir ku dê ew dagere cem Sultanê Bexdadê Celal ed-Dewle. (Li ser vê yekê) bi şertê ku Dînewer (ed-Dînewer) ji 'Ela ud-Dewle re be ew pê re li hev hat û zivirî ve.

Ebû eş-Şewk di pey de çû Şehrezorê dora wê girt û di erdê wê yê şînahiyê de xirecir derxist. Wî dora keleya Bezazê jî girt lê Ebû **el-Qasim îbn 'Eyad** nehişt, wî ji ser rakir û pê re soz da ku kurrê wî ji destê birayê wî Muhelhil rizgar bike. Ew ji Şehrezorê çû dora **Senda** ku di nav aqarê Ebû eş-Şewk de bû. Dema Îbn 'Eyad ji bo lihevhatina birayê wî (Muhelehil) Ebû eş-Şewk şande cem ew pê re li hev nehat û Ebû eş-Şewk jî ji 'Hulwanê çû es-Samexanê. Wî wîlayeta Muhelhil giş talan kir lê Muhelhil zû ve ji ber reviyabû. Piştre xelk ji bo lihevhatinê di nav wan de çûn û hatin haya ku Ebû eş-Şewk ji ser Muhelhil rakirin.

## Vegirtina Niyalê birayê Tuxrrul Beg bi ser Wîlayeta Ebû eş-Şewk ve

**Îbrahîm Niyal** bi emrê birayê xwe Tuxrul Beg ji Kermanê derbasî Hemedanê bû û wê zeft kir. **Kersaşifê** kurrê 'Ela ud-Dewle gihîşte Kurdên **el-Cûreqanê** û Ebû eş-Şewk jî ku hingê li ed-Dînewerê bû dev jê [Dînewerê] berda çû

Qermîsînê û Niyal jî ew der tev zeft kirin. Ew (Niyal) li pey wî [Ebû eş-şewk] çû Qermîsînê Ebû eş-Şewk ji wir jî çû 'Hulwanê û dev ji leşkerê xwe yên Deylemî û Kurdên Şadincanî giş berda. Niyal çû wir jî di cih de zeft kir û wê talan kir. Di nav leşker de şerr derket û serê şûrê wan li 'Hulwanê gihîşte Ebû eş-Şewk, ew rabû wî mal û eyalê xwe ji wir hilanî û bir keleya es-Seyrewanê. Dûvre Niyal derbasî **es-Seymereyê** bû wê jî vegirt, talan kir û êrîşî Kurdên cînarê xwe yên el-Cûreqanê kir, ew jî şikestin. Heçî Kersaşifê kurrê 'Ela ud-Dewle ku hingê li cem wan [Cûreqaniyan] bû, xwe avête welatê Şehab ed-Dewle û xelkê wê [el-Cûreqanê] jî li welatan belav bûn. Niyal di dawiya meha şabanê de gihîşte wir dest danî ser û bi xaniyê Ebû eş-Şewk ve ew der tev şewitandin. Birrek ji Xuzî li pey wan çûn, li Xaniqînê gihîştin wan, ew talan kirin û ji wê rojê ve Xuzî li navçeyê belabûn. Ebû eş-Şewk û birayê xwe Muhelhil ji hev re name rê kirin. Hingê kurrê wî [Ebû eş-Şek] Ebû el-Fet'h di zindana Muhelhil de miribû, wî kurrê xwe jê re şand û sond xwar ku ne wî ew [kurrê Ebû eş-Şewk] kuştiye. Ger bê îzbat kirin ku wî ew [kurrê wî] kuştiye bira ew jî ji ber heyfa kurrê xwe ve Ebû el-Xenaîmê [kurrê Muhelhil] bikuje; wî jî ev yek pejirand, pê razî bû û li ser xweparastina ji Niyal li hev hatin. Hingê Ebû eş-Şewk, ji bilî keleya **Dorbelûne**, dest danî bû ser milkê birayê xwe **Serxab** gişî û ji ber vê yekê jî ew ne li hev bûn. Serxab rabû çû el-Bendenecîna ku hingê Se'diyê kurrê Ebû eş-Şewk lê dima, Se'dî ji wir derket çû **Ubulleyê** û wî [Serxab] jî ew [Bendenecînê] talan kir.

## Mirina Ebû eş-Şewk û ketina birayê wî Muhelhil ya cihê wî

Ebû eş-Şewk Faris îbn Muhemmed di sala 437/1045'an de li keleya Es-Seyrewanê mir û birayê wî Muhelhil kete şûna wî. Kurdan, berê xwe ji biraziyê wî S'edî îbn (kurrê) Ebû eş-Şewk dagerand û li dora wî civiyan; ew [Se'dî] jî rabû çû cem Niyalê birayê Tuxrrul Beg û welatê xwe pêşkêşî wî kir. Dema Muhelhil piştî mirina birayê xwe [ew der] vegirtin, Niyal jî ku hingê ji 'Hulwanê çûbû, Bedir îbn Zahir îbn Hîlal îbn Bedir îbn Hesenweyh danîbû ser Qermîsînê. Muhelhil di sala 438/1046'an de çûyê, Bedir reviya û wî ew der jî zeft kirin. Wî [Muhelhil] kurrê xwe Muhemmed jî şande ed-Dînewerê ku hingê leşkerê Niyal jî li wir bû, wî [Muhemmed] leşkerê Niyal şikand û dest danî ser wir.

## Destdanîna Se'diyê kurrê Ebû eş-Şwek ser aqarê malbata xwe ji bo xatirê Selçûqiyan

Piştî birayê xwe Ebû eş-Şewk dema Muhelhil bû mezin, hingê bi diya Se'dî re zewicî û wî hogirî xwe kir. Wî çaxî Kurdên Şadincanî jî cira xwe nexweş kirin û ew jî rabû wî Se'dî şande cem Niyal. Ew li eş-Şadincanê gihîştê, di sala



www.arsivakurdi.org

439/1047'an de wî [Niyal] bi wan re leşkerê Xuziyan jî rêkir û ew çûn, wan 'Hulwan girt û li wir li ser navê Îbrahîm Niyal xutbe da xwendin. Ew ji wir dageriya Mabideştê û apê wî Muhelhil jî hima piştî derketina wî gihîşte 'Hulwanê, ew zeft kir û xutbeyê ji ser navê Niyal birrî. Se'dî ji wir dageriya ser apê xwe Serxab, êrîşî wî kir û koşka wî talan kir, ji wir jî tevî hevalên xwe çûn el-Bendecînê nazirê Serxab girtin û wir jî talan û tajan kirin. Serxab bi xwe hilkişiya keleya Dorbelûne û Se'dî jî zivirî Qermîsînê. Muhelhil kurê xwe yê Bedir şande ser Hulwanê û ew zeft kir; Se'dî jî rabû çû leşkerê ku pirrên wan Xuzî bûn da hev û car din çû 'Hulwan sitand û berê xwe da apê xwe Muhelhil. Ew li Tîrazşahê ku keleyeke Şehrezorê bû gihîşte wî (Muhelhil), Xuziyan wan herêmên din tev talan kirin, wî jî digel serdarê Niyal, Ehmedê Kurrê Zahir dora Tîrazşahê vegirt. Piştre Xuziyan 'Hulwanê jî tajan kir. Muhelhil xwest ku here biraziyê xwe lê westiya bûn.

Di pey de Se'dî bi şertê ku ew pê re here dora keleya Dorbelûneya ku serxabê apê wî lê dima bigire, el-Bendecînê da Ebû el-Fet'h îbn Darem û ew çûne ser wê. Riya wê pirr asê bû, ew ketin geliyekî teng û jê derneketin. Se'dî, Ebû el-Fet'h û giregirên din tev hatin hêsîr kirin, bes Xuzî piştî ku ew der zeft kirin dîsa dageriyan. [23]

*Yê ku ji Erebî wergerandiye:*
*Emîn Narozî*

---

(1) Christopher Toll, Den Arabıska Lıtteraturen, Norstedt & Soners Forlag, Stockholm, n. d., rûpel 93-94. Ferdînand Tûlu, el-Muncid fî el-Luxe we el-E'lam, Dar el-Me'arıf, Qahîre, 1960-79, çapa 7'an, beşa dîrok û agahan, rûpel 10. Pêşgotına "el-Muqeddîme"yê, Dar el-Kîtab el-Lubnanî, Beyrût, 1965, r 1.

(2) Lı gor Îbn el-Esîr ev "el-Berzîkanî" ye (Îbn el-Esîr, el-Kamîl fî et-Tarîx, Dar Sadir û Dar Beyrût, Beyrût, 1966, cıld 8, r. 705)

(3) Lı gor Îbn el-Esîr "Sermac" e. (Îbn el-Esîr, el-Kamîl fî et-Tarîx, Dar Sadır û Dar Beyrût, Beyrût, 1966, cıld 8, r. 705)

(4) Lı gor Îbn el-Esîr "el-Berzîkanî" û "el-Berzîniyye" ye. (Îbn el-Esîr, el-Kamîl fî et-Tarîx, Dar Sadır û Dar Beyrût, Beyrût, 1966, cıld 8, r. 705)

(5) Lı gor Îbn el-Esîr "ew serokê koma el-'Eyşanıyye", Eyşanıyan, bûye. (Îbn el-Esîr, el-Kamîl fî et-Tarîx, Dar Sadir û Dar Beyrût, Beyrût, 1966, cıld 8, r. 705)

(6) Li gor Îbn el-Esîr "eş-Şazıncanî" ye. (Îbn el-Esîr, el-Kamîl fî et-Tarîx, Dar Sadır û Dar Beyrût, Beyrût, 1966, c. 9, r. 213)

(7) Lı gor Îbn el-Esîr "Deysım" e. (Îbn el-Esîr, el-Kamîl fî et-Tarîx, Dar Sadır û Dar Beyrût, Beyrût, 1966, cıld 8, r. 705)

(8) Li gor Îbn el-Esîr "Qesan" yan jî "Wesenan" e. (Îbn el-Esîr, el-Kamîl fî et-Tarîx, Dar Sadır û Dar Beyrût, Beyrût, 1966, cıld 8, r. 705)

(9) Lı gor Îbn el-Esîr "Qesnan" e. (Îbn el-Esîr, el-Kamîl fî et-Tarîx, Dar Sadir û Dar Beyrût, Beyrût, 1966, cıld 8, r. 705)

(10) Lı gor Îbn el-Esîr "Xanemàbaz" e. (Îbn el-Esîr, el-Kamîl fî et-Tarîx, Dar Sadır û Dar Beyrût, Beyrût, 1966, cıld 8, r. 705)

(11) Lı gor Îbn el-Esîr "Bı kevirê şehkırî" ye. (Îbn el-Esîr, el-Kamîl fî et-Tarîx, Dar Sadır û Dar Beyrût, Beyrût, 1966, cıld 8, r. 706)



www.arsivakurdi.org

(12) Lı gor Îbn el-Esîr "Ebû el-Fet'h îbn 'Ennaz" e. (Îbn el-Esîr, el-Kamîl fî et-Tarîx, Dar Sadır û Dar Beyrût, Beyrût, 1966, cild 9, r. 214)
(13) Lı gor Îbn el-Esîr navê wî "Îsa îbn Şazî" ye. (Îbn el-Esîr, el-Kamîl fî et-Tarîx, Dar Sadır û Dar Beyrût, Beyrût, 1966, cıld 9, r. 215)
(14) Lı gor Îbn el-Esîr "el-Madî" ye. (Îbn el-Esîr, el-Kamîl fî et-Tarîx, Dar Sadır û Dar Beyrût, Beyrût, 1966, cıld 9, r. 214)
(15) Lı

gor Îbn el-Esîr "Esadabaz" e. (Îbn el-Esîr, el-Kamîl fî et-Tarîx, Dar Sadir û Dar Beyrût, Beyrût, 1966, cıld 9, r. 214)
(16) Li gor Îbn el-Esîr "Hîlal lı ser vê gotınê dıkeve şubhê ku Ebû Îsa wî dıxapîne û radıbe wî dikuje lê paşî poşman dıbe". (Îbn el-Esîr, el-Kamîl fî et-Tarîx, Dar Sadir û Dar Beyrût, Beyrût, 1966, cild 9, r. 215)
(17) Lı gor Îbn el-Esîr "Çılhezar budre dîrhem (zîv) û çarsed budre dînar (zêr) ın. (Îbn el-Esîr, el-Kamîl fî et-Tarîx, Dar Sadır û Dar Beyrût, Beyrût, 1966, cıld 9, r. 216). Budreyek dehhezar dîrhem e, yan jî kîsekî ku dehhezar dîrhem (dirav) tê de ne. (Mevlût Sarı, el-Mewarıd Arapçe-Türkçe Lûgat, Bahar Yayınları, Istanbul, n. d., r. 79)
(18) Lı gor Îbn el-Esîr "Tahır" e. (Îbn el-Esîr, el-Kamîl fî et-Tarîx, Dar Sadır û Dar Beyrût, Beyrût, 1966, cild 9, r. 221)
(19) Çendî ku Îbn Xeldûn dı vır de "ceyl" yanî esıl, eşîr, grûp gotıye jî lê lı gor Îbn el-Esîr "cebel" yanî çıya ye û dıyar e ku weha rasttır e jî, çıku hem dı paş de ev peyv careke dın wek "cebel" tê û hem jî ger ew ne "cebel" yan jî "cîbal" be hıngê tu mane nade. Jı xwe Bedir jî navdarê bı nasnavê "Mîrê Çiyan" e. (Îbn el-Esîr, el-Kamîl fî et-Tarîx, Dar Sadır û Dar Beyrût, Beyrût, 1966, cıld 9, r. 218)
(20) Lı gor Îbn el-Esîr "Huseyn îbn el-Mes'ûd el-Kurdî" ye. (Îbn el-Esîr, el-Kamîl fî et-Tarîx, Dar Sadır û Dar Beyrût, Beyrût, 1966, cıld 9, r. 218)
(21) Li gor Îbn el-Esîr "Kuse'hd" e. (Îbn el-Esîr, el-Kamîl fî et-Tarîx, Dar Sadır û Dar Beyrût, Beyrût, 1966, cild 9, r. 218)
(22) Lı gor Îbn el-Esîr "Lurî" (el-Lurî) ye. (Îbn el-Esîr, el-Kamîl fî et-Tarîx, Dar Sadır û Dar Beyrût, Beyrût, 1966, cıld 9, r. 213)
(23) Ev jı kıtêba Îbn Xeldûn ya Kîtab el-'Îber we Dîwan el-Mubteda' we el-Xeber fî Eyyam el-'Ereb we el-'Ecem we el-Berber , Dar el-Kîtab el-Lubnanî, Beyrût, 1958, cıld 4, r. 1093-1106'an hatıye wergerandın.

www.arsivakurdi.org

# Çend rûpel ji jiyana
# Ereb Şamîlov

## WEZÎRÊ EŞO

*Ereb Şamîlov yek ji nivîskar û şexsîyetên mezin yên Kurdên Sovyeta kevn e. Çend roman û gelek nivîs li ser Kurdan nivîsîne, wek hîmdarê romana Kurdî tê nasîn û gelek roman nivîsîne. Lê belê heta berî çend salan jî nedihate zanîn ku Ereb Şamîlov ji alîyê rejîma Stalîn de ji Ermenîstanê hatîye dûr xistin, di navbera salên 1937-1954'an de tam 17 salan li Sibiryayê li derwarîyê (exil) jîyaye. Li vir bi jina xwe ya duwemîn Marîya Vasîlevna ve dibe nas ya ku di van bîranînan de navê wê derbas dibe, ew bi xwe Uris bûye, ew keçên wî Asê û Zînê ji vê jina duwemîn in. Jina wî ya berê Alman bûye. Çawa di van bîranînên jêr de jî xuya dibe, Ereb Şamîlov di nîveka salên 1950'yî de vegerîyaye Ermenîstanê. Ev bîranînên Wezîrê Eşo, ji bo ronîkirina van salên nefîkirinê wek dokumenteke dikare bê hesibîn. Nivîskar her çiqas bi eşkere, rast-rast qala vê bûyera tradejîk nake jî, lê belê mirov ji van bîranînan çend tiştan fêr dibê, wek mîsal jîyana kesekî mehkûmkirî û teze ji nefîbûnê vegerîyaye. Nivîs di demeke krîtîk de hatîye nivîsîn, berî serobina Sovyetê. Ji ber vê yekê jî mirov nivîskar fam dike. Nivîskar Wezîrê Eşo van salên nefîkirinê wek "salên xerîbîyê" bi nav dike. Ev bîranînan cara pêşîn, di sala 1989'an de li Erîvanê di berevokeke bi navê* Bahar *de hatîye weşandin. Navê nivîsê yê eslîn "Rasthatin tevî Ereb Şemo" ye. Di îmlaya nivîsê de min çend guhartinên piçûk jî çêkirin.*

***Rohat Alakom***

Navê Ereb Şamîlov hela hê biçûktîyê de ber guhê min ketibû. Lê min ew, çawa divên, ne dîbû, ne bîna bû. Dema ez bûme xwendekarê Unîversîta



www.arsivakurdi.org

Erîvanê, êdî gelek caran navê wî ber min hildidan. Û tiştekî ecêb û hewaskar ew bû wekî ne ku tenê wekîl, fikirdar û intelleksîya Kurdan navê wî hildidan, ew bîr dianîn, lê wusan jî gundîyên sade, mirovên kal û pîr. Û ewan bi hisret, hezkirin navê wî hildidan. Ereb wexteke dirêj bû ne li Erîvanê bû, lê nivîsarên wî, xazma "*Şivanê Kurd*" di nava cimaetê de dihate bîranînê.

Hetanî hatina Ereb Şamîlov min hîmlî derheqa wî de ev gotin zanibûn: ew hîmdarekî edebîyata Kurd ya Sovyetê, zanekî dîrok, edebîyat, folklor û etnografya cimaeta xwe ye, erheda (welhasil) şuxulkarekî cimaetê (civatê) û medenîyetê yê herî kivş e. Digotin, wekî zimanê Kurdî pir rind zane, lewz, zimanekî letîfî dêv de ye. Hema wusan jî digotin : "Mala Ereb şewitî, zimanê har-maran dêv de ne, kurmancîya ew zane kî zane!". Digotin, wekî Ereb Şamîlov çend zimanên rohilatê û rojavayê rind zane. Bi gotinekê, hetanî hatina Şamîlov û heta dîtinê êdî derheqa wî de fikreke gelek baş li bal min çêbibû û min di dilê xwe de digot: "Gelo ew wextê bê, wekî ez bi çavên xwe wî emekdarê medenîyeta me bibînim".



Ereb Şamîlov (Ji arşîva W.Eşo)

Û ew wext hat. Rojekê min di rojnemeya "*Sovetkan Hayastan*" de agahdarîke Ajansa Ermenîstanê ya Telegrafê ya resmî xwend, tê de dihate gotin ku bolşevîkê kevin, nivîskarê Kurd Ereb Şamîlov vegerîya Ermenîstanê. Cimaeta Kurd, wusan jî ya Ermenîya ew nûçeya xêrê bi şabûn qebûl kir. Û ez bi bêsebir hêvîya wê rojê bûm. Dema ji min re wê li hev bê, bextê min wê lêxe, ezê wî emekdarê edebîyata me bibînim û ew roj jî hat.

Nîveka salên 1950'yî redaksîyona rojnameya *Rîya Teze* li avaya ser kuça *Karmîr Banekê* bû. Ez timê diçûme wira. Wek miqaledar, min informasîyon û miqalên xwe dibirin, yekê jî, lawik didîtin, bîna min ji wan derdiket.

Carekê ez çûme redaksîyonê, min dixwast redaktor bibînim. Min derê oda wî vekir û dema min dît mirovek li bal e û ew dipeyîvin, min nexwast wan şerpeze bikim û hindav de derî girt, paşta vekişîyam. Lê belê redaktor ez dîtim û ez teklîfî hundir kirim. Min gotê wekî ezê paşê bêm. Ew mirovê nenas jî wekî pişta wî min de bû, ser milê xwe zivirî û li min nihêrî. Ez bi lez ji qatê çaran peyayî jêrê bûm û êdî ji avayê 50-60 mêtroyan dûr ketibûm. Min hew bihîst

www.arsivakurdi.org

- yek wê dûrva gazî min dike û navê min hildide. Ez piştxwe ve zivirîm: Eva Mîkayîlê Reşîd e, rehmedî şaîrê me û wergervanê rojnameyê. Ew hat gîhişte min û mîna xwe hercar, bi heydade (heybet) got:

- Kuro, paşta bizvire, em herin redaksîyonê, Ereb Şamîlov gazî te dike.

Nişkêva dilê min kuta; ez çawa şabûme, wekî mirovekî wusan navdar besa min, cîwanê xwendekar kirîye, hewceyî dîtina min e. Heta em gihîştîn cîhêcîh, hezar û yek fikir di serê min re derbas bûn; gelo çima gazî min kirîye? Divek yekî mayîn ez şibandibim? Ew jî naqewime, çimkî redaktor niha gotîye: ez kî me. Wusan e divek bavê min nas dike. Lê belê mena eynî qet di fikra min re derbas nedibû. Ber derê oda redaktor dilê min wusan lê dixwist, te digot tê, qefasa min derê. Hilkişyabûn çar qatan jî "teqil" dabû xebata dilê min. Ez çûme hundir.

- Keremke, rûnê Wezîr can, redaktor got, hevalê Şamîlov dixwaze te bibîne, bona wê yekê me Mîkayîl li pey xist.

Ez rûniştîm, rast pêşberî Ereb Şamîlov. Min berê hew zanbû Ereb Şamîlov yekî govdekî bejnbilind e, simêlê reş yên palikê (qalind) lê. Lê pêşberî min mirovekî nîvçe rûniştibû, çevne gire, reşe aqil lê, bê rû û simêl.

- Dêmek, tu kurê Eşo yî' Ereb Şamîlov ji min pirsî, te digot me êdî gelekî xeber daye û ew dûmahîya gotinên xwe tîne.

- Belê, min got û şermana xweydanê ji ser min re avît.

- Eşoyê Hutî

- Belê

- Mala we ji alîyê Qersê, ji gundê Şirînkoyê hatîye?

- Belê wusan dibêjin.

- Hutî heye?

- Na xêr, çûye rehmetê.

- Lê Xem, Xema pîrika te?

Dema ewî navê pîrka min hilda, gurzîyên sawê bedana min re derbas bûn. Wekî ewî navê kalkê min zanibû, ez ecêbmayî nemam, çimkî Hutîyê kalkê mim mirovekî navdar û naskirî bû. Lê dema navê pîrka min hilda, ez şaş û metel mam, wekî pey ewqas salan re çawa navê wê bîr nekirîye.

- Reme li Hutî begê, Xemê be, min nanê ber destê Xemê gelek xwarîye.

Ereb Şamîlov hêja niha edil dest bi bi gotinên xwe kir:

- Hêna Şerê Cîhanê yê Yekemîn bû, lê berî reva 1918'an bû. Ez wê demê li gundê nehîya Dîgorê ya Ezdîyan digerîyam, min spartina Bolşevîkan diqedand, bi karê şoreşê ve mijûl dibûm. Derece wusan qewimî min gotî xwe wedelî tada (demeke derbasok) sepe bikira (veşarta), ber çavên dîwana padşê neketama. Û min biryar girt xwe bavêjim ber bextê maleke kivş, mirovekî baş. Wê hênê mirovekî herî navdar kalkê te yê rehmetî Hutî beg bû. Hebûna wî ya giran tune bû, lê mirovekî nandar, bilyan û qedirgir bû, navê begtîyê lê kiribûn, wek nîşana qedgirtinê. Layîqî navê xwe bû, ocaxa wî ocaxa enzel



www.arsivakurdi.org

(qonax) bû, mala ber û mêvanan. Gelekî bejna xwe hez dikir, papaxê kew, sapogê xas, qayîş-qeme gelekî bejna wî ya bilind, navkilka zirav dihatin. Hutî beg yekî zerîn û bedew bû, simêleke xweş lêbû. Ez weke du mehan di mala kalkê te yê rehmetî de mam. Kê şika wê yekê bikira wekî şoreşger, bolşevîk di mala beg de xwe veşartîye. Kî dikaribû ser sama (heybeta) Hutî begê biketa, bihata mala wî binêrîya. Dîwanê, dewletê ew nas dikir, ewî bi nanê xwe karkerên dewletê gişk kor kiribûn. Dema min di kox de nivîsara xwe dikir, zarokên Hutî begê dahatin dora min, heyr û hejmetkar metelmayî li destê min, li nivîsara min dinhêrîn. De, feqîra zanibûn nivîsar çi ye? Wê hênê dibistan di gundê kalkê te de tune bû, nava 16 gundê Ezdîyan de tenê li Bacelûyê hebû. Erê, zarokên Hutî pir nîn bûn, ez dibêm kur û qîzek bû. Kur wek çavên xwe, delalî xweyî dikir, ew jî bi sapok bû, bi têleke poxikkirî. Kincên here xas xwe û kurê xwe re ji Qersê danî, heylo ji Tiflîsê dida anînê.

Paşê Ereb Şamîlov pirsa xwendina min kir, neferê mala me kir û ez borcdar kirim, wekî carekê bavê xwe bînim bal wî; gelekî dixwast kurê Hutî begê bibîne. Ez bêjim; xeysetê Ereb Şamîlov wusan bû; wî timê dixwast mirovên sade, gundî û bajarvanên Kurd bibîne, pirs û pirsîyarîka ji wan bike. Vira cîh e bê gotinê, wekî paşwextîyê min tiştekî wa bal Ereb Şamîlov texmîn kir; eger rojekê biqewimîya, wekî kesî Kurd mala wî nebûya mêvan, ewê bi xwe derketa, biçûya kuçeke Erîvanê, ya jî li kuça bigerîya, heta yekî ji gund hatî, jin bûya mêr bûya, bidîta, pê re dipeyivî û hêja bi dilekî baristan vedigerîya mala xwe.

Min got wekî peyî 40-50 salan re Ereb Şamîlov navê pîrka min bîr nekirbû. Lazim e bidim kivşê, wekî ez paşwextîyê jî ser bîra wî ecêbmayî bûm. Ewî ne ku tenê navê mirovên çê ji bîr nedikir, lê wusan jî zanibû fêlankes, yan bêvankes ji kîjan êlê ye, kîjan qebîlê û berê, ji mala kê ye, nevîyê kê ye, bi gotinekê, çawa divên, heft govek bavê wî jî nas dikir. Bi vî tehrî, ewî bawer bikî, hemû Kurdên Êzdî nas dikirin.

Ji rasthatın, dîtina pêşin şundatir min Ereb Şamîlov gelek caran dît, pê re qise kir. Komela nivîskaran de, radîyoyê de, redaksîyona *Rîya Teze* de, Akedemî, kûçê de û bextê min hebûye gelek caran bibim mêvanê wî, oda wî ya xebatê de, ber textê sade, ber maşîna herfa ya piçûk bibînim. Xeberdan, pirs-pirsîyar hez dikirin, lê xeberdana dirêj hez nedikir. Dema şixul xelasbûyî hesab dikir, êdî tu didayî femandinê, wekî lazime tu herî.

* * *

Dema tu diçûyî mala Ereb Şamîlov û payê pirîn ewî bi xwe derî li te vedikir. Bi beşerek xweş tu qebûl dikirî, digot:

- Ew tu yî, keremke, keremke werê. Îro şuxulê min li hev ketîye, bêje, ka çi lazim e, çi alîyê min dikeve?

Wusan lezo-bezo sivderê de ji te re digot û te êdî qursax ne dikir herî hundir.



www.arsivakurdi.org

- Tê herî? dema te karê çûyînê dikir, ewî dipirsî: Tiştekî nake, careke dinê were, emê hinekî ji xwe re xeber bidin.

Careke din diçûyî, dîsa tu bi beşereke xweş qebûl dikirî û ji gotinên wî yên pêşîn kivş dibû, wekî wê te çawa lazim e qebûl bike.

-Keremke, digot, wî tu ser çevan re bêyî, were otaxa min, em hinekî gale-gala bikin.

Em diçûne otaxa wî. Li wir xenjî karyola wî, dolava pirtûkan û textê (masa) wî yê xebatê tu tiştekî mayîn tune bû, hemîn maşîna wî ya çapkirinê ya piçûk timê li ser wî texteyî danî bû. Timê jî rûpelê nîvcî herfrêzkirî tê de bû.

-E, Şamîlov ber textê xwe, cîhê xwe yê xebatê yê hergav rûdinişt, tu jî hemberî xwe didayî rûniştandinê û dest pê dikir, de bêje, qe hal-wextê te çawa ye, zarokên te, jina te silamet in? Bavê te qe tê?


Keçên Ereb Şamîlov: Zînê û Asê

(Ji arşîva W. Eşo)

- Gişk silamet in, em hemû saxî û silametîya te dixwazin, min bersîva wî dida.

Lê te negot, bavê te qe tê?

- Welle van dawîyan hê nehatîye.

- Ca wekî tê, ese (sedî-sed) bîne mala me, malavo, ez dixwazim kurê Hûtî begê bibînim. Te eva çend sal in soz daye, lê hela hê nebûyî xweyê soza xwe.

Rastî jî, Şamîlov timê besa bavê min dikir. Ewî di jîyînê de bavê min nedîtibû, diha rast tenê piçûktîyê de, lê çawa kurê nasê wî yê hezkirî û mirovê bi salan mezin, dixwast bidîta.

Paşê Şamîlov pirsa hal û wextê Kurdên dereke dikir:

- Ez heyrana te bim, ew zarî dibû, mîna tiştekî hêvî bike, tu qet haj Kurmancên me heyî, gelo halê wan çi ye?

Eger gotinek zanibûya, te jê re digot, lê eger na, ew ber xwe diket. Lê wî zanibûya ese ji te re digot.

Paşê pirsa ronakbîrîya me, karên ocaxên me yên medenîyetê te dikir. Tiştekî ne dilê wî bûya, ese dida der. Wê şunda, te hew dinêrî, Şamîlov nişkêva xeberdan, gilî-gotin wusan tomerî, gulover dikirin, wekî te bixwasta-nexwasta, rabûyayî, biçûyayî...

Min paşê, derengî mena bî xeysetê wî yê ecêb derxist. Ereb Şamîlov gelek salan ne li Ermenîstanê bûye, ji derecê medenîyeta civata me qetîyayî bûye. Loma jî ewî hewl dida, mîna tiştekî, wedê wundakirî vegerîne. Ew gelekî dixebitî, bawer bike hemû seetên rojê. Maşîna wî ya piçûk li ber bû û wî bi tilîyê xwe yên kaltîyê yên ziravbûyê teqe-teq lê dixwast. Bi saya vê xebathezîyê, vê şuxilkirina mezin bû, wekî di nava çend salan de wî çend efrandinên pir-rûpel nivîsîn û dane weşandinê. Bi rastî jî wî heyfa xwe ji wedê wundakirî hilda. Bawer bikî, tu xwendekarekî Kurdên dereke, ku li Moskovayê, Lenîngradê hîn dibûn, tune bû, ku bihata Ermenîstanê, Erîvanê û mala Ereb Şamîlov nemaya. Carekê min gotinek bîhist, go xortekî Kurd ji Moskovayê hatîye, çûye mala Şamîlov. Evê te jê re ezet-hurmet kirîye û di dawîyê de zor-zor sed manat "serva" kirîye.

- Tu xwendekar î, Şamîlov gotibûye, wê kêrî te bên. Belê alîkarî tenê nedabû wî...

Carina jî, wedê wî hebûya, masa ber te dida rastkirnê. Xwarina wî ya here hezkirî kebab (şîşlik) bû an jî qelî bû. Gelekî ji goştê pêz hez dikir. Min jê derxistibû, wekî çavên xwe îlahî yên neferan tu tiştî de nedihîşt. Carekê tiştekî waha qewimî. Ez ji navbirîya xebatê vedigerîyama cîhê xwe, radîyoyê. Li qatê sisîyan jina min sekinîbû, hêvîya min bû.

- Hêja mirovekî gundî li vira besa te dikir. Ji lawikên redaksîyonê dipirsî, min jî şerm kir nêzîk bim.

- Kî bû, mirovekî çawa bû? Min pirsî.

- Yekî nîvçe, kal bû, şilyape (fotor) sêrî bû. Ez şaş û metel mam, gundîyê me yên niha jî rind xwe dikin, ji bajarvanîya baştir.

- Xwedê, ez dilê xwe de fikirîm, ew gundîyê mîna bajarvanîya wergirtîya kî ye? Min çiqas zor da hişê xwe, nikaribû jê derxista.

- Elbeke piçûk jî dêst de bû, kulfeta min ser de zêde kir, teyê qey bigota ezê ji wê elbê derxim, çika ew kî ye.

Xeberdan devê me de, jina min alîyê nerdewana nihêrî û bi heydade got:

- Va ye, va hat!

- Ez fetilîm û min bala xwe dayê, eva Ereb Şamîlov e.

- Qîzê, Ereb Şamîlov e.

- Çi dibêjî? kulfeta min şaş û metel ma.

- Malavo, Ereb Şamîlov bîn lê çikyaye, elba wî ya piçûk dêst de, dûr ve got, ez vêspê de te digerim, tu ku yî?

- Ez çûbûm nav bajêr, bêyî te ne loşî can be, min nan xwar.

- Efîyet be, xêreke jê bibînî.

Şamîlov hat, pêşberî me sekini û mîna hergav pirsî:
- Pirsa edib tê tune be, keça min kî ye, kurmanc e?
- Belê, min bersîva wî da, kulfeta min e.
Ereb Şamîlov gelek şa bû, dest pê kir pirs û pirsîyar ji kulfeta min kir. "Tu ji kîderê yî? Dê û bavê te mirovên kîjan êlê ne, ji ku hatine" û gelek pirsê dinê. Kulfeta min ya belengaz soro-moro bûbû, çimkî nikaribû bersîva pirsa wî tam bide. Min dît na, wa nabe, alîkarî dayê. Ereb Şamîlov jê re di nav çend deqada ewqas gilî derheqa dîroka êla wan de, derheqa Zuqurîya û Cangîr Axa de gotin, wekî divek ewê nava temamîya emrê xwe de nebîhistibû.
Ezî hinekî bal Şamîlov rûvekirî bûm û min jê pirsî:
- Eva çi elb e?
- Bavo, ewî dest pê kir, gotin fêza radîyoyê klûbnîk stendine. Klûbnîkan re, ew zivirî ser kulfeta min, kurmanc dibêjin toqatk (çîlek) . Min got, ez herim zarokan re bikirim, ew jî bextê min re xelas bibûn. De, tişte nake, ezê herim ji sûkê bikirim. Ez ji vira vegerîyam, biryar da ku bêm serîkî te xim û pê bihesim, ka van dawîyan çima wunda bûyî, kivş nabî?
- Şuxul-emel nahêlin, apo, hema serhêsa bûm, ezê ese bêm.
- Qîza min jî bîne, ese mîna ya bavê xwe nekî. Dema xatirê we, min gelekî serê we êşand, Ereb Şamîlov got û çû.
- Apo sebir ke ezê bêm te verêkim.
- Na, ne lazim e, tu qîza min verêke.
Ereb Şamîlov çû, ez vegerîyam û min dew ji kulfeta xwe kir:
- Qîzê, te ji çi derxist, wekî Ereb Şamîlov gundî ye? Ne axir timtêla (xeml) wî da tu tiştekî gundîtîyê tune.
- Mîna gundîya xeber dida, kulfeta min mena şabûna xwe eyan kir.
Lê Ereb Şamîlov çiqas firnax dibû, çaxê dibihîst, wekî keçek ya xortekî Kurd îdareke xwendina bilind de hatîye qebûl kirin. Hindike em bêjin, şa dibû. Kê jî, nas bûya, nenas bûya hêvî ji Şamîlov bikira, wekî bona qebûlkirinê alîkarîyê bide, ewî xwe nedihêvişand, wê kaltîya xwe pêşîya cîwanan, dê û bavê wan diket û kîderê lazim bûya, diçûyê, qedrê xwe xerc dikir, carna bi hêvî, rica dikir, tek xort û keçek Kurd instutîyê de bê qebulkirinê. Ez bi xwe gelek xort û keçê Kurd nas dikim yên ku bi alîkarîya Şamîlov institut, unîversîte ya jî texnîkumê de qebûl bûne.
Ereb Şamîlov ne mirovekî qure, babax û kubar bû. Çawa cimaet dibêje: çûkan ra çûk, mezinan re mezin. Lê bi vê re tevayî qedrê xwe rind zanibû, xazma qedrê wan nav û nîşanan, wê sîyanetê, ya ku partîyê, dewleta Sovyetê dabûne ser wî. Ewî gelek hez dikir bîr bîne, wekî navê proffesorê sor li ser wî ye. Ereb Şamîlov her cejnekê de, her civîn û êvarîkê de pêsîra xwe bi nîşan û madalya ve dixemiland. Û divê bê gotinê, wekî mirovê ku xeysetê wî rind zanibûn, ew yek bi kubarîyê, babaxîyê re girê nedidan. Dema nîşan û madalya pêsîra xwe dixistin, ne ku dixwast bi vê yekê bêje: "Bala xwe bidinê, ez çito

mirov", lê daxwaza wî girtina qedrê wan rewa bû. Ew bi wan nîşan û madalya ve firnax dibû, mîna zarokekî bi kincên xwe şa dibe, ew wusan şa dibû.

Ereb Şamîlov bav û malxwekî xemkêş bû. Ewî qedrê kulfeta xwe Marîya Vasîlevnayê gelekî zanibû. Dema ez diçûm mêvanîya wî û kulfeta wî li ortê hazir bûya, te hew dinêrî nişkêva digot:

- Meta te kulfeteke şîrhelal e, ew nîn bûya, divek ez niha sax nînbûma. Ewê rojê çetin de gelek alîkarî daye min, ez keda wê nikarim bîr bikim.

Marîya Vasîlevnayê jî alîyê xwe de gelekî xemxur bû himberî wî. Min timê texmîn dikir, wekî ew sibê heta êvarê, çawa dibên, totanga (kesê tê-diçe) wî ye, wê pîrtî û bêsehetîya xwe, çawa cimaet dibê, mîna destmaleke ser desta qulixê wî de ne. Min hertim tê derdixist, wekî Marîya Vasîlevnayê hez nedikir, dema mêvan gelekî rûdiniştin û mêrê wê mijûl dikirin. Ewê nedixwast, wekî bi xeberdana dirêj karê Ereb Şamîlov şerpeze bikin, ewî ji xebata efrandarîyê bibirin yan jî aciz bikin. Bona saxlemîya wî gelek xemxur bû. Ji "tirsa" wê Ereb Şamîlov newêribû eşkere cixarê bikşîne. Dema ez diçûm mala wan, ewî timê ez teklîfî oda xwe dikirim, derî li ser me de digirt û destûr dida ez cixarê bikşînim, wekî ew jî bikaribe " taldê" min de duyê cixarekê hecam bike.

Ereb Şamîlov gelekî ewledên xwe hez dikir. Keça wî Meyanê zûva mêr kiribû. Herdu keçên piçûk bal wî bûn, di van salên dawîn de mêr kirin. Ereb Şamîlov navê Kurmancî li van herda kiribû; navê yekê Asê bû, ya dinê Zînê, navê mêrxasa destana Ehmedê Xanî û beyt-serhatîya cimaetê "Mem û Zîn ". Ewî herdu keç jî gîhandin mirazê wan, kirin xweyê xwendina bilind.

Ez carekê çûme mala wan, lê herdu keç jî ne li mal bûn. Ereb Şamîlov ji min pirsî:

- Te keçikên min dîtine?
- Çawa nedîtine!
- Lê van dawîyan?
- Na, min gotê, van çend salên paşin min nedîtine.
- De tu kerama xwe sebir bike, Ereb Şamîlov got û ji oda xwe derket. Lezekî şunda wêneyek dêst de ew vegerîya.
- Eva wênê wan yê herî paşin e, çendekî pêşta tevayî kişandin, Ereb Şamîlov got û wêne dirêjî min kir.

Min bala xwe dayê, herdu xûşk li pîya li rex hev sekinîbûn û tiştekî hewaskar, herda jî kincê kurmancî, rihalê milletîyê wergirtibûn, kofî-kitan, dêre û êlekê cimaeta me.

Ereb Şamîlov bi şabûn heyî li min dinihêrî, heyî li wênê ewledê xwe yên hezkirî. Min texmîn kir, wekî ew gelekî bi wana firnax dibe û xazma bi wê yekê, wekî qe na, di wêne de ewan bi kincê milletîyê têne xuyan. Bêyî gotina min, nivîskarê hezkirî ew wêne pêşkêşî min kir.

Lê keçên Ereb Şamîlov tenê bona kişandina wêne kinc û rihalê milletîyê wernedigirtin.

Carekê ez çûme dîlanekê. Ew dîlan li Erîvanê bû. Rreb Şamîlov hatibû û keça xwe Zînê jî bi xwe re anibû. Zînê kincê kurmancîyê wergirtibûn. Dema ew û bavê ve ketin govendê, min texmîn kir, wekî Zînê qaydê kurmancîyê rind dilîze. Bavê ew hîn kiribû.

* * *

Rojekê pê hisîyam wekî Ereb Şamîlov likumîye û lingê wî guzikê de şikestîye. Eva jî beseke ne bi xêr bû, çimkî dîyare e, wekî hestuyê kal û pîran yên şikestî dereng ya jî çetin diceribe. Ez serda çûm. Hêvîyê bûm, wekî ezê wî halekî melûl û sexîr de bibînim. Lê dîsa ew Ereb Şamîlovê wek berê bû, tenê wekez (gopal) girtibû xwe û lingê wî girêdayî, ser alçîyê de, pêçayî bû. Dewsa ez ber dilê wî da bêm, ew ber dilê min û kulfeta xwe de hat.

- Tiştekî nake, ewî bêminet got, malavano, wê biceribe. Doxtora got, wekî xurekê rind bixwî, wê zû biceribe.

Ez şaş û metelê vê bînfirehîya wî mam. Divek hema vî xeysetî ew û saxlemîyê ve xweyî kirin, dema ew gelek salan li xerîbîyê bû, di nav mercên hema xirab de dixebitî.

Dema ez derketim êdî mîna hercar, Şamîlov ez verê nekirim. Kulfeta wî derî li ber min vekir û dema xal-xatirê ez ber dilê wê de hatim, ew girîya û bi kelogirî ji min re got:

- Na, Wezîr, Erebê ji vî lingî here. Gelek cîhekî çetin, gûzikê de şikestîye. Ew çi zulm bû, Erebê sapî silamet...

Û êdî nikaribû xeber bida.

Ez dîsa li ber dil de hatim û çûm.

Lê Ereb Şamîlov ji ling, ji şikestina hestu nemir. Dilê wî sekinî. Ew dilê ku bina serketina xebata Lenîn, Oktobra Mezin û azadî, bextewarîya cimaetê li Qersê û Sarîqamîşê, li Kafkasa Şimalê û Lenîngradê, li Moskovayê û Erîvanê, li pala çîyayê Elegezê û Axmixanê, gelek cî û waran kuta bû, lê xistibû û niha, dema êdî westîya bû, peyî qedandina rêke dirêj ya sîyanet re sekinî. Lê karên wî, efrandinên wî man bona cimaetê, bona dilşahîya mirovan.

*Transkripsiyona ji Kirîlî: Rohat Alakom*



www.arsivakurdi.org

# Bavê Fexriya û Felîtê(*) Quto

**Hemit Kilicaslan**

Di buhara 1991'ê de lêkolîner û nivîskar Mustafa Düzgün ji min re nameyek şand û di nameya xwe de li ser daxwaza xwendevanekî li Hollandayê ku têza xwe ya unîversîtê li ser du stranên Kurdî (Bavê Fexro, Felîtê Quto) ava kiribû, alîkarî xwest. Kekê Mustafa herdu pîyên min xistin solek teng û pele (ecele) li min kir. Min di demeke kurt de hin tişt, wê demê nivîsandin û şandin, lê belê di piştre çend cihên ku min jî alîkarî ji wan xwestibû bersiva min dan. Min li ser bingeha bihîstinên xwe, alîkarîya ku bi nameyan û bi kasêtan ji min re hat û kasêtên stranbêjên Kurd, stranên li ser bavê Fexrîya û Felîtê Quto dan berhev û ev nivîs amade kir. Felîtê Quto û Hecî Mihemedê Mistê (Bolindî) ji yek malbatê ne. Ji ber vî awayî, min herdu babet biheve girêda, di bin sernivîsekê de pêşkêş kir. Ger xwendevan bi rexneyên xwe quncikên vala bidin dagirtin û şaşîyên me bidin ber çavan, alîkarîyeke mezin dikin. Spas.

**Felîtê Quto**: Reşkotî ye, Kurrê Quto yê duduwa ye. Binyata mala Quto, Ji rexê Hekarîya hatine û dighê mala Ferhoyê 'Uzêr Axa. Ji êlên Kurdîstanê yên navdar, ji "Heft Bavê Sîna " ne. Felît, weke êl ('eşîr), Reşkotî ye û weke malbat, ji Pîroka (Piroya) ye. Dostê min î hêja, Ahmet Aydin di nameya xwe de van agahdariyan dide:

Husênê kurrê Hesenê Felîtê Quto ku temenê wî li dor 90 salan bû, di sala 1960'an de, bi hev re rûniştine. Di wê rûniştinê de Husên bi devê xwe, li ser bapîrê xwe dipeyive. Dibêje: Serpêhatîya bapîrê min bi du awayan tê gotin. Ya yekê, bi awayê ku em dizanin û di nav herêmê de tê gotin ku di bawerîya min de a rast ev e:

---

(*) Herçend dı stranê de nav Fılît be jî, lı alıyê me Felît tê gotın. Jı ber vê yekê, mın di agahariyan da Felît û dı stranê bıxwe de jî Fılît nivîsand.



www.arsivakurdi.org

- Kalkê min Felît, mêrxasekî hezjixwekirî û navdar bû. Dilê wî di keçekê de hebû. Ew û peyayekî xwe Suryanî (filleh), berbi gundê dergîstîya xwe bi rê de diçûn. Peyayê wî ji Felît re dibêje;

-Li Kanîya Baderesê, karwanê Etmaniya li ser kanîyê danîne, sîlahên baş li ba wan hen in. Belkî em tivingeke baş ji te re ji wan bistînin û bi tivingeke rind em herin ba hezkiriya te.

Felît, gotiye:

- Em herin.

Gava gîhaştine ba Kanîya Baderesê, rastî karwên hatine. Bi rastî çekên baş, hêja bi karwanê Etmanîya re hebûne. Felît ji yekî tivinga destê wî xwestiye da ji bo kirrînê, lê binêre. Xwediyê tivingê, ji ber ku xerîbê herêmê bûye, bawerî bi Felît neanîye û gotîyê;

-Merev sîleha destê xwe nade destê nenasa.

Felît qeherîye, gotiye;

- Bi zorê be jî, ezê ji te bistînim.

Mêrik:

-Ev tiving wê bibe qelenê(nexdê) dîya te!

Bi van devjengîyan, gotinên wan bi serê hevûdu de neçûye, gotinek ji wî, yek ji yê din, şer dest pê kiriye. Etmanî dişkên. Hem şer dikin û hem berê xwe ber bi welatê (eşîra) xwe vedikin û karwanê xwe dajon. Şer ji Kanîya Baderesê dest pê dike heta ziyareta Şêxê Vindê-navbera wan 10- 15 km ye-didomîne. Dîsa li gora nameya Ahmed Aydin, ji 120 kesên Etmanîyan bi tenê Mahmê Elîyê Etmên sax dimîne, darê xwe datîne, dest ji ber xwe berdide, xwe dispêre Felît. Felît dighê ba wî, dibêje;

-Te dît, tu bû sebebê evqas însanan. Ma rast bû, te weha kir? De ka wê tivingê bide min!.

Gava Felît destê xwe dirêjî tivingê dike, Mahme Elîyê Etman nigê tivingê dikşîne, Felît birîndar dibe. Felît li zîyareta Şêxê Vindê birîndar dibe, lê bi saxî wî tînin gundê Taharîyê. Li ber sîdana dara tûyê can dide.

Awayê duduyan, bûye weke efsaneyekê ku bêtir li derveyî herêmê deng vedaye, kesên ku yek bihîstîye, dehên din bi ser vekirîye, belav bûye, ew jî ev e:

Felît mêrxas û mezinekî êla Reşkota ye. Di zarotîya xwe de sêwî maye, dîya wî Şemê ew xwedî kirîye. Dema destê wî dar digre, yanî dibe zilam, doza mezinaya Reşkotan dike û mezinaya Reşkotan bi darê zorê digre destê xwe. Koçer û karwanên di nav axa Reşkotan re derbasdibûn, baca rê, xûkîtîya çêrê didane Felît. Gava karwan ji alîyê Silîva dihatin, li Deşta Silîva, li Kanîgulanê diçû pêşîya wan, yan peyeyên xwe rêdikirin, baca xwe ji wan distend. Yan koçer ji Zozanan, ji Bîngolê, Şerefdînê, ber bi Qerejdax û berrîyê ve pezên xwe tevgel dikirin û koçemal berjêr dibûn, di nav kîjan êlê re derbas dibûn hesabê



www.arsivakurdi.org

çêra pezên xwe dikirin û heqê erdê, baca rê didane wan. Her weha gava di nav Reşkotan re derbasdibûn-ku rîya wan, bibê nebê di wir re bû- xûkîtîya rê, çêrê ya Reşkotan, didane Felît.

Etmanî, êleke bi xwe bawer in. Li pişta Bayqanê li dora Xîzana Bedlîsê cîwar in. Karwanê Etmanîyan, li xwe danaynin bac û xûkîtîyê bidin kesî, tew kurrê jinebîyekê (Felîtê Quto), gava xûkîtîyê ji wan bixwe, serhevdîyeke gelek mezin e. Li ser baca rê şerê wan dest pê dike.

Filît lawo, maman î xweş maman î
Nebxêr, nizanim çi karwan bû hate bi giranî
Mi dî bavê Hesen çend peyayên Reşkota bi xwe re hilanî
Xwe berda pêşîya Mamê Etman, vî karwanî
Go: -Lawo, ka baca te ji min re anî?
Mamê Etman digo:- Filît lawo
Em karwan in, karwançî ne,
Lawo, em xerîb in, em rêwî ne.
Filît digo:- Ez bi enîya bavê xwe kim,
Ezê tivinga pîkê te ji te bistînim.
Mamê Etma digo:- Ez ê tivingê bi te dim,
Ezê dîya teya Şemê ji yextyarê bavê xwe re bînim.
Mamê Etman derbek berda bejn û bala bavê Hesen
Di zincîra seetê re lê dixîne

Roka me hilatî ji aliyê Bota
Şewq û şemala xwe da bejn û bala bavê Hesên
Her çar peyên me Reşkota.
Xwezî Mamê Etman biçûya cî-warê xwe,
Li ser kurrê min, li gor şîr û bextê xwe bigota.
...
Roka me hilatî ji alî Silîva,
Şewq û şemala xwe da peyayên Reşkota, van tivingên toqezîva.
Mamê Etman derbek berda kurrê mi rebenê,
Serê wî birrî ji balîf û nazbalîfa.
...
Filît lawo, Maman î xweş Maman î
Mi kes nedî, nala Mamê Etman
Li welatê xerîb, şer dikir, mêr dikuşt û dest hilanî
Bira diya wî bi tenê, bê:- Mi çog da erdê, lawek anî
Çawa çira mala Quto vemiran, konê me datanî...

Felît û dîya xwe li gundê Baderesê rûdiniştin. Gundê Baderesê di qontara

Çîyayê Qêre di tixûbê Reşkotan û Sînkîyan de ye. Kanîya Baderesê di guhereke pirr mezin de wek ava aşekî ji binê tahtekê derdikeve, di biniya wê re darên fêkî, bax û bîstan in (Di vê dema dawîyê de Hecî Nûrîyê mala Nêsir xanîyek li ser vê mêrgê ava kiriye, bi cîran û derûdora xwe bûye şênîyekî gelek xweş).

**Reşkotan:** Reşkotan yan jî Rişkotan navê eşîrekê ye ku ev eşîr herêmeke fireh dide ber xwe û 60 gund in; yanî di salên 1930-40'î de 60 gundên eşîrê hebû. Herêma Reşkotan, ji sêrrêya Mala Badê heta dighêje nêzî Batmanê, Kevanê Kêrê (Qêre) û dirêj û dirêj diçe hetanî dighêje Qubînê ku niha, navê wê Bişêrî ye. Ji wir berjêr dibe ser çemê Xerza (Çemê Awîskê) û bi jor ve diçe heta dighêje qûntara çiyayê Mereto, yanî di binê Hezo ku niha navê wê Kozlux e. Qûntar û qûntar bi rojava ve berjêr dibe, heta dighêje dîsa sêrrêya Mala Badê. Ji vê herêmê re herêma Reşkotan tê gotin.

Bavê Fexro yan Bavê Fexriya kurê Hecî Mihemedê Bolindî ye. Ew gundê ku mala Heci Mihemed bi xwe lê rûdiniştin û niha jî ku zaroyên wan lê rûdinin, navê wî Kurtikê (Kortikê) ye. Hinek gundên wan yên din jî hene: Herfasê, Newalê, Hiznamîrê, Tapiyê, Hedhedkê, Dirbêsa, Taharîyê, Kelhokê, Zivingê, Baderesê...

Hecî Mihemedê Bolindî mezinê eşîra Reşkotan bû, heşt kurrê wî hebûn (dibe ku neh bin, lê ez baş nizanim): Yaho, Sebrî, Rizo yan Rezo, Tewfo, Nayîfo... Her çiqasî ji wan re Mala Axê dibêjin jî lê belê di van salên dawî de Hecî Elîyê Şemsê ku li Hiznamîrê rûdinişt, axatîya Reşkotan ji dest wan girt. Hecî Ehmed kurê Hecî Elî yê Şemsê beriya demekê Reîsê Belediya Qubînê bû. Ew niha axatiya Reşkotan dike.

Piştî şikestina şerê bi serokatiya Şêx Seîdê Pîranê (1925), fermana Reşkotan, ji alîyê hukumeta Tirk ve rabû. Gelek caran wan û hukumetê şer kirine. Di destpêkê de hukumetê tu tesîreke mezin li wan nekiriye. Şerê Reşkotan bi hukumetê re wek gelek kesên salmezin ku dibêjin, heta sala 1936/38-a devam kiriye. Destpêka şerê mezin weha çêbûye:

Di wê demê de hukumetê ji bo ku bikaribe eşîrên Kurdan ji ber hev bixe, dostaniya hin eşîran kirine û ew bera ber hev dane, bi vî awayî dest avêtine eşîra Rema ku wî çaxî serokê eşîrê Emînê Ehmed bûye. Emînê Ehmed ji sê alayî, hin dibêjin Firqeyek eskerê Tirk re rêbertî kiriye. Ew eskerên Tirk êrîş birine ser eşîra Sînika (Sînka). Eşîra Sînka ji kontara Çiyayê Qêre, ji aliyê Bişêriyê û hetanî qismekî mezin ji deşta bişêriyê herêma wan e. Merkeza eşîrê Basorkê bûye. Niha jî ew gund ava ye. Serokê Eşîrê û mala Nêsir tê de dijîn. Ordiya Tirk pêşî li eşîra Sînkiya xistiye, Eşîra Sînkiya li ber dewletê şikestine û xwe avêtine nava Eşîra Reşkotan. Reşkotan piştgiriya wan kiriye û li pêşberî Ordiya Tirk derketine. Li Qêre şerekî pir mezin çêbûye. Li gorî gotinan; gelek

topên ordiya Tirk di wî şerî de ji wan hatine stendin. Lê mixabin ordiya Tirk ji hev neqetiya ye û gelek eskerên bi gelek car êrîş birine ser Reşkotan. Di dawî de Reşkotan jî mecbûrê vekşandinê bûne. Bi alî Çiyayê Mereto ve vekşiyane û xwe avêtine nav Eşîra Bekiran.

Dibêjin; wî çaxî ji xeynî Hedhedkê 59 gundên Reşkotan ji alî ordiya Tirk ve hatine şewitandin û her weha ordiyê taqîbata eşîra Reşkotan kiriye. Reşkotan, Bekiran û gelek kurdên din wê demê bi hebûn û nebûna xwe pêşberî dewletê şerekî giran danîne, li dar xistine. Merkeza şerê giran li sêrêya Mala Badê li kêleka zîyaretê, Quba Şêxê Zîlan, çêbûye. Di wî şerî de Kurdan bobelateke mezin bi serê eskerên Tirkan de anîne. Esker şikestine û revîyane. Yên ku sax mane, xwe avêtine ava çemê Batmanê, ji bo ku derbasî Deşta Silîva bibin. Lê belê li gorî gotinan, ev şer di dema buharê de çêbûye û wê demê ava çem rabûbû, bihur nedida. Eskerên ku sax mabûn xwe avêtine avê û hema hema tevên wan di avê de xeniqîne. Heta van salên dawî jî tivingin eskerên Tirkan di nav quma çem de, li nêzîkê Batmanê derdiketin, xelkên ku behs dikirin digotin ku ev tiving ên wê demê ne. Dibêjin, Emînê Ehmed û Silêmanê Biro (Ew jî Axakî Reşkotan  bûye û li gundê Dawidîyê rûdiniştin), li kêleka zîyareta Şêx Zîlan ku Ordiya Tirk şikest, siwarî bûne û bi xêra hela hespên xwe ji kuştinê xelas bûne.

Piştî vê şikestinê bi du salan hukumetê xezeba xwe bêtir avêtiye ser eşîrên Kurdan, herweha fermana Bekiran û Reşkotan rakiriye. Giregirê van eşîran ên ku berdest kirine tev surgun kirine, cihê wan guhestine (Weke; qismek ji eşîra Sinikya li derdora Qerejdaxê bi cih kirine). Yên ku xwe nedane dest reviyane, derbasî Suriyeyê, binê xetê bûne.

Hin kesên van eşîran ku bi ber peşka Hukumeta Tirk ketibûn, piştî salên 1950'yî ku Partiya Demokrat a bi pêşîkêşiya Adnan Menderes hate ser hukum û afiya wan dan, vegeriyane cihê xwe.

Strana li ser Bavê Fexriya di vê dema ji welêt bi dûrketine, hatiye gotin. Bavê Fexriya zilamekî pir bedew û li hev hatî bû. Dibêjin, rojekê Bavê Fexriya li hespê xwe siwar e ku navê hespê wî Gijo (genco) ye, li ser kaniyekê peya dibe ku avê bide hespê xwe. Keç li ser kaniyê bûne. Keçek ji nav wan dil ketiye bejn û bal û bedewbûna Bavê Fexro ku keçikê bi pirsiyar ew naskiriye û zaniye ku navê keça wî Fexriya ye. Gelek dengbêjan ev kilama ku ji devê wê keçikê derketiye bi gelek awa li ser dildariyê dirêj kirine û gotine.

Ez çûm Bolindê, Sebriyê Hecî ne li mal e,
Dibên li şerrê Tirka, li Pira Batmanê birîndar e.
Nizanim çi? Şerrê Steqlala Şêx Şeîd, fermana Kurda rabûye
Berê Sebrî, ta û ev birînê dane xeta Eleman e.
Ditirsim birîna Sebrîyê Hecî bimîne
Li binya xetê, bê hekîm û bê derman e.

Minê serê cotê zermemikê xwe biçirpanda,
Jê re bikira mîl û melhem û serderman e.

Dinya ewr e, nabe sayî
Xwezî çend roja li min û Bavê Fexro biba xweşî, bilindayî,
Nizanim çi? Steqlala Şêx Seîd, fermana Kurda rabûye.
Berê Sebrî dane binya xeta Firensawî

Bira li me nehata surra sibê, bayê van gelîya
Lênexista li bejna minî zirav, baqê sorgulîya.
Nizanim çi? Fermana Kurda rabûye,
Dibên berê Sebrî, tev birînê, dane Binya Xetê, ecnebîya.
...
Dora kanîyê dora min e.
Cerrê Batî, cerrê avê li milê min e.
Cerrê avê, bi xwe serê min û bavê min e.
Caba xêrê ji min re hatî:
Dibê:-Bavê Fexrîya, Kekê Yaho, Suwarê Genco,
Îro sê roj, li Hafa Bolindê, li Eynqirda şewitî li benda min e.
...
Salixê didin; ava berrîya jêrîn,
Ava bîra ye, nexweş e ji hilm û bîna zerkullîya.
Ez zanim Bavê Fexro elimîye sîya qesra,
Ava çema, sarkanîya.
Dibên; Bavê Fexrîya xwe berdayi binya Xetê.
Li şewitîya Kerengo, her çar malê Yezîdîya....
...

---

**Çavkanî:**
- Ahmed Aydın: Dekşûrî ye. Jı mala Mahmed e. Pêncî û pênc-şêst salî ye. Lı Almanyayê rûdınê.
- Tewratê; Qîza Hecî Emerê Gundıkî ye.Temenê wê lı dora (65) şêst û pênc sala ye. Reşkotî ye, ji Reşkotan Lûlıkî ye. Jı malbata Şêxê Zirav e.
- Zeynelabıdîn Zınar: Nıvîskar- Folklornıvîs e. Çıl û heft-pêncî salî ye. Lı Stokholmê rûdine.
- Stranbêjên Kurd: Izzedînê Heremşıdadî, Hısênê Uso, Ahmoyê Xarpêtî.
- Celîlê Celîl; Zargotina Kurdên Sûrîyê.
- Û jı guhbıhîstinên cıvatê...

# Çend pirsên rêzimana Kurdî–II

**Mûrad Ciwan**

**TEWANDINA NAVAN**

Her wekî tê zanîn di Kurdî de nav tên tewandin. Sê awe tewandin hene di Kurdî de.

**1-Yek jê ji bo yekejimarî û pirejimariya navan e.**

**Herwekî**

| **Yekejimar** | **pirejimar** |
|---|---|
| defter | defteran |
| berx | berxan |
| çiya | çiyayan |
| welat | welatan |
| Ahmed | Ahmedan |
| Zelal | Zelalan |
| şivan | şivanan |

**2- Ya din ji bo diyarî û nediyariya navan e.** Diyarî û nediyariya navan jî hem di halê yekejimariyê de, hem jî di halê pirejimariyê de pêk tê.

**Her wekî:**

| **yekejimar** | | **pirejimar** | |
|---|---|---|---|
| **diyar** | **nediyar** | **diyar** | **nediyar** |



www.arsivakurdi.org

| | | | |
|---|---|---|---|
| zarok | zarokek | zarok/zarokan | zarokin/zarokinan |
| berx | berxik | berx/berxan | berxin/berxinan |
| kitêb | kitêbek | kitêb/kitêban | kitêbin/kitêbinan |

**3- Tewandina sisyan jî tewandineke taybetî ye** ku ez nizanim gelo di tu zimanekî din de heye an na. Her wiha zimannasên zimanê Kurdî heta îro zelal jî nekirine ku fonksiyona vê tewandinê di zimanê kurdî de çiye. Vê tewandinê ew yek bi xwe re aniye ku di zimanê Kurdî de du awe/du grûp cînav(zamîr-pronav) an du halê wan di Kurdî de hebin:

**Her wekî:**

| | |
|---|---|
| ez | min |
| tu | te |
| ew | wî/wê |
| em | me |
| hûn | we |
| ew | wan |

Piştre em ê vegerin ser van halên cînavan(zamîran/pronavan)

Li ser rola vê tewandina navan hinan gotine ku gava nav di cumleyekê de lêker(subjekt) bin bi serê xwe ne û gava bireser(objekt) bin tewandî ne. Lê di wan mîsalan de ku ez ê niha bidim, diyar dibe ku ne wiha ye.

**Her wekî:**

Şivan berxê tîne.

Li vir şivan lêker(subjekt) e û netewandî ye. "Berx" bireser(objekt) e û tewandî ye.

Şivanî berx anî.

Yan jî:

Şivên berx anî.

Di vê cumlê de şivan cardin lêker(subjekt) e lê bi eksê cumleya berê tewandî ye û berx cardin bireser(objekt) e, lê ew jî netewandî ye. Nexwe mesele ne mesela objektiyê û subjektiyê ye.

Di zimên de ji vî awayê tewandinê re hin qaîde hene û bi saya wan em dikarin bêjin ku kîjan nav di kêderê de çi mahneyê dide, li gor van tewandinan diyar dibe ku tarîfkariya navan divê çawa bin û hetta fiîlên cumleyan divê



www.arsivakurdi.org

çawa bên bikaranîn.

Lê tiştekî din jî heye ku ev pirensîbê tewandinê ji wan pirensîban e ku di zimanê Kurdî de herî pirr hatiye texrîbkirin û herî pirr şaş tê bikaranîn. Ne ku tenê Kurdîaxêvên normal wê şaş bikartînin, hema hema tevayiya nivîskar û zimannasan jî wê di axaftin û nivîsandinên xwe de şaş bikar tînin.

Em werin ser mesela vê tewandinê. Tewandin di navên nêr û yên mê de cuda ne.

a)Tewandina navên mê di yekhejmariyê de bi wî awayî tên çekirin ku meriv paşpirtika (-ê) ya tewandinê tîne dawiya peyveka mê. Di halê pirhejmariyê de paşpirtika (-an) ku navan dike pirhejmar wê rola tewandina bi vî awayî jî dileyize.

**Herwekî:**

| **yekejimar** | | | | **pirejimar** | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|
| **diyar** | | **nediyar** | | **diyar** | | **nediyar** | |
| **xweser/tewandî** | | **xweser/tewandî** | | **xweser/tewandî** | | **xweser/tewandî** | |
| av | avê | avek | avekê | av | avan | avin | avinan |
| dar | darê | darek | darekê | dar | daran | darin | darinan |
| jin | jinê | jinek | jinekê | jin | jinan | jinin | jininan |

b)Tewandina navên nêr bi du awayan tên çekirin.

1- Di halê yekejimariyê de meriv paşpirtika (-î) ya tewandinê tîne dawiya peyveka nêr. Di halê pirhejmariyê de paşpirtika (-an) ku navan dike pirhejmar wê rola tewandina bi vî awayî jî dileyize.

**Herwekî:**

| **yekejimar** | | | | **pirejimar** | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|
| **diyar** | | **nediyar** | | **diyar** | | **nediyar** | |
| **xweser/tewandî** | | **xweser/tewandî** | | **xweser/tewandî** | | **xweser/tewandî** | |
| ber | berî | berek | berekî | ber | beran | berin | berinan |
| kur | kurî | kurek | kurekî | kur | kuran | kurin | kurinan |
| nan | nanî | nanek | nanekî | nan | nanan | nanin | naninan |

www.arsivakurdi.org

2-Wan navên nêr yên ku dengê ”e” û ”a” di wan de hene ”a” an ”e”ya dawiyê bi dengê ”ê” tê guherandin û bi vî awayî tê tewandin. Ev awe tewandin tenê di tewandina navên diyar de kare bê bikaranîn. Tewandina navên nediyar cardin wekî awayê yekê pêktê.

**Herwekî:**

**yekejimar**

| **diyar** | | **nediyar** | |
|---|---|---|---|
| **xweser** | **tewandî** | **xweser** | **tewandî** |
| Ahmed | Ahmêd | Ahmedek | Ahmedekî |
| Zinar | Zinêr | Zinarek | Zinarekî |
| Soro | - | Soroyek | Soroyekî |
| kevir | kêvir | kevirek | kevirekî |
| şivan | şivên | şivanek | şivanekî |

Ev awayê tewandina navan di halê pirejimariyê de her wekî awayê beşê pêşîn e.

**pirejimar**

| **diyar** | | **nediyar** | |
|---|---|---|---|
| **xweser** | **tewandî** | **xweser** | **tewandî** |
| Ahmed | Ahmedan | Ahmedin | Ahmedinan |
| Zinar | Zinaran | Zinarin | Zinarinan |
| Soro | Soroyan | Soronin | Soronina |
| kevir | keviran | kevirin | kevirinan |
| şivan | şivanan | şivanin | şivaninan |

Niha jî em werin ser wê yekê ku nav li ku derê di kîjan halan de tên tewandin.

a) Di dema tarîfkariya navan de hergav navê ku tarîf dike tewandî ye û navê ku tê tarîfkirin xweser e.

**Her wekî:**

| | |
|---|---|
| roja welatî | roja welêt |
| kurê jinê | |
| keça bavî | keça bêv |
| dewra Özalî | dewra Özêl |
| pariyê nanî | pariyê nên |

tasa avê
goştê mirîşkê

b) Gava nav bi edatên li, li gel, ji, ji bo, bi, ji .... re, ji ... de, ji ... ve, bi ... re, bi ... ve, bi ...de, di ... re, di ... re, di .... de ûhw din re bi kar bên tên tewandin.

**Her wekî:**

| | |
|---|---|
| li malê | |
| li gel Azadî | li gel Azêd |
| ji bo Zelalê | |
| ji welatî, | ji welêt |
| bi nanî | bi nên |
| bi xwê | |
| ji çiyayî de | ji çiyê de |
| ji Kemalî re | ji Kemêl re |
| bi şîvanî re | bi şivên re |

c) Gava nav di cumleyekê de tê bikaranîn li gor wê yekê tê an nayê tewandin ku ka fiîla wê cumlê fiîleka transîtîf e, yan întransîtîf e, her wiha ew nav lêker(subjekt) e yan bireser(objekt) e û ya din jî cumle ji bo kîjan zemanî hatiye gotin. Prensîbên bikaranîna navên xweser û tewandî wiha ne:

**1- Gava fiîla cumlê întransîtîf be;**

Di hemû deman de navê ku lêker(subjekt) e xweser e. Jiber ku fiîl întransîtîf e biresera(objekta) cumlê nîne. Di cumleyek wiha de, heke hebe, navê li gel adverbîala(tumleç) cumlê li gorî herdu prensîbên pêşîn(a û b) tewandî ye. Kêşana fiîla wê cumlê li gorî zemanê cumlê û li gorî subjekta cumlê tê guherîn. Ji ber ku subjekt xweser e, heke pirejimar jî be paşpirtika pirejmariyê wernagire. Yekejimarî û pirejimariya subjektê bi fiîlê tê diyarkirin.

**Her wekî:**

| **Subjekt yekejimar e:** | **Subjekt pirejimar e:** |
|---|---|
| Azad dê biçe bo malê. | Azad dê biçin bo malê |
| Azad diçe bo malê. | Azad diçin bo malê. |
| Azad çû bo malê. | Azad çûn bo malê |
| Şivan diçe ber pezî. | Şivan diçin ber pezî. |
| Şivan çû ber pezî. | Şivan çûn ber pêz. |

**2- Gava di cumleyê de fiîl transîtîf be:**



www.arsivakurdi.org

a) Di dema niha, yên mayî û ya fireh de:

Subjekta ku nav e xweser e, objekta ku nav e tewandî ye. Ji bo ku subjekt xweser e nabe pirhejmar. Pirhejmarî û yekhejmariya wê bi fiîlê diyar dibe. Her wiha fiîl li gora şexsê subjektê tê guherîn.

**Her wekî:**

Ahmed ê kitêbê binivîse.
Azad kitêbê dixwîne.
Zelal dê kitêbê bixwîne.
Zelal kitêban dinivîse.
Zarok çîrokan dibêjin.

b) Di hemî demên borî de:

Navê ku subjekt e tewandî ye. Navê ku objekt e xweser e. Ji ber ku objekt xweser e paşpirtika pirhemariyê wernagire. Loma jî yekejimarî an pirejimariya objektê bi saya serê fiîla cumlê tê zanîn.

**Her wekî:**

Keçikê kitêb nivîsî.
Azadî kitêb nivîsî.
Azadî kitêb nivîsîn
Nivîskaran kitêb nivîsî.
Yaşar Kemalî kitêb nivîsîn.
Şivanî berx bir.
Şivanan berx bir.
Şivanî berx birin.

## CÎNAVÊN KURDÎ

Her wekî tê zanîn di zimanê Kurdî de du awe cînavên şexsî hene.

**Wekî:**

| | |
|---|---|
| ez | min |
| tu | te |
| ew | wî/wê |
| em | me |
| hûn | we |
| ew | wan |

Gelo çima ji bo her şexsekî du cînav hene, heta îro ev yek jî ji bal zimanzanan nehatiye zelalkirin. Hin hene ku gotine grûba duduyan a van cînavan cînavên mulkî ne(posessiva pronom- mulkîyet zamîrî).



www.arsivakurdi.org

**Her wekî:**

| **Kurdî** | **Ingilîzî** | **Tirkî** |
|---|---|---|
| min | my | benim |
| te | your | senin |
| wî | his | onun |
| wê | her | onun |

Lê ev ne rast e û ev awe cînav/zamîr (piştre em ê firehtir li ser rawestin) ne cînavên/zamîrên mulkî ne, gellek caran ev awe wekî lêker(subjekt) an bireseran(objektan) di cumlê de derdikevin pêşberî me.

**Her wekî:**

**Min** kitêbek xwend.
**Min** qelemek kirrî.
**Te** sêvên xwe firotin
**Wî** çîrokek got
**Wê** kinc şûştin.
Ew **wê** dibe malê.
**Me** çu nevê.
Ez ji **te** hez dikim.
**Min** tu divêyî.

Yên ku pirtir li ser vê meselê serê xwe êşandine û nêzîkayî li meselê kirine, avakerê alfabe û rêzimana Kurdî Celadet Alî Bedirxan û zimannasê Kurd Prof. Dr. Qanatê Kurdo ne. Lê wan bi xwe jî firsend nedîtine ku meselê bi tevayî zelal bikin.

Gava cara pêşîn ez li ser rêzimana Kurdî xebitîm min jî gellekî xwe bi vê meselê mijûl kir û ez gihîştim encamekê ku ev zamîr ne ku du grûp zamîr in, lê beşê duduyan ê zamîran halê tewandî yê zamîrên yekem in.

Her wekî tê zanîn ku cînav dikevin şûna navan, ji ber wê di zimanên ewrûpî de ji wan re pronom têne gotinê. Yanî yên ku dikevin cihê navan. Piraniya zimannasên Kurdên Soran jî bi Kurdî ji van re dibêjin" cênaw". Ji bo ku ev terîm di nava Kurdan de muşterek be min jî di kitêba xwe de ji wan re got "cînav".

Nexwe piştî ku ew ciyên navan digrin û wekî berê me bahs kir navên Kurdî xwedanê du halan e; halê "xweser" û halê "tewandî", divê cînav jî ji du halan pêk bên ku karibin cihê her du halên navan bigrin.

**Yanî**

**halê xweser** **halê tewandî**

| | |
|---|---|
| ez | min |
| tu | te |
| ew | wî |
| ew | wê |
| em | me |
| hûn | we |
| ew | wan |

**Yanî:**

| | |
|---|---|
| **Şivan** hat. | **Ew** hat. |
| **Şivanî** got. | **Wî** got. |
| **Bêrîvan** mihê didoşe. | **Ew** wê didoşe. |
| **Bêrîvanê** mîh dot. | **Wê** ew dot. |

Prensîbên bikaranîna halê xweser û yê tewandî yê cînavan her wekî wan sê prensîbên bikaranîna halê xweser û yê tewandî yê navan e. Di cumleyekê de li kê derê navê xweser bi kar bê gava cînav were şûna wê divê cînavê halê xweser be. Li cihê navê tewandî jî cînavê tewandî bikar tê.

**Her wekî:**

| | |
|---|---|
| **Azad** dê biçe bo **malê**. | **Ew** dê biçe bo **wê** derê. |
| **Azad** dê biçin bo **malê** | **Ew** dê biçin bo **wê** derê. |
| **Azad** çû bo **malê**. | **Ew** çû bo **wê** derê. |
| **Azad** çûn bo **malê** | **Ew** çûn bo **wê** derê. |
| **Şivan** diçe ber **pezî**. | **Ew** diçe ber **wî** |
| **Şivan** diçin ber **pezî**. | **Ew** diçin ber **wî** |
| **Şivan** çûn ber **pêz**. | **Ew** çûn ber **wî**. |

| | |
|---|---|
| Ez ê **kitêbê** binivîsim. | Ez ê **wê** binivîsim |
| **Azad kitêbê** dinivîse. | **Ew wê** dinivîse. |
| **Zelal** dê **kitêbê** binivîse. | **Ew** dê **wê** binivîse. |
| **Zelal kitêbê** dinivîsin. | **Ew wê** dinivîsin |
| **Çîrokbêj çîrokan** dibêjin. | **Ew wan** dibêjin. |

| | |
|---|---|
| **Azadî kitêb** nivîsî. | **Wî ew** nivîsî. |
| **Azadî kitêb** nivîsîn. | **Wî ew** nivîsîn. |
| **Me kitêb** nivîsî. | **Me ew** nivîsî. |
| **Me kitêb** nivîsîn. | **Me ew** nivîsîn. |
| **Şivanî berx** bir. | **Wî ew** bir. |
| **Şivanan berx** bir. | **Wan ew** bir. |



www.arsivakurdi.org

| | |
|---|---|
| **Şivanî berx birin.** | **Wî ew birin.** |

Çend nimûnên şaşbikarhênayî û rastiya wan.

**Her wekî:**

| şaş | rast |
|---|---|
| Te min kuşt. | Te ez kuştim. |
| Min te bir. | Min tu birî. |
| Min wan anî. | Min ew anîn. |
| Me we bir. | Me hûn birin. |
| Min kitêban xwend. | Min kitêb xwendin. |
| Şivan berxan anî. | Şivanî/Şivên berx anîn. |
| Tîma taybetî gundiyan kuşt. | Tîma taybetî gundî kuştin. |

Divê li vê derê ez bala beşdaran bikşînim ser wê yekê ku ne tenê cînavên şexsî, lê hemû cînav xwedanê halê xweser û yê tewandî ne. Lê li vê derê mijara me ne binavkirina hemû cînavan e, loma jî em li ser wan ranawestin.

Berî ku em beşê li ser cînavan xelas bikin divê ez vê yekê jî bibêjim ku cînavên mulkî(mülkiyet zamirleri/possesiv pronom) bi serê xwe di Kurdî de nînin. Cînavên mulkî di Kurdî de bi alîkariya herfa tarifan(veqetandekan/ artikelan) û halê tewandî yê cînavên şexsî çêdibin:

**Her wekî:**

| **ji bo mê yekejimar** | **ji bo nêr yekejimar** | **ji bo pirejimarên her du cinsan** |
|---|---|---|
| ya min | yê min | yên min |
| ya te | yê te | yên te |
| ya wî | yê wî | yên wî |
| ya wê | yê wê | yên wê |
| ya me | yê me | yên me |
| ya we | yê we | yên we |
| ya wan | yê wan | yên wan |

## MESELA DIYARÎ Û NEDIYARIYA NAVAN DI KURDÎ DE

Di dema axaftinê de ew navên ku ji alî bêjer û guhdarî ve tên nasîn ji wan re tên gotin navên diyar, ew navên ku ji alî bêjer û guhdarî ve nayên nasîn ji wan re tên gotin navên nediyar.



www.arsivakurdi.org

**Her wekî:**

Meriv hat.
Min berx anî.
Ez kitêbê dixwînim.
Ez kitêban dixwînim.

Di vir de hem bêjer hem jî guhdar dizanin ku behsa *kîjan merivî, kîjan berxê, kîjan kitêbê* an *kitêban* tê kirin. Ev navên diyar in. Lê heke em binivîsin ku:

Merivek hat.
Min berxek anî.
Ez kitêbekê dixwînim.
Ez kitêbina[n] dixwînim.

Di vir de nayê zanîn ku behsa kîjan merivî, kîjan berxê, kîjan kitêbê an kitêban tê kirin. Ev, navên nediyar in. Navên diyar û nediyar hem di halê yekejimariyê hem jî di halê pirejimariyê de çêdibin û dikarin xweser an tewandî bin.

**Her wekî:**

**xweser:**

| | | |
|---|---|---|
| **diyar yeke-/pirejimar** | **nediyar yekejimar** | **nediyar pirejimar** |
| defter | defterek | defterin |
| meriv | merivek | merivin |
| ala | alayek | alayin |
| çiya | çiyayek | çiyayin |
| pale | paleyek | paleyin |
| mela | melayek | melayin |
| gund | gundek | gundin |

**tewandî:**

| | | |
|---|---|---|
| **diyar yeke-/pirejimar** | **nediyar yekejimar** | **nediyar pirejimar** |
| defterê | defterekê | defterinan |
| merivî | merivekî | merivinan |


www.arsivakurdi.org

| | | |
|---|---|---|
| alayê | alayekê | alayinan |
| çiyayî | çiyayekî | çiyayinan |
| paleyî | paleyekî | paleyinan |
| melayî | melayekî | melayinan |
| gundî | gundekî | gundinan |

## DI KURDÎ DE HERFA TARÎFÊ YAN JÎ ARTÎKEL/VEQETANDEK

Artîkel di Kurdî de ew in ku bi gellek rolên xwe navan tarif dikin, fonksîyona bikêrhatinê didin wan, cinsiyet û pirejimarî an yekejimariya wan diyar dikin, an dibin gîhaneka navbera navên ku hev û din tarîf dikin an ji bal hevdu ve tên tarîfkirin.

Artîkelên Kurdî ev in:

**Di navên diyar de:**
ji bo navên nêr ên yekejimar [y]ê
ji bo navên mê yên yekejimar [y]**a**
ji bo pirejimara herdu cinsan [y]**ên**

**Her wekî:**

kurê jinikê
keça jinikê
kur**ên** jinikê/keçên jinikê

**navên nediyar**
jibo navê nêr ê yekejimar **î**
ji bo navê mê yê yekejimar **a** yan jî **e**
ji bo pirejimariya her du cinsan **ên** yan jî **e** ye.

**Her wekî:**
keçeka jinikê
Kurekî jinikê
Kurinên jinikê/kurine jinikê

Berê di Kurdî de ev artîkel bi vî awayê jêrîn bûn.

**Di navên diyar de**
ji bo navên nêr ên yekejimar [y]ê **di**

| | |
|---|---|
| ji bo navê mê yê yekejimar | [y]a **di** |
| ji bo pirejimara herdu cinsan | [y]ên **di** |

**Her wekî:**
kurê **di** jinikê
keça **di** jinikê
kurên **di** jinikê/keçên **di** jinikê

**navên nediyar**

| | |
|---|---|
| ji bo navê nêr ê yekejimar | **î di** |
| ji bo navê mê yê yekejimar | **a di** yan jî **e di** |
| ji bo pirejimariya her du cinsan | **ên di** yan jî **e di** ye. |

**Her wekî:**
keçeka **di** jinikê
Kurekî **di** jinikê
Kurinên **di** jinikê/kurine **di** jinikê

Lê ev awe îro di gellek devokan de rabûye, bi hin guhertinan meriv dikare di Behdînî de şopa wê bibîne.

Herwekî ”zarokên di jinikê” bûye ”zarokêd jinikê” heta ew jî guheriye bûye ”zarokêt jinikê”

Ev artîkel her wekî me di behsa cînavên mulki de jî got hevokên cînavê mulkî an aîdîyeta li gel navan jî durust dikin:

**Her wekî:**

| | | |
|---|---|---|
| ya min | yê min | yên min |
| ya te | yê te | yên te |
| ya wî | yê wî | yên wî |
| ya wê | yê wê | yên wê |
| ya me | yê me | yên me |
| ya we | yê we | yên we |
| ya wan | yê wan | yên wan |

**yan jî;**

| | | |
|---|---|---|
| ya Azadî | yê Azadî | yên Azadî |
| ya şivên | yê şivên | yên şivên |
| ya keçikê | yê keçikê | yên keçikê |
| ya Zelalê | yê Zelalê | yên Zelalê |
| ya Goyiyan | yê Goyiyan | yên Goyiyan |
| ya Kurdan | yê Kurdan | yên Kurdan |

www.arsivakurdi.org

Ev artîkel dikare wekî cînavî/zamîrê têkeve şûna navan :
**Her wekî:**

| **Ji dêlva ku meriv bibêje:** | **Meriv dişê bibêje:** |
|---|---|
| Sêva sor şêrîn e, lê sêva kesk tirş e. | Sêva sor şêrîn e, lê ya kesk tirş e. |
| Xaniyê zer yek qat e, lê xaniyê sipî du qat e. | Xaniyê zer yek qat e, lê yê sipî du qat e. |

Meriv dikare deyne ber navan, diyarî û yekejimarî an pirejimariya wan diyar bike.
**Herwekî:**

| | |
|---|---|
| yê Kurd | yên Kurd |
| ya sefîl | yên sefîl |

Di hin devokên Kurmancî de(wekî devoka Bahdînî û pirtir jî ya Şêxan) di cumleyan de bi awayekî welê tên pişt lêkeran(subjektan) ku cinsiyeta wan diyar dikin:
Ez ya hatim: (Li vir diyar dibe ku ya ku dibêje "ez hatim" jin e.)
Ez yê hatim. (Li vir diyar dibe ku yê ku dibêje "ez hatim" mêr e.)
Tu ya hatî.(jin)
Tu yê hatî.(mêr)
Ew ya hat.(jin)
Ew yê hat.(mêr)

Di devoka dora Afrînê de jî ev bingeh heye lê guhertinek tê de çêbûye; ji dêlva yê û ya'yê î peyda bûye:
Ez î hatim.
Min î got.
Te yî got.
Esas guherîna bi vî awayî li gorî prosesa pêşveçûna ziman e. Di Soranî de jî ev artîkel guheriye. Artîkela (î)hem ji bo cinsê mê û hem jî ji bo yê nêr tê bikaranîn:
Kurî min.
Kiçî min.

## DI KURDÎ DE TARÎFKARÎ

Tarîfkarî bi wî awayî derdikeve holê ku kombînezona ku pêk tê, bi hin awayan, ji hin aliyan ve mahneyeka zêde dide wan gotinan ku nav in an ji cinsê



www.arsivakurdi.org

nava ne. Di tarîfkariyê de sê beş hene; gotina tarîfbûyî, gotina tarîfkir û veqetandeka(herfa tarîfa) ku herdu beşan bi hev girêdide:

Her wekî:

dara sêvê

Li vir "dar" gotina tarîfbûyî, "sêv" gotina tarîfkir û (-a)veqetandek e ku her du beşên pêşîn bi hev ve girêdide. Sê awe tarîfkarî hene:

1- Tarîfkariya navan
2- Tarîfkariya hevalnavan
3- Tarîfkariya cînavan

Di tarîfkariyê de hemû caran navê tarîfbûyî xweser e, nayê tewandin û gava di şûna navî de cînav(zamîr) jî bê ew di halê xwe yê xweser de tê. Ya tarîfkir heke nav an cînav be tê tewandin û heke hevalnav(adjektîf) be, ji ber ku hevalnav nayên tewandin bi eslê xwe dimîne.

Di tarîfkariya navan de gava tarîfkir yekejimar û diyar be, ew tarîfkarî diyar e.

Her wekî:

**nivîskarê çîrokê:** Li vir çîroka ku tê binavkirin ji bal me ve tê zanîn ku kîjan çîrok e. Qesd çîrokeke diyar e. Bi Tirkî meriv dikare wiha tercume bike: **"hikayenin yazarı"**

**nivîskarê çîrokan:** Li vir behsa tu çîrokên diyar nayê kirin, qesd ew e ku nivîskar, nivîskarê çîrokan e. Bi Tirkî meriv dikare wiha tercume bike: **"hikaye yazarı"**.

**Awayên tarîfkariya navan ev in:**

**navên mê**

| | | | |
|---|---|---|---|
| sêva darê | sêva daran | sêva darekê | sêva darina |
| sêveka darê | sêveka daran | sêveka darekê | sêveka darina |
| sêvên darê | sêvên daran | sêvên darekê | sêvên darina |
| sêvine darê | sêvine daran | sêvine darekê | sêvine darina |

**navên nêr**

| | | | |
|---|---|---|---|
| darê şivanî | darê şivanan | darê şivanekî | darê şivanina |
| darekî şivanî | darekî şivanan | darekî şivanekî | darekî şivanina |
| darên şivanî | darên şivanan | darên şivanekî | darên şivanina |
| darine şivanî | darine şivanan | darine şivanekî | darine şivanina |

**Tarîfkariya bi cînavan:**

| | | | |
|---|---|---|---|
| darê min | darê te | darê wî | darê wan... |



www.arsivakurdi.org

**Tarîfkariya bi hevalnavan(adjektîvan):**
sêva sor sêva mezin sêva tirş sêva kurmî...

**Di tarîfkariyê de hin bikaranînên şaş û rastiya wan:**

| **Şaş** | **Rast** |
|---|---|
| Cizîra Botanê | Cizîra Botan |
| Komeleye Kurdistan | Komeleya Kurdistanê |
| Zebeşê Diyarbekir | Zebeşê Diyarbekirê |
| Yek Gulan | Yekê Gulanê |
| Leyla heval | Havala Leyla(Leyla arkadaş) |
| - | Hevala Leylayê(Leyla'nın arkadaşı) |

**PIRSA AVAKIRINA CUMLEYÊN ŞAŞ**

Ev sê cumle min ji hin deran girtine ku bi baweriya min şaş, heta li gorî avakirina cumleyên Tirkî hatina avakirin:

**Şaş:**

Amerîka di hevdîtinên xwe yên bi Celal Telebanî û Mesûd Barzanî re de wê nerazîbûna xwe bîne zimên

**Rast:**

Amerîka di hevdîtinên xwe de ku bi Celal Telebanî û Mesûd Barzanî re dike wê nerazîbûna xwe bîne zimên.

**Şaş:**

Ew dixwazin federasyonekê ku navenda wê li Diyarbekirê ye ava bikin.

**Rast:**

Ew dixwazin federasyonekê ava bikin ku navenda wê li Diyarbekirê be.

**Şaş:**

Lê komeleyê xebata xwe li gora armanca ku di destûra wê ya resmî de hatibû nivîsandin bi sînor nedikir.

**Rast:**

Lê komeleyê xebata xwe li gora wê armancê bi sînor nedikir ku di destûra wê ya resmî de hatibû nivîsandin.

**Şaş:**

Ez dixwazim li ser hin şaşiyên ku ji bêtecrubetiya DDKO´yê dihatin, rawestim.

**Rast:**

Ez dixwazim li ser hin şaşiyan rawestim ku ji bêtecrubetiya DDKO´yê dihatin.

# Çend kilam li ser bûkan

*Ev kilamên bûkan bi qasî ku di bîra min de maye, sê çar sal berê ji min re şandibûn. Yên kasêt dagirtine dê û dotên(keç) hev in. Navê dê Şê'ê û navê keça wê jî Fatê ye. Ew ji Wêranşarê ji gundê Daraxulya ne. Yekcarna jê re tenê Dar jî dibat gotin.*

*Ez salên wan bı hawakî durust nizanim. Lê bi texmîna min ewê Şê'ê li dor şêst, şêst û pênc salî hebuya dema ev kasêt dagirtibû. Wê par wefat kir. Keça wê, Fatê li dora çel û pênc salî ye û nuha li Wêranşarê dijî.*

*Şê'ê ji eşîra Çûva, ji bera Mexsoya ye, lê mêrê wê ji bereke din, ji bera Xamoya ye. Lê belê merivên hev in, eşîra wan yek e.*

*Ji bo ku meriv kilamên wan ji hev bigerîne, min di dawiya malikan de yên Şê'ê di nav parantêzê de bi herfa (Ş) û yên Fatê jî bi herfa(F) îşaret kirin.*

*Zinarê Xamo*

Daykê hina bûkê di teştê ko
avê bi kevçî kevçî lêko
de bîne berê li destê xwa paşê ko(Ş)

Hina me hina vê Diyarbekir
me kirîbû li hev zêdekir
lê hekê çepilê bûkê û diya bûkê gir bûn, hinê qîm nekir(Ş)

Ha li hîta ha li hîta
swar û segmana da cirîta
le daykê bûka me ji mala mêra, xwarziya egîta(Ş)
Daykê kûzê vê qitranê

min avîtî binya Tilgoranê[1]
de hekê, hevalxêrê xelata xalê lokê[2] hanê(Ş)

Ava çemê me zelalo
têde dilîze kwêrgî û xezalo
lê welle axatî ji berê da li bavê Faîq wer helalo(Ş)

Daykê xeftanê bûka me qutnîyê Şamo
min fesiland ne temamo
lê hekê welle Şam î dûro û wez peya mo(Ş)

Daykê hina vê Helebê
hine li destê vê Zeynebê
lê hekê, hevalxêrê de vay tu çû
aqûbet li serê heval û hogirê dora te bê(Ş)

Bûkê rake ji pêyo
xêrê lêko çeka çêyo
lê hekê, hevalxêrê mi go gune li stuyê dê û bavê yo(Ş)

Bûka me dara serê rêyo
alyak sêvo yek hirmêyo
de devê berbuya bişkê, zimanê wan jêbe
yek nikane kilamekê li ser hevala mi bibêyo(F)

Go ev çi dara li pey êşo
mi berra girto piyê qumêşo
de mi go pismamo xaîno were pêşo(F)

De li wiyalî çîtê, li wiyalî çîtê(Ş)
dengê kevoka sipî tê
de welle ji berê de dengê bavê Faîq bi mêranî, bi egîtî tê

Daykê deva bûkê bi rastê xo
xêliya bûkê bi ber bê xo
lê hekê, hevalxêrê agirkî di dilê dê û bavê xo(Ş)

Daykê xêliya bûkê helîlê xavo
têra xuyaye bisk û çavo(Ş)[3]
Daykê Qerejdaxa li taco
Diyarbekir hêlek deno û hêlek zaco

www.arsivakurdi.org

lê hekê, hevalxêrê taliya qîza ya mirino û ya j î zewaco(Ş)

Daykê Qerejdax berbi royo
lê hişinhatî indilkoyo
lê welle kalkê Azad bûk ji Hecî stendî bi zora çoyo(Ş)

Ha li tela, ha li tela
koç û kerî hat mexela
lê dayikxêrê welle bûka me qîza şêra ye, xwarziya beglera(Ş)

Daykê bûk û du berbûno
ji mala wê de berjêr bûno
lê bav û birên bûkê ji nîro şûn de poşman bûno(Ş)

Daykê berê ruyê li mezel bû
kutlê suwara li me der bû
le welle bavê Faîk ji berê de seresker bû(Ş)

Daykê me ji dîba heya dîba
dayikxêrê welle nexşê hûr î rûheqîba
de welle di Yaşa Silo ra em tu carî jinên xwe nadin xerîba(Ş)

Ava Qerejdaxê li tiştîra
destê berbuyê me'na li gustîla
lê hekê hevalê, bûka me qîza mêran û diya wezîra(F)

Daykê xaniyê bavê bûkê nûlêkirî
torbê toraqê pêde kirî
le berbuyê me'na hatin û devlêkirî(Ş)

Xaniyê bavê te li korto
dilopa pêde şorte şorto
de hekê, hevalê xema mexo paşa xorto(F)

De ji dana heya dana
pez sekinî ser guhana
lê hekê, hevalxêrê devê diya bûka me nola uncûrê nav bîstana(Ş)

Gundê me ji gunda dero
kevirê dora kaniya gundê me mermero



www.arsivakurdi.org

lê hekê welle diya bûka me nola arwana[4] qemero

Ew çi dara li kepirê
swar û segmana xar dibêrê
de dayikê xweziya mi bi dilê wê xweyingê, xweying bûbe berdêlya(Ş) birê

Ew çi dara li pê êşo
mi pêde kirî topê qumêşo
le pismamno kwîrno[5] werin pêşo(Ş)

Ew çi dara li pê gêdûkê
mi pêde kirî laşê biçûkê
le pismamno kwîrno îro ji xwe ra werin bûkê(Ş)

---

(1) Navê gundekî Wêranşarê ye.
(2) Deveyê nêr.
(3) Rêza dawî nehatıbû qeytkırın.
(4) Deveya mê.
(5) Kor.

www.arsivakurdi.org

# Kirdkî (Zazakî) di suffîksî(*)

**Malmîsanij**

-a (I): Ebi nê suffîksî (Tirkî di "sonek"), fî'lan ra kelîmeyê makî (femininî) viraziyênê. Eke bingeyê fî'lî (yanî şexsê hîrin ê demeyê viyartî) ebi herfa vengini (vokal) biqediyo, herfa "-y" dekewena miyanê bingeyê fî'lî û suffîksî, suffîks beno "-ya".

nimûney (mîsalî): ameya, kewta, kişta, menda, merda, nimita, nuşta, pergenda, pîşta, rakerda, rakewta, ronîşta, şikiyaya, vata, veradaya, vîcnaya/vîjnaya, weçînaya, wenda, zanaya, zirraya

-a (II): Ebi nê suffîksî, him tanî kelîmeyê makî (femininî) him zî nerî (masculinî) viraziyênê.

nimûney: paka/panka, pala, roşna, serra, zûra/zura

-a (III): Ebi nê suffîksî nameyê aletan (hacetan) ê makîyan viraziyênê.

nimûney: desta, rêşta

-a (IV): b. -an

-ag: çilag/çulag

-ak: hûrak/hurak

-al: Ebi nê suffîksî tanî kelîmeyê nerî viraziyênê.

---

(*) Îşâretê / mıyanê (beyntarê) kelîmeyan yan zî sûffîksan û kelîmeyanê asarênan dı ronıya ki 'eynî me'na danî.
Suffîksê kı nuştışê yînî zey (sey) yewbînan o labelê fonksîyonê yînî cıya wo, mı ebı numre rêz kerdî. Ma vajî: -a (I), -a (II), -a (III).
Herında "bıewnîrê" ("biewnîm", "bewnê") di mı wına nuşt: b.



www.arsivakurdi.org

nimûney: çengal/çungal, delal, heval, kendal

**-ale/-ali**: Ebi nê suffîksî tanî kelîmeyê makî viraziyênê.
nimûney: delale/delali, hevale

**-ale**: b. **-are**
nimûne: çîtale

**-alek**: No suffîks me'na zaf hurdîyey (diminutif) dano û ebi yê tanî kelîmeyê nerî viraziyênê.
nimûney: hebalek, 'îçalek, qîtalek, wîçalek

**-aleki**: No suffîks me'na zaf hurdîyey dano û ebi yê tanî kelîmeyê makî viraziyênê.
nimûney: hebaleki, 'îçaleki, qîtaleki, wîçaleki

**-an**: Ebi nê suffîksî namey (substantif) yan zî sifetê zafhûmarî (plurielî) viraziyênê. Tanî cayan di herinda "-an" di "-a", "-on", "-o", "-ûn" yan zî "-û" vajiyêno. Ma vajî cawo ki vajê "Gayan biyare", vanê "Gaya biyare" yan zî "Gayû biyare".
namey: destan, dewan, embazan, estaran, estoran, gamêşan, heran, kutikan, lingan, şêran
sifetî: başan, bêkesan, çikosan, dergan, holan/hewlan, kilman, raştan, rindan, weşan

**-ana**: vêkana

**-ane**: Tanî cayan di herinda "-ane" di "-one" yan zî "-ûne" vajiyêno. Ma vajî cawo ki vajê "kemane", vanê "kemone" yan zî "kemûne".
nimûney: deluwane, herane, gegane, giştane/engiştane, îstane, kemane, sellixane/selexane, tengane, vengane, vêşane/vîşane, xaxane

**-anek/-onik**: derganek/dergonik

**-anekey/-onikey**: derganekey

**-aney**: Tanî cayan di herinda "-aney" di "-oney" yan zî "-ûney" vajiyêno. Ma vajî cawo ki vajê "nêweşaney", vanê "nêweşoney" yan zî "nêweşûney".
nimûney: heraney, mêrdimaney, nêweşaney, vêkaney

**-aneyî**: Tanî cayan di herinda "-aneyî" di "-oneyî" yan zî "-ûneyî"



www.arsivakurdi.org

vajiyêno.
nimûne: vêk**aneyî**

**-anî**: Tanî cayan di herinda "-anî" di "-onî" yan zî "-ûnî" vajiyêno.
nimûney: engiş**tanî**, mêrdim**anî**, nêweş**anî**, vêk**anî**, xort**anî**

**-ar**: Ebi nê suffîksî tanî kelîmeyê nerî viraziyênê.
nimûney: çeng**ar**, gil**ar**, murd**ar**, zinc**ar**

**-are** (I): No suffîks, ze "-verê" ziwanê Avesta di û ze "-war" Pehlevkî di zî esto. Ebi yê tanî kelîmeyê nerî viraziyênê. Ma vajî "goşare", Avesta di "geoşaverê ", Pehlevkî di " "goşwar" o. Suffîksî "-verê" Avesta di me'na "berdene" dano: "geoşaverê " yani çiyo ki goş ci beno.
nimûne: goş**are**

**-are** (II): Ebi nê suffîksî tanî kelîmeyê nerî viraziyênê.
nimûney: çît**are**, pîy**are**

**-ari**: Ebi nê suffîksî tanî kelîmeyê makî viraziyênê.
nimûney: ceng**ari**/zeng**ari**, gon**ari** [kevnar], murd**ari**

**-as**: b. -es

**-as**: Kird**as**

**-asênî**: kêm**asênî**

**-asî**: Kird**asî**

**-ay**: No suffîks tanî hûmaran di esto.
nimûney: hewt**ay**, heşt**ay**, new**ay**

**-ay**: zur**ay**

**-az**: mîr**az**

-[**b**]**al**: Ebi nê suffîksî tanî kelîmeyê nerî viraziyênê.
nimûne: go**pal** [Faris¨kî di "kûbendebal"], qo**pal** [qop + bal]

**-ban**: 'Eslê nê suffîksî ziwanê Pehlevkî di "-pan" o û me'na pawitoxî dano,

yanî keso ki çîyê ver di vindeno, paweno, kontrol keno. Ma vajî -Kirdkî di- ”baban” [baxban] ’eslê xwi di ”baxpan” o û aw kes o ki baxî yanî rezî yan zî bexçî paweno. Tanî cayan di herinda ”-ban”î di ”-bon”, ”-van”, ”-von”, ”-wan” ”-won”, yan zî ”-wo” vajiyêno.

nimûney: ar**bançî**, ba**bançî** [baxbançî], ber**banik**, sek**man/sebkan** [sekban]

**-baz**: Ebi nê suffîksî tanî kelîmeyê nerî viraziyênê. Fariskî di ”baz” yeno me’na kaykerdoxî. Yanî ”qumarbaz” keso ki qumar kay keno, ”canbaz” keso ki pey ganî (canî) kay keno.

nimûney: can**baz**/cam**baz**, çene**baz**, dêr**baz**/deyr**baz**, dîl**baz**, dowil**baz**, em**baz**/im**baz**/hem**baz**, fêl**baz**, qumar**baz**, seyd**baz**, sêr**baz**, zor**baz**

**-baze/-bazi**: Fariskî di ”bazî” yena me’na ”kay”. Ebi nê suffîksî tanî kelîmeyê makî viraziyênê.

nimûney: can**baze**/cam**baze**, çene**baze**, dêr**bazi**/deyr**bazi**, dîl**bazi**, em**bazi**/im**bazi**/hem**bazi**, fêl**baze**, qumar**baze**, seyd**bazi**, sêr**bazi**, zor**baze**

**-bazî**: pirên**bazî** [pirênembazî]

**-bend**: Fariskî di ”bend” fî’lê ”besten” ra yeno û ay çî ra vajiyêno ki merdim pey yê çîyêna girêdano, besteno. Ebi nê suffîksî tanî kelîmeyê nerî viraziyênê.

nimûney: baz**bend**/bazû**bend**, lul**bend**/luli**bend**, nal**bend**, saz**bend**, şila**bend**, ver**bend**ik, saz**bend**

**-ber** (I): No sufîks bingeyê fî’lê ”berdene”/”berdiş”î yo û ebi yê tanî kelîmeyê nerî viraziyênê.

nimûne: esp**ar**/asp**ar** [esp + ber], emir**ber**, ray**ber**/rê**ber**/ray**ver**, renc**ber**/renç**ber**

**-ber** (II): No sufîks fî’lê ”birnayêne”/”birnayiş”î ra yeno.

nimûne: more**ber** [marebirnayox/morebirnayox]

**-ber** (III): azne**ber**

**-bere/-beri**: No sufîks fî’lê ”berdene”/”berdiş”î ra yeno û ebi yê tanî kelîmeyê makî viraziyênê.

nimûne: esp**ari**/asp**are**, dîl**bere**, emir**bere**, rê**beri**, renc**beri**/renç**bere**

**-besti**: çim**besteki**, gir**besti**/girê**besti**

**-bêj**: Kurmanckî di ”-bêj”, fî’lê ”gotin” (vatene) ra yeno.



www.arsivakurdi.org

nimûne: deng**bêj**

**-bîn/-bin**: Kurmanckî di fî'lê "bînîn"/"dîtin" (vînayîne, veynayiş)î ra yeno.
nimûne: dur**bîn**/dir**bin**

**-bon**: b. **-ban**

**-cet/-jet/-zet**: nêm**cet**/nêm**jet**/nême**zet**

**-ceti/-jeti/-zete**: nêm**ceti**/nêm**jeti**/nême**zete**

**-cey**: b. -**jey**

**-cî**: No suffîks Tirkî ra amewo û karê kesî yanî meslegî îfade keno.
nimûney: avsan**cî** [asvancî], saw**cî**

**-çe**: No suffîks me'na hurdîyey dano.
nimûney: bex**çe**, box**çe**, çirre**çe**, dol**çe**/dewl**çe**, kel**ce**/kele**ce**/kelî**ce** (kelje, keleze), ku**çe**/ku**ça**, lew**çe**, nîm**çe**

**-çî**: No suffîks Tirkî ra amewo û karê kesî yanî meslegî îfade keno.
nimûney: arwan**çî**, aş**çî**, çekal**çî**/çikal**çî**, çop**çî**, fal**çî**, karwan**çî**/kerwan**çî**, kerxane**çî**, keyf**çî**/kêf**çi**, kîra**çî**, kure**çî**, lax**çî**, miyan**çî**, pîne**çî**, qahwe**çî**/qawe**çî**/qayfe**çî**, qela**çî**, qol**çî**, qumar**çî**, sayd**çî**, sêr**çî**, tabur**çî**, utêl**çî**

**-çengi**: kir**kinci** [kerçeng]

**-çurr**: lew**çurr**

**-çurri**: lew**çurri**

**-da/-daye**: qin**da**/qen**da**/qî**da**/qine**daye**

**-dan/-dani**: Suffîksê nameyê cay o.
nimûney: cuz**dan**, çay**dani**, şam**dani**

**-dar**: Fariskî di "dar" bingeyê fî'lê "daşten" (wayirbiyayene) yo. Avesta di "der" vêreno. Kirdkî di zî "-dar" me'na wayirbiyayene dano. Ma vajî, "birîndar" keso ki birîna xwi esta (wayirê birîni), "çekdar" keso ki çeka xwi esta,
nimûney: aqil**dar**, berxu**dar**, birîn**dar**, cin**dar**, çek**dar**, deyn**dar**, eleqe**dar**,

www.arsivakurdi.org

hagîdar/hayidar/haydar, hêvîdar, namedar/namdar, nandar/nondar, nobedar/nobidar, payedar, rengdar, sermiyandar, xeberdar, xiznedar, zordar

**-daş**: Ebi nê suffîksî tanî kelîmeyê nerî viraziyênê. Gelek ziwanzanayoxan gore, 'eslê "-daş"î Tirkî yo.
nimûney: sînordaş/sîndordaş, taximdaş, wetendaş, xeyrdaş/xêrdaş

**-daşe/-daşi**: Ebi nê suffîksî tanî kelîmeyê makî viraziyênê.
nimûney: sînordaşe/sîndordaşi, wetendaşe

**-daye**: b. -da

**-de**: Fî'lê "dîyayene"/"dîyayîş"/"dîtiş"î ra yeno. Ma vajî "durde" me'na "durbîn"î dano.
nimûne: durde

**-derz**: solderz/sewlderz

**-e (I)**: Ebi nê suffîksî namey û sifetê makî viraziyênê. No suffîks şîweya Dêrsimî di "-e" wo, labelê cayanê bînan di hîna zaf beno "-i".
namey: bizêke/bizêki, dizde/dizdi, germe/gêrmi, golike/goliki, here/heri, heşe/heşi, kavire/kaviri, kome/komi, lawike, lewe/lewi, xoze/xozi, zarance/zeranci
sifetî: berze/berzi, delale/delali, derge/dergi, girane, girse/girdi, pîre/pîri, rinde/riindi, sivike/siviki

**-e (II)**: Ebi nê suffîksî fî'lan ra kelîmeyê nerî viraziyênê. Eke bingeyê fî'lî (yanî şexsê hîrin ê demeyê viyarti) ebi herfa vengini (vokal) biqediyo, herfa "-y" dekewena miyanê bingeyê fî'lî û suffîksî, suffîks beno "-ye".
nimûney: ameye, kewte, kişte, mende, merde, nimite, nuşte, pergende, pîşte, rakerde, rakewte, ronîşte, şikiyaye, vate, veradaye, vîcnaye/vîjnaye, weçînaye, wende, zanaye, zirraye

**-e (III)**: Ebi nê suffîksî nameyê aletan (hacetan) yan zî nameyê mekanan ê nerîyan viraziyênê.
nimûney: deste, mele, resene/resne, rişte, saqe

**-e (IV)**: Ebi nê suffîksî kelîmeyê nerî viraziyênê.
nimûney: çime, derze, dibare/dubare, hefte/hewte, koye, lewe, miyane/mêne, nême/nîme, pale, raste/raşte, sere, serre, şîre



www.arsivakurdi.org

**-ecin**: b. **-ijin**

**-ejin**: b. **-ijin**

**-ek** (I): No suffîks me'na yewey û belînêbiyayişî (indéfini) dano. Ma vajî "ruêjek" me'na "yew rojî" dano. Eke kelîme bi xwi ebi herfa vengini (vokal) biqediyo, herfa "-y" dekewena miyanê bingeyê kelîme û suffîksî, suffîks şeklê "-yek"î gêno.
nimûney: ruê**jek**, xêlî**yek**, yew**ek**, çew**ek**

**-ek** (II): No suffîks me'na hurdîyey, tanîyey (tikêyey), çîyê mendene (muşabîhey) dano, yan zî ebi yê nameyê aletan (hacetan) û sifetê nerî viraziyênê. Eke kelîme bi xwi ebi herfa vengini (vokal), "-î", "-i" yan zî "-e" biqediyo, suffîksê "-ek"î şeklê "-êk"î gêno.
namey: ban**ek**, birr**ek**, biz**êk**, boz**ek**, dest**ek**, dewl**ek**/dol**ek**, dês**ek**, keçel**ek**, lac**ek**/laj**ek**/laz**ek**/lay**ek**, leyr**ek**, mêrd**ek**, mordem**ek**, pêç**ek**, qeç**ek**/qic**ek**/qij**ek**, ser**ek**, sur**ek**/sûr**ek**
sifetî: derg**ek**, heb**ek**, kej**ek**, kirr**ek**, misqal**ek**, qît**ek**, qol**ek**, qot**ek**, sîyay**ek**, sur**ek**, şenik**ek**, wird**êk**

Tanî kelîmeyê ki ebi suffîksê "-ek", "-êk", "-alek" yan zî "-êlek"î qediyênê, gege newe ra suffîksê "-ek"î gênî û me'na zaf hurdîyey yan zî zaf tanîyey (tikêyey) danê.
nimûney/nerî: biz**êkek**, heba**lekek**, misqal**ekek**, wird**êkek**, wird**êlekek**/wid**êlekek**
makî: biz**êkeki**, cen**êkeki**, heba**lekeki**, misqal**ekeki**, wird**êkeki**, wird**êlekeki**/wid**êlekeki**

**-eke/-eki**: No suffîks me'na hurdîyey û tanîyey (tikêyey) dano û ebi yê namey û sifetê makî viraziyênê. Şîweya Dêrsimî di "-eke" wo, labelê cayanê bînan di hîna zaf beno "-eki". Eke kelîme bi xwi ebi herfa vengini (vokal) biqediyo, suffîksê "-eki" şeklê "-êke"/"-êki" gêno.
namey: biz**êki**, cin**êki**/cen**êki**, çal**eki**, çimbest**eki**, çiron**eki**/çuran**eki**, dew**eki**, 'elb**eki**, goz**eke**, her**eki**, keçel**eki**, kên**eki**/keyn**eki**/çên**eke**, leyr**eki**, pêç**eki**, qeç**eki**/qic**eki**/qij**eki**, qer**eki**, sur**eki**
sifetî: derg**eki**, heb**eki**, kej**eki**, kirr**eki**, misqal**eki**, qît**eki**, qol**eki**, qot**eki**, sur**eki**, şenik**eke**, wird**êki**

**-eki**: b. **-eke**

**-el**: b. **-al** (I)



www.arsivakurdi.org

nimûne: çengel

**-ela/-êla**: No suffîks me'na rengê kincanê (cilane) merdimî dano. Yanî merdimo ki kincê surî pira yî "surêla", merdimo ki kincê sipî pira yî zî "sipêla" wo. No suffîks bi xwi "-la" yan zî "-ela" wo, labelê eke kelîme bi xwi ebi herfa "-î" yan zî "-e" biqediyo "-êla" herinda "-ela"y gêno.

nimûney: sip**êla**, siy**ala**, sûr**ela**/sur**êla**

**-elaye/-elay-êlay**: No suffîks me'na rengê kincanê (cilane) cenî/keyneki dano. Yanî cenî/keyneka ki kincê surî pira yî "surêlaye", cenî/keyneka ki kincê sipî pira yî zî "sipêlaye" ya. No suffîks bi xwi "-laye" yan zî "-elaye" yo, labelê eke kelîme bi xwi ebi herfa "-î" yan zî "-e" biqediyo "-êlaye" herinda "-elaye" gêno.

nimûney: sip**êlay**, siy**alay**, sûr**elaye**/sûr**elay**/sur**êlay**

**-en**: pey**en**

**-eni**: pey**eni**

**-en**: Suffîksê mesderî (infinitif) şîveya Dêrsimî di "-ene"/"-eni"/"-êne" wo, labele gege herfa peyene nêvajiyêna û no suffîks ze (se) "-en" maneno.

nimûne: ronişt**en**

**-ende**: gew**ende** [Fariskî di: gûyende]

**-ene/-yene**: Şîveya Dêrsimî di "-ene" suffîksê mesderî (infinitifî) yo. Eke bingeyê fî'lî bi xwi ebi herfa vengini (vokal) biqediyo, herfa "-y" dekewena miyanê bingeyê fî'lî û suffîksî, suffîks şeklê "-yene"î gêno. Tanî cayan di no suffîks ze "-eni"/"-yeni" yan zî "-êne"/"-yêne" vajiyêno.

nimûney: ama**yene**/ama**yêne**, ard**ene**, berd**ene**, bi**yene**/biya**yêne**, da**yene**/da**yêne**, deşt**ene**/deşt**eni**, eşt**ene**, guret**ene**, kerd**ene**, kewt**ene**, mend**ene**, mord**ene**, rot**ene**, şîya**yene**/şîya**yêne**, waşt**ene**, wend**ene**, zana**yene**/zana**yêne**

**-eni**: b. **-ene/-yene**

**-er/-eri/-yeri**: No suffîks, şîveya Sêwreg di esto û vêşane tanî kelîmeyanê makîyan ê nasbiyayeyan (défini) ra pey yeno. Zeki nimûneyanê cêrînan ra zî belî beno, nê kelîmey vêşane cinî (cenî) yan zî keyneki (kêneki) îfade kenê.

nimûney: cêrî**yeri**, cinêk**er**/cinêk**eri**, cinî**yeri**, dedkeyn**eri**, gorim**eri**, keynek**eri**, pisîng**eri**, qeçek**er**, xalcinî**yeri**, veyvek**eri**, vistrûw**eri**, wesnî**yeri**

**-ere/-eri**: b. **-ire/-iri**
nimûne: bencere, engiştere/engîşteri

**-eri**: b. **-eri**

**-eri**: b. **êre** (II)

**-es/-as**: No suffîks tanî hûmaran di esto û 'eslê xwi "des" o. Yanî "hîres" 'eslê xwi di "hîrê desî" yo.
nimûney: çewres/çores, hîres/hîris, pancas

**es**: b. **-ês**

**-ewr**: b. **-êre** (II)

**-ey/-yey**: Ebi nê suffîksî, sifet û nameyê muşexxesî (concret) ra namewo mucerred (abstrait) viraziyêno. Herinda nê suffîksî di Kirdkî di ca-ca nê suffîksî zî vajiyênê: -ê/-yê, -ênî, -îye.
nimûney: azadey, berzey, bê'arey, birayey, ciwaney, citêrey, dergey, durey, erjaney, gedeyey, girdey, kerwayey/kerbayey, mêrdimey, nezaney, payedarey, payekerey, pîley, pîrey, rindey, surey, tolazey, veriney, vêkey, vêşâney/veyşaney, wayirey, weşey, xêvey, xîntey, xortey

**-ê/-yê** (I): Ebi nê suffîksî, sifet û nameyê muşexxesî (concret) ra namewo mucerred (abstrait) viraziyêno. b. **-ey**, **-ênî**, **-îye**
nimûney: birayê, çimtengê, mertê, nekesê, pintîyê, wayê

**-ê/-yê** (II): No suffîks me'na yewey û belînêbiyayişî (indéfini) dano. Ma vajî "lajekê" me'na "yew lajekî" dano. Eke kelîme bi xwi ebi herfa vengini (vokal) biqediyo, herfa "-y" dekewena miyanê bingeyê kelîme û suffîksî, suffîks şeklê "-yê" gêno.
nimûney: gamê, lajekê/lacekê, mêrikê, rojê/rozê, serrê, vîstê, wextê, zalimê

**-ê** (III): No suffîks halê xîtabkerdişî (vocatif) di kelîmeyanê makîyan ra pey yeno.
nimûney: dayê, kejê, keynê/kênê/çênê, korê, pitê, qerê, qolê, rindê, tirrê, xalê, yaykê, zerê!

**-êk** (I): No suffîks me'na yewey û belînêbiyayişî (indéfini) dano. Ma vajî "rojêk" me'na "yew rojî" dano.

nimûney: gencêk, hedîsêk, rojêk/rocêk

**-êk:** b. **ek** (II)

**-êkek:** b. **-ek** (II)

**-êkeki:** b. **-ek** (II)

**-êki:** b. **-eke**

**-êla:** b. **-ela**

**-êlay:** b. **-elay**

**-êlek:** No suffîks me'na zaf hurdîyey dano û ebi yê kelîmeyê nerî viraziyênê. 'Eslê yê "-alek" o, labelê eke kelîme bi xwi ebi herfa vengini (vokal) biqediyo, "-a"yê "-alek"î beno "-ê" û suffîks beno "-êlek".
nimûne: **wirdêlek/widêlek**

**-êleki:** No suffîks me'na zaf hurdîyey dano û ebi yê kelîmeyê makî viraziyênê.
nimûne: **wirdêleki/widêleki**

**-êli:** b. **-êre/-êri** (II)

**-ên** (I): No suffîks misneno (nawneno) ki yew çî çi ra viraziyawo. Ma vajî "sêmên" aw çî yo ki sêm ra viraziyawo. b. **-in** (I).
nimûney: **asinên, darên, mûyên, peşmên, rêsên, sêmên, sifrên, zerrên/zerrnên**

**-ên** (II): No suffîks me'na yewey û belînêbiyayişî (indéfini) dano. Ma vajî "sereyê herên" me'na "sereyê yew herî" dano. Eke kelîme bi xwi ebi herfa vengini (vokal) biqediyo, herfa "-y" dekewena miyanê bingeyê kelîme û suffîksî, suffîks şeklê "-yên"î gêno.
nimûney: **herên, girweyên, rojên, keyeyên, mengên, mezelên, mêrdimên**

**-ên** (III): Ebi nê suffîksî sifetê nerî viraziyênê.
nimûney: **binên, cêrên, corên, mêrdimên, rengên, salihên, serên, şîrên, verên, xaşxaşên, xeyrên, zurayên**

**-êne/-êni:** Ebi nê suffîksî sifetê makî viraziyênê.



www.arsivakurdi.org

nimûney: binêne/binêni, cêrêne/cêrêni, corêne/corêni, mêrdimêni, rengêne/rengêni, salihêni, serêne/serêni, şîrêne, verêni, xeyrêni, zurayêni

-êne: b. -ene

-êney: b. -ênî
nimûne: risêney, rispêney/risipêney

-êni: b. êne

-ênî/-yênî/-êney: Şîveya Dêrsîmî di ebi nê suffîksî, sifet û nameyê muşexxesî (concret) ra namewo mucerred (abstrait) viraziyêno. Herinda "-ênî/-yênî" de ebi kilmey "-ên" zî vajiyêno. Herinda nê suffîksî di Kirdkî di ca-ca nê suffîksî zî vajiyênê: -îye, -ê/-yê, -ey.
nimûney: axayênî, azadênî, baytarênî, begênî, birayênî, girsênî, merdênî, mordemênî, nokerênî, rindênî, rindekênî, risêney/rîşiyayênî, rispêney/risipêney/rîsipênî, sipênî, sûrênî, şîrinênî, şuwanênî, vêşanênî, wayîrênî, weşênî, xortênî, zurekerênî

-êr (I): No suffîks, pêveronayîş (muqayesekerdiş) di dereca hîna berzi îfade keno. 'Eslê yê "-tir" o (b. -tir).
nimûney: berzêr, dergêr, girdêr/girsêr, holêr/hewlêr, rewêr rindêr, tenikêr, weşêr, xirabêr, xurtêr

-êr (II): mastêr (huni)

-êre/-êri (I): No suffîks, pêveronayîş (muqayesekerdiş) di dereca hîna berz a çiyanê makîyan îfade keno. 'Eslê yê "-tire" o.
nimûney: berzêre/berzêri, girdêri/girsêre, holêri/hewlêri, rindêri, tenikêri, weşêre/weşêri, xirabêri, xurtêri

-êre/-êri (II): 'Eslê nê suffîksî kelîmeya "dar" a û me'na dare dano. Ma vajî "gozêre" dara gozan, "vamêre" dara vaman a. No suffîks gege nê şeklan di zî vajiyêno: -eri, -ewr/-owr, -êli.
nimûney: alinçêri, borincêli, gozêre/gozêri, hinarêri, încilewr/încilowr, mazêri, mişmişêri, sayêre/sayêri, simzêri, tuwêri/tuyeri, vamêre/vamêri, vaşêre, velgêre, xowxêri/xewxêri

-êri: b. -êre

-ês/-es: No suffîks tanî hûmaran di esto û 'eslê xwi "des" o. Ma vajî



www.arsivakurdi.org

"pancês" 'eslê xwi di "panc + des" yanî "des û panc" o. "Diwês"/"duyes" yanî "des û di", ziwanê Avesta di "dvedese", Hîndkîya Verêne de "dvadeçe" bi. Hûmara "yewendes"/"yewndes"/"yondes"/"jondes" a Kirdkî di "d"yê "des"î mendo, vîndî nêbiyo.

nimûney: çares, diwês/duyes, heştês, hewtês, hirês, newês, pancês, şiyês, yewendes/yewndes/yondes/jondes

**-ga** [gah]: danga/donga

**-gan**: adırgan

**-gaz**: asingaz, belengaz/belingaz

**-ge** [geh]: No suffîks me'na cay dano.
nimûney: adirge, berge, binge/binke/binêke, dezge, şarge, zibilge/zivilge

**-gêr**: b. -gîr

**-gêri**: No suffîks fî'lê "gêrayîş"/"geyrayîş"/"cêrayêne" ra yeno. Ebi yê, suffîksê makî viraziyênê. Ma vajî kelîmeya "bargîni" di, 'eslê xwi di suffîksê "-gêr" esto û 'eslê kelîma bi xi "bangêre" ya (yanî banî ser ra gêrena, ebi aye ban yeno çarnayîş). Labelê "R" û "N"y cay xwi vurnawo (bedilnawo) û "bangêre" biya "bargêne", dim a zî biya "bargîni".
nimûne: bargîni [bangêri]

**-gir**: b. -gîr

**-gîn/-gîni**: Fariskî di nê suffîksî ver a "-gîn" esto ki me'na "wayirbiyayiş"î dano. Ma vajî "xwazgîn" (xwaz + gîn), keso "wayirê waştişî" yo.
nimûne: mizgîni, xwazgîn/xazgîn

**-gîr/-gêr/-gir/-kîr**: No suffîks, fî'lê "girewtene"/"girewtiş"î ra yeno. Ebi yê nameyê nerî viraziyênê.
nimûney: bargîr/bergîr/bargir/bêrgir, gangîr/gangêr, kefgîr/kefgêr/kefgir, pêşkîr

**-gon**: b. -gûn

**-gûn/-gon**: Me'na "gûn" yan zî "gon"î "reng" o. Zergûn zî me'na "rengzerd"î dano. Kelîmeya "seyîn" (Kurmanckî di "çawan") bi xwi zî fikrê mi gore 'esle xwi di "se" û "gon" yan zî "se" û "gûn" ra yena, xwira ziwanê

Pehlevkî di na kelîme "çigon", yanî "çê + gon" a.
nimûney: seyîn [segûn], zergûn

**-i**: b. **-e** (I)
nimûne: tirş**i**

**-ic**: b. **-ij**
nimûney: dew**ic**, Pîran**ic**, sûk**ic**, şaristan**ic**

**-ice**: b. **-iji**
nimûney: dew**ice**, Pîran**ice**, sûk**ice**, şaristan**ice**

**-icin**: b. **-ijin**

**-ij**: No suffîks mensubiyetî (cayê ra yan zî çiyê ra biyayişî) îfade keno û ebi yê nameyê nerî viraziyênê. Ca-ca nê şeklan di zî vajiyêno: -ic, -iz.
nimûney: dew**ij**, Diyarbekir**ij**, Pîran**ij**, Sêwrek**ij**, sûk**ij**, şaristan**ij**

**-iji**: No suffîks mensubiyetî (cayê ra yan zî çiyê ra biyayişî) îfade keno, ebi yê nameyê makî viraziyênê. Ca-ca nê şeklan di zî vajiyêno: -ice, -ize.
nimûney: dew**iji**, Diyarbekir**iji**, Pîran**iji**, Sêwrek**iji**, sûk**iji**, şaristan**iji**

**-ijin/-ejin/-icin/-ecin**: Zeki nimûneyan ra fam beno, no suffîks kelîmeyanê "nebaşan"ra pey yeno û sifetan virazeno.
nimûney: germax**ijin**/germax**icin**, kerm**ejin**/karm**ijin**/kerm**ecin**/kerm**icin**, rêx**icin**/rêx**ijin**

**-ik**: No suffîks me'na hurdîyey dano û ebi yê kelîmeyê nerî viraziyênê.
nimûney: berban**ik**, bill**ik**, birr**ik**, boç**ik**, dar**ik**, das**ik**, dest**ik**, gij**ik**/gic**ik**, hachac**ik**, kend**ik**, kerm**ik**/karm**ik**, kod**ik**, lac**ik**/lay**ik**/law**ik**, lep**ik**, kal**ik**, mêj**ik**, mêr**ik**, perper**ik**/pelpel**ik**, pit**ik**, qol**ik**, rişt**ik**, ron**ik**, sîrkut**ik**, vaş**ik**, verbend**ik**, xalxal**ik**, xapxap**ik**, zel**ik**, zer**ik**, zerd**ik**, zîl**ik**

**-ike/-iki**: No suffîks me'na hurdîyey dano û ebi yê kelîmeyê makî viraziyênê. Şîveya Dêrsîmî di ze "-ike", tanî cayanê bînan di ze "-iki" vajiyêno.
nimûney: boç**iki**, cên**ike**, cuwan**ike**/ciwan**ike**/con**iki**, çiran**iki**/çuran**iki**, 'elb**iki**, germ**ike**, gud**iki**, hechec**iki**/hejhej**iki**, pa't**iki**, pîr**iki**, qirr**ike**/qirr**ike**, qol**iki**, şewşew**iki**, vîl**ike**/vil**iki**, zer**iki**

**-ike**: Ebi nê suffîksî kelîmeyê nerî viraziyênê.
nimûne: bend**ike**

**-ikên**: raştikên, qestikên

**-iko**: raştiko, qestiko

**-il** (I): çanqil/çonqil

**-il** (II): No suffîks me'na hurdîyey dano û ebi yê kelîmeyê nerî viraziyênê.
nimûney: bakil, zengil/zingil

**-ile** (I): No suffîks me'na hurdîyey û sînayeyey (heskerdeyey) dano û ebi yê kelîmeyê makî viraziyênê.
nimûne: dakile

**-ile** (II): Ebi nê suffîksî kelîmeyê nerî viraziyênê.
nimûne: çengile, hingile

**-ili**: Ebi nê suffîksî kelîmeyê makî viraziyênê.
nimûney: rêzili, zingili

**-ilik**: No suffîks me'na hurdîyey dano û ebi yê kelîmeyê nerî viraziyênê.
nimûne: zingilik

**-in** (I): No suffîks misneno (nawneno) ki yew çî çi ra viraziyawo. Ma vajî "sêmin" aw çî yo ki sêm ra viraziyawo. b. **-ên** (I)
nimûney: asinin, darin, sêmin, zerrnin

**-in** (II): Ebi nê suffîksî, hûmaranê 'eslîyan ra hûmarê rêzî yê nerî viraziyênê.
nimûney: çarin, desin, diyin/didin, hîriyin, jûyin, newin, pancin, şeşin, yewin

**-in** (III): Ebi nê suffîksî sifetê nerî viraziyênê.
nimûney: awin, awleyin, birrikin, boçin, boçikin, boyin/bûyin, cengarin, dirbetin, germin, gerrin, gilêjgin, goştin, hewayin, hêrsokin, kufikin, lêmin, lêşin, lêşikin, mûyin, pa'tikin, pirçin, qilêrin, ruwenin, serdin, solin, sorrin/şorrin, şermokin, şîrin, tersokin, verin, welin, zengarin, zengin

**-in** (IV): Ebi nê suffîksî nameyê nerî viraziyênê.
nimûney: birrin, darin

**-inci**: sorinci/sûrinci

**-incî**: parsincî

**-ine/-ini/-îne** (I): Ebi nê suffîksî, hûmaranê 'eslîyan ra hûmarê rêzî yê makî viraziyênê.
nimûney: çar**ine**/çar**îne**, des**ine**, diy**ini**/did**ine**, hîriy**ini**/hîrey**îne**, juy**îne**, new**ini**/new**îne**, panc**ine**, şeş**ine**, yew**ini**

**-ine/-ini** (II): Ebi nê suffîksî sifetê makî viraziyênê.
nimûney: aw**ini**, birrik**ini**, boç**ini**, boçik**ini**, boy**ini**/bûy**ini**, cengar**ini**, dirbet**ini**, germ**ine**/germ**ini**, gilêjg**ine**, goşt**ini**, heway**ini**, hêrsok**ini**, kufik**ini**, leym**ini**, lêş**ini**, lêşik**ini**, mûy**ini**, pa'tik**ini**, pirç**ini**, qilêr**ini**, ruwen**ini**, serd**ini**, sol**ine**/sol**ini**, sorr**ine**/şorr**ine**, şîr**ine**, şermok**ini**, tersok**ini**, ver**ine**, wel**ini**, zengar**ini**, zeng**ini**

**-ingi**: sor**ingi**/sûr**ingi**, tirş**ingi**

**-ini**: b. **-ine**

**-ire/-iri**: b. **-ere/-eri**
nimûney: benc**ire**, gust**ire**/gişt**iri**/engişt**iri**

**-iri**: b. **-ire**

**-istan/-îstan/-estan/-stan**: No suffîks me'na cayê tede biyayişî û tede roniştişî yan zî welatî dano. Herçiqas ki vêşane nameyê mekanî îfade biko zî gege nameyê zemanî zî îfade keno, ma vajî kelîmeya "zimistan"î di zemanî îfade keno. Fariskî di tabêstan (yanî "amnan") di zî no suffîks esto. Bingeyê nê suffîksî "sta", Avesta û Fariskîya Keyeni di esto û me'na vindertene dano. Tanî ziwananê Awrûpa di zî tanî kelîmey estê ki bingeyê yînî û na kelîma yew o. Zey "stå" (vindetene, pay ra vindertiş)ya Îsveçkî (Swêdkî), "stehen"a Almankî û "stand" (vindertene)a Îngilizkî.
nimûne: 'Ereb**îstan**, gul**îstan**, Kurd**istan**, Tirk**istan**, şahr**estan**/şar**istan**, zim**istan**

**-iş/-yîş**: Herçiqas ki şîveya Dêrsimî di "-ene" suffîksê mesderî (infinitifî) bo zî cayanê bînan di vêşane suffîksê mesderî "iş" o. Nizdî nê formî, ziwanê Pehlevkî di formê esto, ma vajî ki "zayişn" (yanî "zayîş"). Kelîmeyê ki suffîksê "-iş"î gênê ze name zî gureyênî (yenê xebitnayene). Eke bingeyê fî'lî bi xwi ebi herfa vengini (vokal) biqediyo, herfa "-y" dekewena miyanê

bingeyê fî'lî û suffîksî, suffîks şeklî "-yîş"î gêno.

nimûney: amayîş, ardiş, berdiş, beyîş/biyayîş, dayîş, deştiş, eştiş, gurotiş, kerdiş, kewtiş, mendiş, nuştiş, rotiş, şeyîş/şîyayîş, vatiş, waştiş, wendiş, zanayîş

**-iyayiş/-îyayîş/-iyayîş**: Kirdkî di no suffîks suffîksê mesderê fî'lê passîfî yo.

nimûney: şawiyayîş/erşawiyayîş, kişiyayîş, nusiyayîş, vaciyayîş, waniyayîş

**-iyayîş**: b. -iyayiş

**-iz**: b. -ij

nimûney: dewiz, Dêrsimiz, Erzinganiz

**-ize**: b. -ij

nimûney: Dêrsimize, Erzinganize

-î (I): Ebi nê suffîksî Kirdkî di namey û sifetî benê zafhûmar (pluriel).

namey: çimî, darî, destî, dindanî, golikî, goşî, gulî, încilî, kênekî/keynekî, merdimî/mordemî, vilî

sifetî: başî, çewtî, holî/hewlî, dergî, kilmî, newêşî, rindî, serxoşî, weşî.

---


**Nuştişê nê nuştî di mi hîna zaf nê kitaban ra îstîfade kerd:**

- Alî Seydo Alî Gewranî, Ferhenga Kurdî Nûjen (Kurdî-'Erebî), 'Emman, 1985
- Emır Djeladet Bedır Khan & Roger Lescot, Grammaıre Kurde (dıalecte kurmandjı), Parıs, 1970
- Gılbert Lazard, Dıctıonnaıre Persan-Français, Êntêşaratê Şêrketê Kêtab Berayê Heme, 1370
- Henrık Samuel Nyberg, A Manual of Pahlavı, part II glossary, Wıesbaden, 1974
- Malmîsanıj, Zazaca-Turkçe Sozluk, Stockholm, Jîna Nû Yayınları, 1987
- Muhemmed Huseyn êbnê Xelefê Tebrîzî mutexelles be Borhanê Qatê', Borhanê Qatı', be êhtımamê Dr. Muhemmed Mu'în, cıld: 1-4, Tehran, 1983
- Mûnzûr Çem, Kurtçe (Zazaca)-Türkçe Sozlük, Stockholm, [1994]




www.arsivakurdi.org

# Kirmanckî (fekê Dêrsimî) de zuhûmariye û zafhûmariye

Mûnzûr Çem

**1.** Namê ke ebe herfa bêvenge (konsonant) qedînê, waxto ke bî zafhûmarî (pluriel) herfa "-î" yêna pey.

Mîsal:
**zuhûmar:** cuwamêrd, çim, dest, goş (gos), kitab, Kurd, mordem, nan, rez, welat
**zafhûmar:** cuwamêrdî, çimî, destî, goşî, kitabî, Kurdî, mordêmî, nanî, rêzî (rêjî), welatî

**2.** Namê ke ebe "-î" qedînê, sufîks nêcênê (nêgênê), yanê zuhûmar û zafhûmarê xo zê zuvînî yê.

Mîsal:
**zuhûmar:** kardî, sirsî, şuwalendî, gonî, sacî (sojî)
**zafhûmar:** kardî, sirsî, şuwalendî, gonî, sacî (sojî)

**3.**
a) Namêke formê zuhûmarî de ebe herfa "-e" qêdînê û mayîk ê, eke bî zafhûmarî, "-e" vurrîna, bena "-î".

Mîsal:
**zuhûmar:** bize*, dewe, goze, çêneke, linge, nane (none), qeleme, vame, dare, cênîye/cênîke (cinîye/cinîke), partîye, mîye, lule



www.arsivakurdi.org

**zafhûmar:** bîzî, dewî, gozî, çênekî, lingî, nanî (nonî), qelemî, vamî, darî, cênî (cinî), partî, mî (mîy), lulî

*Tayê cawanê Dêrsîmî de -mesela tayê hetonê Xozat û Pulur (Vacixe) de-, kêlîmê zuhûmarî yê ke na grûbe der ê, zê fêkê Sêwrege hurêndîya "-e"yî de ebe "-i" qedînê. Mîsal: bizi, dewi, gozi, dari, cêniki...

**b)** Kêlîmê ke ebe herfa "-e" qedînê û nêrî yê, eke bî zafhûmarî, "-**e**" vurrîna bena "**-ê**" û naye ra dime kî herfa "**-y**" êna pêy.

Mîsal:
**zuhûmar:** adirge, cezwe, astare, nîştane, gosare, şane (sane), pêsare, gome
**zafhûmar:** adirgêy*, cezwêy, astarêy, nîştanêy, gosarêy, şanêy (sanêy), pêsarêy, gomêy

** Tayê cawan de, seva tayê kêlîman "-e" nêvurrîno "-ê" nêbeno û hurendîya "-êy" de, "-ey" peyê çekuyî de ca cêno. Mîsal: adirgey, astarey.*

**4.** Kêlîmê ke mayîk ê û formê xuyo zuhûmar ebe "**-a**" qedîno, zafhûmarîye de herfa "**-y**" êna pêy. Na form kî wayîrê di halan (halon) o.

**a.** Tayê kêlîmêy, eke benê zafhûmarî, herfa pêyêne (**-a**) vurrîna, bena "**-ê**" û naye ra dime kî herfa "**-y**" êna pêy.

Mîsal:
**zuhûmar:** balîşna, çêna, makîna (makna), dayra, manga, zurna, sira, sova
**zafhûmar:** balîşnêy*, çênêy, makînêy (maknêy), dayrêy, mangêy, zurnêy, sirêy, sovêy

**b.** Tayê kêlîmêy eke bî zafhûmarî, herfa "**-a**" ya ke pêy der a, nêvurîna, hurêndîya xo de manena, "**-y**" yêna pêy.

Mîsal:
**zuhûmar:** bira, ga, la, zama, qîza, kewra, hêga, çêwa
**zafhûmar:** biray *, gay, lay, zamay, qîzay, kewray, hêgay, çêway

*Esasê xo de herfa "**-î**" yêna pêyê zafhûmaronê na grube kî. Çi esto ke "-**a**" ra dime vatena "**-î**" zore wa, uzay ra gore kî qesêykerdiş de ci ra gina war ro.
*Taye kêlîmê ke fekê Sêwrege de na grûbe de ca cênê, fekê Dersîmî de*



www.arsivakurdi.org

*vurrînê, kunê grûbeda bîne. Mîsal: Fêkê Sêwrege de zuhûmar* **"ma"** û **"wa"**, *fekê Dêrsîmî de* **"maye"** *û* **"waye"** *yê. Zafhûmar kî hurdemêna fekan de zê zuvinî yo:* **"may"** û **"way"**.

**c.** Kêlîmê ke mayik ê û ebe herfanê"-ye" qedîne, wazto ke bî zafhûmarî "-e" ginena war ro, "-y" manena.

Mîsal:
**zuhûmar:** soye*, vaye, waye
**zafhûmar:** soy, vay, way

**Çiqaşî ke vatene de bêlû nêbene kî, fikrê mi ra gore "î" pêyê na çekuyan de kî esto. Tayê nuştoxî na kêlîman ebe şeklê* **soe, wae, vae** *nusnenê, fikrê mi ra gore na form rast nîyo.*

5. Kêlîmê ke zuhûmar de ebe herfanê vokalan "-o", "-u", "-û" qedînê, waxto ke bî zuhûmarî herfa "-y" êna pêy.

Mîsal:
**zuhûmar**: ko, do, çu, tû
**zafhûmar**: koy, doy, çuy, tûy

## SIFETAN DE ZAFHÛMARÎ

Waxto ke sifetî, wesfanê çîyanê zafhûmaran îfade kenê, sufîksê zafhûmarî cênê (gênê).

Mîsal:
**zuhûmar:** saya (soya) sure*, kutiko har, nana (nona) germe, doyo tirş (dowo tirs), kardîya tuze, murîya reze, dermano tal (tol)
**zafhûmar:** sayê (soyê) surî, kutikê harî, nanê (nonê) germî, kardîyê tuzî (tujî), murîyê rêzî (rêjî), dermanê talî (tolî)

**Tayê cawanê Dêrsîmî de kelîme hurêndîya "-e" de ebe "-i" qedîna. Mîsal: saya (soya) suri, nana germi.*

## FÎÎLAN SER O TESÎRÊ ZAFHÛMARÎ

a. 1. Fîîlê întransîtîfî
Na fîîlan de eke faîl (kerdox) zafhûmar bo, demo nikayên û demo amayox

de şexsê zuyine zafhûmarî de fîîl ebe "**-me**" qedîno, şexsê didîne û hîreyîne de ebe "**-nê**" qedîno.

**Demo nikayên***:

Mîsal:
**zafhûmar, şexsê zuyine**
**Ma** ême (**yême**)**.
**Ma** huyî**me**.
**Ma** gureye**me**.
**Ma** xebetî**me**.

**zafhûmar, şexsê didîne**
**Şima/sima** sonê çê (kêye)?
**Şîlane** ve **Serdarî** ra huyînê***.

**zafhûmar, şexsê hîreyîne**
**Ê** verê çêverî de kay kenê.
**Domanî** sonê mektev.

*Fekê Dêrsîmî de na form seva piya ro demo nikayên ve demo ameyoxî. Seva malumatê zêdey nîyade Çîra, hûmar: 2, pelge: 108-110.

**Na form ebe na şêkil kî vajîno:
Ma **wo** (**yo**) yême,
Şîlane ve Serdarî ra **yê** huyînê.
Na form seva **demê ameyoxî** nêvajîno.

***Na form ebe na şekîl kî vajîno:
Şîlan **û** Serdar huyînê. (Na form seva demê ameyoxî kî vajîno.).
*Şîlan û Serdar yê huyînê. (Na form kî seva demê ameyoxî nêvajîno.)*

a. 2. Demo ravêrde:

Fîîlanê întransîtîfan de eke faîl zafhûmar bo:
**1.** Şexsê zuyin ê zafhûmarî de, eke fîîl herfa vengine (vokal) ra biqedîyo, fîîl ebe "**-me**" qedîno.

Mîsal:
**Ma** şî**me***.
**Ma** amey**me**.

**Ma** cêrayme ra.

*Taya cawanê Dêrsîmî de hurêndîya "**-me**" de "**-mi**" yêna pêy:
**Ma** şî**mi**.
**Ma** amey**mi**.
*Ma cêraymi ra*.

**2.** Eke koka fîîlî ebe herfa vokale biqedîyone, şexsê didîne û hîreyîne de kî fîîl ebe "**-y**" qedîno.

Mîsal:

**zafhûmar, şexsê didîne**
**Şima** a saate de amêy.

**zafhûmar, şexsê hîreyîne**
**Înan** kitavî hêrnay.
**Şîlane ve Serdarî** ra huyîyay.

**3.** Fîîlê ke koka xo herfa bêvenge (konsonant) ra qedînê, "**-î**" cênê.

Mîsal:

**Ma** sayî werdî.
**Şima (sima)** gayî berdî.
**Înan (îne/yîne/înû)** kitavî guretî.
**Ma** zarancî pêguretî.
**înan** kincî şutî (sutî).

**b. Fîîlê transîtîfî**

**Demo nikayên:**

Demo nikayên o fîîlanê transîtîfan de eke faîl zafhûmar bo, fîîlo transîtîfo ke attrîbut o kî beno zafhûmar. Şexsê zuyin ê zafhûmarî de fîîl ebe "**-me**", şexsê didîne û hîreyîne de ebe "**-nê**" qedîno.

zafhûmar, şexsê zuyine



www.arsivakurdi.org

**Ma** astorî awe da**me**.
**Ma** dersa xo waneme.

**zafhûmar, şexsê didîne***
**Şima (sima)** çay şimenê.

**zafhûmar, şexsê hîreyîne***
**Yê** (ê) pelganê kîtavî dêmdanê.
**Gule** ve **Bedranî** ra nan wenê.
**Berna** ve **Serkanî** ra azne kenê.

*Na form ebe na şeklanê cêrênû kî yêno îfadekerdene:
**Şima yê** çay şimenê.
**Yê** (ê/î) yê pelganê kitavî dêmdanê.
**Gule** ve **Bedranî** ra yê nan wenê.
**Gule** û **Bedran** nan wenê.
**Berna** ve **Serkanî** ra **yê** azne kenê.
*Berna û Serkan azne kenê.*

Demo ravêrde:

Demo ravêrde yo fîîlanê transîtîfan de, zafhûmarêna fîîlî gîrêdayîyê faîlî nîya. Yanê faîl zuhûmar ya kî zafhûmar bo ferq nêkeno. Hurêndîya nêy de, fîîl objeyî ra gore beno zafhûmar.

Waxto ke obje bî zafhûmar, fîîl sufîksê zafhûmarênî "-î" cêno. Fîîlo transîtîfo attrîbuto ke herfa bêvenge (konsonant) ra qedîno, o kî têpîya "-î" cêno. Fîîlo ke herfa vengine (vokal) ra qedîno, "-y" êna pêy dêy (êy) kî.

Mîsal:

obje zuhûmar
Mi **hemgê** werd.
Mi **saye** werde.
Ma **astor** awe da (aw da).
Ma **mayîne** awe dê (aw dê).
Şima **hêga** ramit.
Cenderman **çê** vêsna.
Cenderman **dewe** vêsnê.

obje zafhûmar
Ma **murî** werdî.



www.arsivakurdi.org

Ma **astorî** awe dayî (aw dayî).
Ma **mayînî** awe dayî.
Şima **hêgay** ramitî.
Înan (îne/înû) **tûyî** werdî.
Cenderman **çêy** vêsnayî.
Cendirman **dewî** vêsnayî.

www.arsivakurdi.org

# Kirdkî (fêk Cebaxçor û Palî )
# di nêrî û maykî

**Seyîdxan Kurij**

Ez bi xwi zûnzonaye niya. Ez heta êr zûn ser nixebitîyaya. Ez çend sêrr o miyûn gel ra sonikûn, dêrûn (kilamûn) û vatûnê verînûn dûna arye û nusena. Mi hûmara Çira ya yewini di pê nûmê ”Dimilkî di Nerî û Makî” yew nuştê Haydar Diljen wend. Cuwa pê hûnc Çira di, ’eynî tema seri yew nuştê Mûnzûr Çem vêciya. Haydar Diljen fêk Sêwrek ser, Mûnzûr Çem fêk Dêrsim ser vindertibî. Ez wazena îta di fêk Cebaxçur û Palî di tema nêrî û maykî ser vindirî. Semedo ki ferqî bînatê inî fekûn biyerî werte, ez wazena ’eynî mîsalûn ser vindirî.

**1.** Sifetî, guerê (gorê) nameyê ki wesfê ci danê sufîksê nerî nûni zi maykî gênî. Mîsal:

Nêrî: cewo giriyaye, goliko sûr, kebero girote, nûno teze, xelewo resaye.
Maykî: owka giriyayî, golika sûri, penciraya giroti, saya sûri, mêsîna girdi.

**2.** Maykî û nêrîya çiyûn nûn guerê aîdîyetî (genitif) nûn zî guerê tewsîfbiyayişî (sifetgirotişî) beli bena. Mîsal:

Nêrî: hêr mi, astuwar mi, golik mi; hero sîya, astuwaro sipîye.
Maykî: mayinê mi, golikê mi, qelemê mi, herê mi; mayina sûri.

Îta aysiyenû ki kelîmê maykî, miyanê cumla di hêna zaf ”-ê”, û ”-a” gênî pênî xwi, la nêrî hêna zaf ”-o” gênî.



www.arsivakurdi.org

## SIFETÊ ÎŞARETKERDIŞÎ

**Yewhûmar (singulier) û nêrî**: owi (semêd çîdê dûrî), ini (semêd çîdê nizdî)
Owi lajek birarzayê min o.
Ini cinawir har û.

**Yewhûmar û maykî**: aya (semêd çîdê dûrî), ina (semêd çîdê nizdî)
Aya kênek dedkeynay min a.
Ina kênek rind a.

**Zafhûmar (pluriel)**: ayî (semêd çîdê dûrî), inî (semêd çîdê nizdî)
Ayî* xuert zaf jêhat î.
Inî kutik har î.

* "Ayî" ray-ray semêd yewhûmarê nêrî zi yenû vatiş. Mîsal:
Ayî hêrî girê di.
Ayî xîyari bidi mi.

## FÎÎLÊ BÎYAYÎŞI (ESTBÎYAYÎŞI)

**a.** Faîlê cumla yewhûmar û maykî bû, şexsê hîrini di fîîlê bîyayîşi (estbîyayîşi) zi benû "**a**".
**b.** Faîlê cumla yewhûmar û nêrî bû, şexsê hîrini di fîîlê bîyayîşi (estbîyayîşi) benû "**û**".
**c.** Faîlê cumla zafhûmar bû, fîîlê bîyayîşi (estbîyayîşi) benû "**î**" yan zî "**yî**".

Mîsal:
Qelemê mi sûr **a**.
Pirnikê mi gird **a**.

Deftêr mi sûr **û**.
Gijik mi kej **û**.

Yi niweş **î**.
Çim mi siya **yî**.
Engişt mi barî **yî**.

**d.** Faîlê cumla yewhûmar û nêrî bû, şexsê didini di fîîlê bîyayîşi (estbîyayîşi) benû "**î**":
Ti niweş **î**.



www.arsivakurdi.org

Ti jêhat **î.**
Ti esmer **î.**

**e.** Faîlê cumla yewhûmar û maykî bû, şexsê didini di fîîlê bîyayîşi (estbîyayîşi) benû **"a"**:
Ti jêhat **a.**
Ti esmer **a.**

Çend mîsalî bînî:
Ez niweş **a.**
Ti niweş **î.**
Wi niweş **û.**
Ya niweş **a.**

Ma niweş **î.**
Şima niweş **î.**
Yi niwêş **î.**

## ZAMÎR ŞEXSÎ

**Grûba I:**
ez
ti
wi
ya

ma
şima
yi

Misal:
Wi vizêr ame kê ma. (faîlo nêrî)
Wi ders dûnû mi. (faîlo nêrî)
Ya vizêr amê kê ma. (faîla maykî)
Ya ders dûna mi. (faîla maykî)

**Grûba II**
mi
tû



www.arsivakurdi.org

yi
yay

ma
şima
yin

Misal:
**Yi** mi ri say ardî. (faîlo nêrî)
**Yay** mi ri say ardî. (faîla maykî)
Ez **yi** ra zaf hes kena. (objewo nêrî)
Ez **yay** ra zaf hes kena. (objeya maykî)

## FÎÎLÛN SER O TÊSÎR NÊRÎ Û MAYKÎ

A. Fîîlê întransîtîfî

DEMO INKÊYIN

**a.** Faîl nêrî bû, faîlî ra pey "**ho**" yenû û fîîl bi herfanê "**-nû**" qêdiyenû. Mîsal:
Alan **ho** yenn**û**.
Alan **ho** şin**û**.
Alan **ho** rakwen**û**.
Alan **ho** wirzen**û**.
Alan **ho** wiyen**û**.
Alan **ho** remen**û**.

**b.** Faîl makî bû, faîli ra pey "**ha**" yenû û fîîl bi herfanê "**-na**" qêdiyenû. Mîsal:
Serfîraz **ha** yen**a**.
Serfîraz **ha** şin**a**.
Serfîraz **ha** rakwen**a**.
Serfîraz **ha** wirzen**a**.
Serfîraz **ha** wiyen**a**.
Serfîraz **ha** remen**a**.

**c.** Faîl zafhûmar bû, faîlî ra pey "**hê**" yenû û fîîl bi herfanê "**-nî**" qêdiyenû. Mîsal:
Alan û Serfîraz **hê** yên**î**.



www.arsivakurdi.org

Alan û Serfîraz **hê** şinî.
Alan û Serfîraz **hê** rakwênî.
Alan û Serfîraz **hê** wirzênî.
Alan û Serfîraz **hê** wiyênî.
Alan û Serfîraz **hê** remênî.

DEMO VÎYERTE

Faîl nêrî
Alan ame.
Alan şi.
Alan rakot.
Alan berma.
Alan rerma.

Faîl makî
Şêrfa amê.
Şêrfa şî.
Şêrfa rakot.
Şêrfa bermay.
Şêrfa remay.

Faîl zafhûmar
Alan û Şêrfa amê.
Alan û Şêrfa şîy.
Alan û Şêrfa rakotî.
Alan û Şêrfa bermayî.
Alan û Şêrfa remayî.

A. Fîîlê transîtîfî

DEMO INKÊYIN
Demo înkeyin di nêrî û makîya objeyûn fîîlûn transîtîfûn ser tesîr nêkena.

Eger obje nêrî bû:
Ez **ha** goştî wena.
Ez **ha** goştî kena wirdi.
Ez **ha** goştî erzena.
Ez **ha** goştî kena lete.
Ez **ha** goştî cawena.



www.arsivakurdi.org

Eger obje makî bû:
Ez **ha** engûri wena.
Ez **ha** engûri pilixnena.
Ez **ha** engûri erzena.
Ez **ha** engûri kena lete.
Ez **ha** engûri cawena.

Eger obje zafhûmar bû:
Ez **ha** henarûn wena.
Ez **ha** henarûn pilixnena.
Ez **ha** henarûn erzena.
Ez **ha** henarûn kena lete.
Ez **ha** henarûn cawena.

DEMO VÎYERTE

Eger obje nêrî bû:
Mi goşt werd.
Mi goşt pilixna.
Mi goşt kerd wirdi.
Mi goşt eşt.
Mi goşt cawit.

Eger obje makî bû:
Mi engûri werdi.
Mi engûri pilixnay.
Mi engûru kerdi wirdi.
Mi engûri eşti.
Mi engûri cawiti.

Eger obje zafhûmar bû:
Mi henarî werdî.
Mi henarî pilixnayî.
Mi henarî kerdî wirdi.
Mi henarî eştî.
Mi henarî cawitî.

Fîîlê transîtîfî ki kuêk (kokê) yini pê "-a" qêdîyenû:

**a.** Eger cumla miyûni di obje yewhûmar û nêrî bû, fîîlo transîtîf sufîks nigenû; yûnî herfa "-a" nibediliyena û sê xwi mûnena.
**b.** Eger obje yewhûmar û makî bû, vêng "-a" benû "-y".
**c.** Eger obje zafhûmar bû, fîîlo transîtîf herfûn "-yî" genû.

Fîîlê transîtîfî ki kuêk yini pê herfûnî konsonantûn qêdîyenû:
Mintiqay Cebaxçur û Palî di eger obje zafhûmar bû, fîîl pê "-î" ("-yî") qêdiyenû; la îta di ray-ray kuêk fîîlî zi bediliyenû. Mîsal:
Mi henarî wêrdî.
Mi henarî êştî.

www.arsivakurdi.org

# Hesenê Alikê (*)

**Arêkerdox:**
**Endam Ronas**

De hêêy! Hesenê Alikê
Suwarê Albajaxê şê
Suwar dibe berê xwe dide çîyayê Gawir Daxê

Hecî Bekir serokbazirganê salê
Tê Mehemed Begê dibe mîvanê şevê
Heylo.. Xwedê dizane her tişt tayê xeznê derdixe ji koşê malê
Hesenê Alikê suwarê Albajaxê şê
Tê û dibe mîvanê Zerîdomamê

Zerîdomamê dibê
Heseno Hesenê Alikê
Suwarê hespê Albajaxê şê
Kilê çavê min Zerîdomamê
Lê îro bavê min bûye mîvan, Hecî Bekir serokbazirganê salê
Xwedê dizane şeş tayê xeznê danîye koşa malê
Hesenê Alikê suwarê Albajaxê şê

Şevê nîvê şevê radibe cem Zerîdomamê
Xwedê dizane derdikeve ber derê dîwanê
Her şeş tayê xeznê derdixe li dîwanê
Xwedê dizane çar ta davê li terkê
Du ta dimîne li dewsê
Suwar dibe û berê xwe dide çîyaye Gawir Daxê



www.arsivakurdi.org

Heyyy! De dilê min dibê û didilê
Lo Heseno! Hesenê Alikê
Hecî Bekir Beg serokbazirganê salê
Serê sibê rabû bala xwe da, dizan qeliştine koşa malê
Jê derxistine her şeş tayê
Çar ta birine, du ta hîştine li dewsê
Ew dizane wê çaxê
Dizan qeliştine koşa malê
Destê Zerîdomamê bigre têke mafê
Mafa wê bide ser barê devê
Bikevin ser şop, dirb û rê

Lê min go: Qîza melê tere cem Zerîdomamê
Dibê: Zerîdomamê, dilê min dibê û didilê
Bila nale here esl û astarê jinê
Îro çend e min bihîstîye Hesenê Alikê
Fîrar  kaçxûnê çîyayê Gawir Daxê
Hatîye kuştin, meyitê wî anîye ber camîyê

Lê min go: Zerîdomamê dibê lê lêê
Erê dêlê tu qîza melê
Tu çima dibê wê pirsê
Hesenê Alikê suwarê Albajaxê şê
Fîrar û kaçxûnê çîyayê Gawir Daxê
Îşev li min bû mîvan heta nîvê şevê
Nîvê şevê rabû berê xwe da çîyayê Gawir Daxê

Qîza melê dibê: Zerîdomamê lê lêê
Nale here esl û estarê jinê
Xwedê dizane îro çend e kuştîye suwarê Albajaxê şê
Meyitê wî danîye ber camîyê
Îro bavê min çûye kiriye nimê cenazê li wêderê

Gava dibê vê pirsê
Zerî Domamê destê xwe dike ber piştê
Jê derdixe seeta Hesenê Alikê û tev kostekê
Tu derewan meke qîza melê

Wan ji destê Zerîdomamê
Derdixin seet û tev kostekê
Seeta Hesenê Alikê dibin cem Mehemed Begê



www.arsivakurdi.org

Dibê: Hesenê Alikê suwarê Albajaxê şê
Îşev bûye mîvanê Zerîdomamê

Mehemed Beg radibe li wêderê
Berê xwe didin malê
Mêze dikin xeznê
Dizan şeş ta derxistine ji cîyê
Çar ta birine, du ta hîştine li dewsê

Dilê min dibê û didilê
Hecî Bekir serokbazirganê salê
Destê Zerîdomamê girtîye kiriye mafê
Mafa wê daye ser barê devê
Ji xwe re ketîye ser şop û dirb û rê

Lê min go: Îbo kûpa namûsê
Bala xwe dide bazirganek wa tê li dirbê
Radibe û diçe pêşîyê
Dibê: Kuro ev bazirgana han ya kî ye?
Dibên: Ev bazirgana ya Bekir Begê
Ma ew çi ye we daye ser barê devê?
Dibê: Ew mafa Têlî Eyşê
Dizan qeliştine koşeke malê
Jê derxistine şeş tayê xeznê
Çar ta birine, du ta hîştine li dewsê
Bekir Begê bi destê zorê
Destê wê girtîye kiriye mafê
Mafa wî avêtiye ser barê devê
Ketîye ser şop û dirb û rê

Lê min go: Îbo kûpê namûsê
Derdikeve pêşîya Bekir Begê
Wan dest û pîyê Îbo girêdidin bin zikê devê
Çavê Îbo venabe ji toz û dûmanê

Birayê wî bala xwe dide ku bazirganek wa ye tê
Tere pêşîya wî bazirgana hanê
Xwedê dizane Xelîlo Xelîlê Axê
Li suwar e ... wêderê
Dûrbînê dide berçavê
Mêze dike çîya û deştê



www.arsivakurdi.org

Diçe dibê: Lo Xelîlo Xelîlê Axê
Tu rabe suwarbe, bikeve pêşîya bazirganê hanê
Bazirgana han a Mîrê Romê

Xelîlo Xelîlê Axê
Dibê: Xwengê dilê min dibê û didilê
Tu çima min ra dibêjî vê pirsê
Va bazirgana han a Romê
Ez nikarim vî bazirganî bişêlînim vê dirbê

Dibê: lo Xelîlo Xelîlê Axê
Ezê rabim Qûrmedolî bikşînim ji tewlê
Didim ser piştê zînê Mêrdînê
Suwar bim berê xwe bidim pêşîya bazirgana hanê
Gava gulek were têkeve nava qasinga min hermetê
Ez te ra dibim; bênamûsîya pê mirinê heta wê dinyê

Min go: Xelîlo Xelîlê Axê
Kor û poşman radibe Xûrmedêlîyê dikşîne ji tewlê
Suwar dibe tere pêşîya bazirgana hanê
Ew berê topan didin Xelîlê Axê
Xelîlê Axê giran bîrîndar dibe şunda dizivire tê
Xwenga wî dibê: Xelîlo Xelîlê Axê
Ezê birîna biraye xwe kew kim bi sîr û pîvazê
Sîr û pîvaz dide ser birîna Xelîlê Axê

Birayek ... Albajaxê şê
Bala xwe dide bazirganek wa ye ketîye dirbê
Tere pêşîya bazirgana hanê
Dibê: Lo lo ev bazirgana han a kê ye?
Dibê: Ev bazirgan ya Hecî Bekir Begê

Ma ew çi ye we daye ser barê devê?
Dibê: Ew mafa Zerîdomamê
Dizan qeliştine koşa malê
Jê derxistine şeş tayê xeznê
Çar ta birine du tay hîştine li dewsê
Hecî Bekir serokbazirganê salê
Destê Zerîdomamê girtîye kiriye mafê
Ketîye ser şop û rê û dirbê



www.arsivakurdi.org

Suwar dibe berê xwe dide çîyayê Gawir Daxê
Bala xwe dide Hesenê Alikê
Suwarê Albajaxê şê
Ketîye xewa serê sibê
Linga wî bilind dike dibe ser çokê
Hêdîka dest dibe zendê
Hesenê Alikê suwarê Albajaxê şê
Çavên xwe vedike xeman û xewê
Dibê: Bira te çima berê xwe daye çîyayê Gawir Daxê?

Dibê: Heseno Hesenê Alikê
Dizan qelîştine koşa malê
Jê derxistine şeş tayê xeznê
Çar ta birine, du ta hîştine li dewsê
Hecî Bekir serokbazirganê salê
Destê Zerîdomamê girtîye kirîye mafê
Mafa wê avêtîye ser barê devê
Ji xwe ra ketîye ser şop û rê
Îbo kûpê namûsê
Ew jî girêdaye li zikê devê
Min go: Heseno Hesenê Alikê
Suwarê Albajaxê şê
Fîrar û kaçxûnê dewleta Romê
Radibe Melemediran dikişîne ji tewlê
Hevsara wî dipêçe heta zendê
Suwar dibe li hespê
Gava dikeve deştê
Destê xwe davê dûrbînê
Mêze dike dûmanek rabûye ji deştê
Dûmanê xwe daye serê çi yê, mijê girtîye deştê

Edilê tere cem Xelîlê Axê
Lo bênamûso tu rabe ji erdê
Min mêzekir bi dûrbînê
Dûmanê xwe daye ser çîyê
Deştê girtîye mij û dûmanê
Va ku hebe Hesenê Alikê
Suwarê Albajaxê şê
Fîrar û kaçxûnê çîyayê Gawir Daxê
Malşewitîyo tu here pêşîyê
Gava silav da te, ku neda te

Tu bêje Heseno Hesenê Alikê
Suwarê Albajaxî şê
Sêwîyê ber destê ap û amojê
Tu xwedî bûyî li ser tendûrên xelkê
Çima îro nadî min silava Xwedê
Lê min go: Xelîlo Xelîlê Axê
Pir birîndar e kor û poşman radibe ji erdê
Dikşîne der Xûrmedolî û dikeve deştê
Mêze dike Hesenê Alikê
Suwarê Albajaxê şê jor de tê
Çavên wî venabin ji xeman û xwînê
Silav nade Xelîlê Axê suwarê Xûrme dêlîyê

Xelîlê Axê gazî dike: Lo Heseno Hesenê Alikê
Suwarê Albajaxê şê
Min wa dihesîya tu ketî...
Sêwîyê ber destê ap û amojê
Lawo tu xwedî bûyî li ser tendûrên xelkê
Tu çima nadî min îro silava Xwedê

Lê min go: Heseno Hesenê Alikê
Li ber dizgîna qelişî çaxî çê
Dibê herhal pir birîndar e Xelîlê Axê
Tebata wî tune  ber birînê

Lê min go: Guh nade pirs û gal û gotinên Xelîlê Axê
Dajo pêşîya Hecî Bekir serokbazirganê salê
Wenda dike herb û cengê
Îmkana din nabîne li wêderê
Xelîlê Axê  Hesenê Alikê şûn de tîne wêderê
Bi hevra dibin destbirayê axretê

Wuca de waya dêyî pê hên kena ke, no şoro virnîya Hesenê Alikî û wa Hesen nêyî bikîşo, min xo rê bero. Hesenê Alikî fikirîno ke, Xelîlî duştê dînan de şer kerdo û bîyo birîndar. Na curete ser, jubînî de benê destbira.

Hesenê Alikî zahf azeta Xelîlê Axê keno. Şandi wuca maneno. Şodir rew beno heşar. Xo bi xo  ”Lawo ez teyîna nêşîkîn nêyî bazirganî bişelenîne. Rindîye awa ke, ez şorî wo hetê pirdî û havila xo wuca ci mûsnî“ vano.

Xatir Xelîl ra wazeno û kuwno raye. Îta de waya Xelîlî lame dana wertê çimanê xo ro. Seba ke Hesenê Alikî dest ra vecîya.

Hesenê Alikî beno aspar û şono pird. Wo hetê pirdî de sîlkê astorê xo

kuwno, sare erzeno hewn. Ke Hesenê Alikî sare berzo hewn, hîrê şew û hîrê rojî heşar nêbeno. Ke sare erzeno hewn nêerzeno hewn, bazirgan dot ra vecîno.

De lê lêê dilê min dibê û didilê
Xwedê dizane Îbo kûpê namûsê
Girêdane bin zikê devê
Çavên wî venabin ji toz û dûmanê

Hecî Bekir serokbazirganê salê
Ji xwe re mêze dike bi darê dûrbînê
Mêze dike reşîyek vaye ketîye kêleka pirê
De dibê dilê min dibê û didilê
Reşîyek ketîye kêleka pirê
Xwedê dizane va reşan nayê oxira malê

Zerîdomamê dibê: Lo lo dilê min dibê û didilê
Hela tu min ra bişîne darê dûrbînê
Zerîdomamê dibe berçav dara dûrbînê
Dibê dilê min dibê û didilê
Hecî Bekir serokbazirganê salê
Va ku heye Hesenê Alikê
Suwarê Albajaxê şê
Fîrar û qaçxûnê dewleta Romê
Kilê çavê min Zerîdomamê

Gava ku Zerîdomam dibe vê pirsê
Hecî Bekir serokbazirganê salê
Tere bîst û penc eskerê Romê para tîne wêderê
Wan dajo li rê û dirbê

Lê min go: Îbo kûpa namûsê
Dibê: Zerîdomamê
Dilê min dibê û didilê
Hela tu bide darê dûrbînê
Ez bawer im ku Heso ketîye xewê
Xwedê dizane xewa mirinê
Ranabe ji wêderê

Ew dikevin nêzika pirê
Dibe qêre qêra Zerîdomamê

Deng naçe Hesenê Alikê
Hîşyar nabe ji xewa şîrînê

Dibe: Lawo Îbo, dilê min dibê û didilê
Va bênamûsa ketîye xewa mirinê
Ezê qese û qirar bidim zatê xwedê
Ezê xeberê bidim Hecî Bekir Begê
Bila serê wî jêke bavêje wêderê
Bila min xwe re bibe bike bermalîya malê

Lê min go: Îbo kûpa namûsê
Dibê: Zerîdomamê
Ez ketime bextê te û Xwedê
Tu bike hewar û qêrê
Bila Heso hîşyar be ji xewê

Eskerê Romê diqedîne du lengerê pirê
Wêderê dimîne heşt lengerê pirê
Dibe qêre qêra Zerîdomamê
Hesenê Alikê hişyar nabe ji xewê
Qereşîltax sîlke radike ji erdê
Dev davêje pîşta Hesenê Alikê
Radike sê caran dixe li erdê
Heso çavên xwe vedike ji xewê
Jê dikşîne şûrê qetlê
Dikeve pêşîya eskerê Romê
Bîst û pêncan dikuje davêje dora pirê
Min go: Hesenê Alikê
Suwarê Albajaxî şê
Bîst û pênc eskerê Romê
Qirim dike davêje dora avê
Çadiran dikute kêleka pirê
Ew û eskerê Hecî Bekir Begê
Hev re dikevin şer û qewxê

Hesenê Alikê
Suwarê Albajaxê şê
Fîrar û qaçxûnê çîyayê Gawir Daxê
Waxtê wî tê ser waxtê
Peya dibe ber çadira Zerîdomamê
Dibê: Zerîdomamê

www.arsivakurdi.org

Dilê mîn dibê û didilê
Çend roje ku tu Hecî Bekir ra ketî rê
Gava ku tu jin î ez nakujim mêrê hanê
Min cara mêrek han nedîye li vêderê

Dibê: Lo Heseno Hesenê Alikê
Suwarê hespê Albajaxê şê
Fîrar û qaçxûnê çîyaye Gawir Daxê
Kilê çavên min Zerîdomamê
Ger tu ji min nepirsî vê pirsê
Hecî Bekir serokê bazirganê salê
Darê zorê ez kirime mafê
Mafa min avêtîye ser barê devê
Min kiriye destê xwe kêra frîngê
Danîye kêleka xwe şûşa jariyê
Hîna kes nehatîye cem min rebenê
Wele ez qîzim qîza mala bavê

De min go: Heseno Hesenê Alikê
Fîrar û qaçxûnê eskerê Romê
Serê sibê radibe dikeve meydanê
Serê Hecî Bekir jêdike bi şûra qetlê

Zerîdomamê dibê: Hesenê Alikê
Ez ketime ber bextê te û Xwedê
Tu bazirgan vegerîne em herin malê
Min bihîstîye Erebek peyda bûye vê deştê
Wî Erebî anîye koka mêrê xelkê

Ke Zerîdomame nîya vana, na qesa daye ginena re Hesenê Alikî. Cêreno re Zerîdomame vano: "Wo ke to na qesa min ra vata, ma nêşome." Çadire de manenê. Şodir tîjî erzena nêerzena, Ereb yênan de vecîno.

Ereb "Lawo Hesenê Alikî, min ti asmên ra waştê, heqî ti hard de da min" vano. Hesenê Alikî ke na vatena dêyî çarneno re cî. Nêyî hurdmêna wuca kuwnê meydan. Hîrê şew û hîrê rojî jubîn anê, benê. Jubînî bin nêkenê.

Ereb, Hesenê Alikî ra "Rûyê nêyî heywanan min û to nêdo ke, man kî bicême. Pîya be ma bi dest vazdîme jubîn" vano. Hesenê Alikî vano hay hay.

Ke hurdmêna erzîne jubînî, Ereb Hesenê Alikî keno berz, binê xo de nano ro û zanî keno qevsingê dêyî. Wuca de hêsîrî çimanê Hesenê Alikî ra vazdanê.

Ereb "Lawo Hesenê Alikî, to vatê ez mêrdeyê de nîya nîya hewl a, mêrdeyî



www.arsivakurdi.org

min ser ra çînê. Çimanê to ra çito hêsîran vazd da. Ma na mêrdetîya to kotî ra?" vano.

Hesenê Alikî: "Ez nêkewta mêrdên ver. Emser çand serrîyo ke ez fîrar a. Miradê de min mendo. Wo kî, ez şewê virara Zerîdomama xo de mirdî ranêkewta," vano.

Na vatene ser Ereb "Hayde hayde ez to ewro verdan ra. Şo miradê xo şa bibe. Sodir bê, bi no qeyde rameredîye. Ez sarê to dan piro" vano. Hesenê Alikî qewlê Erebî qebûl keno.

Hesenê Alikî wurzeno ra û şono çadire. Qewlê Erebî çimanê dêyî ver de êno şono. Hewn bi çiman nêkuwno. Zerîdomame nîyadana ke, Hesenê Alikî ranêkuwno. Cêrena re dêyî: "Çêvêşaye, sebî to rê. Ma qe hevalê de to çîno?" vana.

Hesenê Alikî "Kesê de min çîno. Destbirayê de min, Xelîlê Axê esto. Wo kî kotî ra reseno min. Heta bêro, Ereb kî sarê min dano piro" vano.

Zerîdomame "Meterse Hesenê Alikî. Heta şodir heq comerd o" vana.

Zerîdomame dîyax nêkena. Her sahate şona verê çadire, êna zerê çadire. Endî beno şodir. Na erzena Hesenê Alikî ser:

De lo lo Heseno Hesenê Alikê
Suwarê Albajaxê şê
Fîrar û qaçxûnê çîyayê Gawir Daxê
Mal şewîtîyo tu rabe ji xewê
Tu bide darê dûrbînê
Dûmanek rabûye ji deştê
Dûman xwe daye ser çiyê
Mijê ketîye deştê
Suwarek vaye jor da tê
Tu bide min darê dûrbînê
Salixê vî suwarî hilinîm wêderê

Heseno Hesenê Alikê
Fîrar û qaçxûnê Romê
Suwarê Albajaxê şê
Radibe digire darê dûrbînê

Dibê: Lê lê Zerîdomamê
Dilê min dibê û didilê
Ev kesê han Xelîlê Axê
Suwarê Xûrme dêlîyê
Hawara birayê xweda tê

www.arsivakurdi.org

Xelîlê Axê peya dibe ber çadirê
Mêze dike rengê Heso yê mirinê
Gava Zerîdomamê jê re dibê vê pirsê
Dibê: Xwîşke tu min ra bîne taştîya sibê

Xelîlê Axê nîşeno ro û arahîya xo keno. Arahîye ra dime, teselîye dano dînan.

"Hesenê Alikî, heta ez nêrîne kîştene, ti nêna kîştene" vano.

Nê nîyadane ke Ereb cêr de vecîya. Xelîlê Axê şono vernîye û:

-Ti çimanên min ser ama Ereb. Hesenê Alikî destbiraye min o. Wo kiştê tu yo. Dora min û tu ya. Ma erzîmere jubînî, ya ti kiştê min a, yan ez ê tu ya, vano.

Ereb dust vêjîno û nîya vano:

-Ez Hesenê Alikî kişen hona dore ê tu ya. Ez nêçîrê xo nêverdan ra.

Naye ser jubînî xêlê anê benê. Ereb vatena Xelîlê Axê qebûl keno. Nêyî wuca kuwnê şer. Waxt êno waxtî ser, kes kesî bin nêkeno. Astorê binê dînan qefelînê. Astoran ra benê pîya. Ke dest erzenê jubînî, Xelîlê Axê Erebî keno berz dano binê xo ro, şimşêr keno qirike û vano:

-Ereb, ez to ken azad, ti kî Hesenê Alikî azad bike.

Ereb nayeki qebûl nêkeno û vano:

-Ez nêçîrê xo bê kiştene nêvirdan ra. Ez êyî kişen, aye ra dime, ti min bikîşe.

Naye ser Xelîl û Erebî şopêna erzînê re jubînî. Xelîl êyî şopêna keno berz û dano binê xo ro. Azad kerdena Hesenê Alikî woncîya ci ra vano. Ereb woncî qebûl nêkeno. Ke şopêna kî keno berz dano binê xo ro, Zerîdomame cayê xo de qêrena:

-Ma ti êndî çira vindeta, Xelîlê Axê. Ke Erebî vilê Hesenê Alikî da piro, ti ê dêyî piro dê çinayî rê beno. Simşêr berze re vile û sarê dêyî ci ra biperne.

Na vatena Zerîdomame ser, Xelîlê Axê dano piro, sarê Erebî cira keno.

Ayera dime, Hesenê Alikî, Zerîdomame û bazirganî cêno şono. Veyvê Hesenê Alikî û Zerîdomame beno. Hal û hewalê dînan newe beno rind, eşq û kêfê xo ramenê.

(*) Min na kılame kaset ra nıvisnê. Vatox, qeza Gımgım ra, dewa Hemûge ra Hesenê Wulaşan o.
(...) nêyî cayî nîyamayî fahm kerdene.



www.arsivakurdi.org

## Kovareke nû bi zimanê Bûlgarî

# ”Kurdisko Slovo”




**Lewend Firat**

Kovara ”Kurdisko Slovo” (Gotina yan jî ’Peyva’ Kurdî) kovara Klûba Kulturî ya Kurdan e. (Xwendevan û rewşenbîrên Kurd ku li Bûlgaristanê bi cih bûne vê klûbê vekirine) Hejmara 1’ê di Nîsan 1996’an de derketiye, kovar 40 rûpel e û bi reng e. Redaktorê berpirsiyar Jar Silav e.

Di kovarê de nahê diyarkirin dê kovar perîyodîk be yan na, lê tenê tê nivîsandin ku; ”Berdewamiya kovarê dê girêdayê enteresa xwendevanên wê be”.

Kovar wek kovareke gelemperî çandî, edebî û siyasî ye, lê nivîsên wê piraniya wan wergêr in û berê di kovarên Kurdan de hatine çapkirin.

Bi îmzaya redaktorê berpirsiyar nivîsarek bi navê ”Azadiya gotinê û tolerans” heye. Nivîskar li ser azadî û toleransê disekine û di nav Kurdan de hewcedariya hevduguhdarkirinê û toleransê tîne zimên.

Nivîsa Yaşar Kemal ku di kovara Almanî ya ”Der Spiegel” de derketibû û di derheqê wî de dawa hatibû vekirin di kovarê de bi navê wê yê orjînal ”Sefera Derewan” hatiye wergerandin. Ji bilî vê nivîsê parçeyek ji romana wî ya ”Efsaneya Çiyayê Agrîyê” jî di kovarê de çap bûye.

Bi munasebeta 300 saliya nivîsandina ”Mem û Zîn”ê du nivîs di kovarê de hene. Nivîsa yekem parçayek ji Mem û Zînê ye, ya duyem jî bi navê ”Wesiyeta Ahmedê Xanî” bi îmzeya Cemşîd Kurdo hatiye nivîsandin.

Efsaneya Zembilfiroş û parçayek ji Şerefnameya Şerefxanê Bedlîsî ku ji pêşgotina Şerefnameyê hatiye girtin û di derheqê Newrozê de ye, herdu jî bi risim hatine çapkirin.

Lêkolîna sosyolojîk ku bi navê ”Rapora TOBB”ê ji aliyê Prof. Dogu Ergîl ve hatibû amedekirin, bi sernivîsa ”Kurd çi difikirin” di ”Kurdisko Slovo” de cih digre.

www.arsivakurd.org

Hevpeyvîna ku bi Nalîn Baksî re, bi navê ”Parlamentera parlamentoya Swêdê ku ji dilê Kurdistanê hatiye” ji rojnameya Ronahîyê hatiye girtin. Nivîsek li ser Leyla Zana bi navê ”Îcar Nelson Mandeleyê Kurd jinek e”, li ser hilbijartina Tirkiyeyê, beyana Klûba Kulturî ya Kurdan ku bi munasebeta Newrozê hatiye belavkirin û bi navê”Komantera me” nivîsek analîzî li ser pirsa Kurdî wek nivîsên siyasî di kovarê de cih digrin.

Nameya Ubeydullah Nehrî ku ji misyonerê Amerîkî Kohran re şandiye di nav rûpelên kovarê de cig digre. Name ji ”Correspondence respecting the Kurdish invasion of Persia. Turkey. No: 5, 1881, p. 47-47 hatiye wergirtin.

Nivîsek bi îmzeya Zuhdî el Dahûdî ku ji romana Karl May hatiye stendin û li ser dar û daristanê Kurdistanê rawestiye, bi navê ”Siya Cennetê” di kovarê de hatiye weşandin.

Bi Mûsa Anter re bi sernavê ”Nivîsandina Min” reportajek hatiye amadekirin. Lê ev reportaj ji kuderê hatiye girtin ne diyar e, tenê tarîxa vê reportajê (12.01.1991) di bin de tê nivîsandin.

Nivîsa Fewzî Bedirxan ”Di riya Cenewrê de” ku ji kovara ”Kurdistan” (hejmar 18, 1899) hatiye stendin û nivîs û şiîrek Kemal Fewzî ku ji kovara ”Jîn”ê (hejmar 3, 25 Sibatê 1919) hatiye wergirtin di nav rûpelên kovarê de cih distînin. Fewzî Bedirxan di çûyîna xwe ya Cenewrê de ku riya wî bi Bûlgaristanê jî ketiye întîbayên xwe yên li ser Bûlgaristanê dinivisîne, dîsa şiîra Kemal Fewzî bi şiîreke şaîrê neteweyî yê Bûlgar Xrîsto Botev re tête muqayesekirin ku şiîra Botev jî di kovarê de hatiye çapkirin. Ev herdu şiîr jî li ser azadiyê ne. Li gorî van herdu şaîran kesên ku di riya azadiyê de bimrin, ew namir in.

Rûpelên kovarê bi du şiîrên Rojen Barnas; ”Nuha li welatê min destpêka biharê ye” û ”Min navê xwe kola li burcên Diyarbekir”, bi şiîreke Kemal Burkay ”Benda min be”, bi sê şiîrên Rosen Angelov (yekî Bûlgar e û dostê Kurdan e); ”Ew, Kurdistan û Azadî”, ”Kelepçeyên Kurdistanê” û Biyanî” û şiîreke Pîremerd ku li ser Newrozê nivîsandiye û navê şiîra wî jî ”Newroz” ê hatine xemilandin.

Bi tevayî kovara ”Kurdisko Slovo” di derheqê kultur, edebiyat û rewşa siyasî ya Kurdan de zaniyariyek û agahdariyek dide raya giştî ya Bûlgaran û herweha agahdarî dide ew Kurdên Kurdistana Sûriyeyê û Iraqê ku li Bûlgaristanê dixwînin yan jî zanîngeh xelas kirine û li wir bi cih bûne.

## Cîhana Pirtûkan

### Amadekar:
### Rohat Alakom

**Hecîyê Cindî**
***Hikayatên Civata Kurdan***
**Weşanxana Apec, 111 Rûpel, Stockholm, 1996**

Di vê pirtûkê de qasî 24 çîrokên Kurdî cîh girtine, hemû çîrok ji alîyê Hecîyê Cindî de hatine berev kirin. Pirtûk di sala 1959'an de li Erîvanê bi tîpên kirîlî hatîye weşandin. Ev çapa nû ji alîyê Şefîk Kaya ji tîpên kirîlî hatîye transkrîbe kirin. Ji bo vê çapa nû Prof. Şekroyê Xudo pêşgotinek nivîsîye. Pirtûk bi çend wêneyan ve hatîye xemilandin.

**Firat Cewerî**
***Kultur, Huner û Edebîyat***
**Weşanxana Nûdem, 423 rûpel, Stockholm, 1996**

Di pirtûkê de nivîsên Firat Cewerî û çend hevpeyvînên ku nivîskar bi kesên mayîn re çêkirine, cîh girtine. Piranîya van nivîs û hevpeyvînan berê di kivara Nûdem û çend organên Kurdî yên din de hatine weşandin.

**Lokman Polat**
***Hawar û Qêrîn***
**Weşanxana Çanda Nûjen, 84 rûpel, Stockholm, 1996**

Ev pirtûka ji du beşan pêk tê: Beşê pêşîn li ser şerê Kurdan yê hundirîn hatîye nivîsîn û bi tehrekî dîyalogî pêk hatîye. Di beşê duwemîn de çend

nivîsên ku berê di kovar û rojnameyên Kurdî de weşîyane, cîh girtine.

**Sîma Semend**
***Xezal***
**Weşanxana Nûdem, 71 rûpel, Stockholm, 1996**

Ev pirtûka Sîma Semend- yek ji nivîskarên Kurdên Ermenîstanê ye - di sala 1961'an de li Erîvanê hatîye weşandin. Ev çapa nû Şefîk Kaya ji tîpên kirîlî guhastîye tîpên latînî. Pirtûk ji sê kurteçîrokên nivîskar pêk tê.

**Ilhami Yazgan**
***Eski Kürt Öyküleri* (Çîrokên Kurdî yên Kevn)**
**Weşanxana Mezopotamya, 125 rûpel, Köln, 1996**

Îlhamî Yazgan ev çend sal e li ser çavkanîyên Elmanî kar dike û derheqa babeta Kurdan de materîyalên nivîskî û wêneyî berev dike. Ev pirtûk, beşekî vê xebata wî pêk tîne. Îlhamî Yazgan hin çîrokên Kurdî ku berî sedsalan ji alîyê biyanîyan de hatine berev kirin û bi Almanî çap bûne, vê carê wergerandîye zimanê Tirkî. Di nav rûpelên pirtûkê de wusan jî çend wêne û îllustrasîyonên kevn hene.

**Cemşid Bender**
***Korku ve Cesaret* (Tirs û Cesaret)**
**Weşanxana Berfîn, 229 rûpel, Îstenbol, 1996**

Cemşîd Bender di vê pirtûkê de bersîva Gurdal Aksoy û çend kesên mayın dide û li dijî têzên wan yên dîrokî derdikeve. Gurdal Aksoy, çawa tê zanîn berî demekê bi navê *Tarihi Yazılamayan Halk: Kürtler* (Gelê ku Dîroka wî Nehatîye Nivîsîn : Kurd) pirtûkeke weşandibû û Cemşîd Bender rexne kiribû.



www.arsivakurdi.org

# Semînerek li ser Zazakî

Ji aliyê Komeleya Nivîskarên Kurd li Swêdê di roja 15'ê Hezîrana 1996'an de li Stockholmê li Medborgarhusetê semînerek li ser Zazakî (Dimlî, Kirdkî, Kirmanckî) hat amadekirin. Semîner ji aliyê Malmîsanij hat dayin.

Malmîsanij bi dûr û dirêj li ser hin qaîdeyên lehçeyê rawestiya û bi minakên cuda cuda xwest ku hin taybetiyên vê lehçeyê destnîşan bike.

Malmîsanij hin guherandinên ku di Zazakî de çêbûne anî ziman. Herweha hin kelîmeyên Kurmancî û Zazakî dan ber hev û li ser guherandina hin herfan mînak dan.

Di merheleya duyem a semînerê de guhdaran derbarê agahdariyan de hin pirs pirsîn û nêrînên xwe gotin.

---

# Ji Weqfa Lêkolîn û Çanda Kurdî re nameya pîrozkirinê

*Weqfa Lêkolîn û Çanda Kurdî, di roja 1'ê Hezîrana 1996'an de kongreya xwe ya yekem li Stenbolê çêkir. Bi vê munasebetê Serokê Komeleya Nivîskarên Kurd li Swêdê, Malmîsanij ji bo pîrozkirinê, nameya jêrîn ji vê weqfê re şand:*

"Ji Serokê Weqfa Lêkolîn û Çanda Kurdî re

Ji bo agahdarkirin û dawetkirina we ez spas dikim, lê çi heyf e ku ez dê nikaribim beşdarî kongreya we bibim.

Bi xebera vebûna Weqfa Lêkolîn û Çanda Kurdî ez şad bûm û bi xebatên wê-di warê lêkolîn û çanda Kurdî de- ez dê zêdetir şad bibim.

Hêviya min ew e ku kongreya we bi awakî serkewtî çêbibe û bibe destpêka karên din, weqfa we jî bibe bingeheke çalakiyên çandî."



www.arsivakurdi.org

# Gelas om våren

## och andra berättelser från Kurdistan

Gelas bor i en liten by i Kurdistan. Gelas älskar den här lilla byn. Hon älskar våren med alla blommor och fåglar. Hon älskar månen och stjärnorna men mest av allt älskar hon sina föräldrar. Varje vår går Gelas till en blomsteräng nära byn. Då brukar hon ha en ny klänning. Hur ska Gelas kunna få en ny klänning? Det får du veta i ***Gelas om våren***. Där får du lära känna en flicka i Kurdistan- hur hon lever, vad hon fantiserar och funderar om. ***Gelas om våren*** är en barn bok, skriven av Fahmi Kakaee, med många vackra färgillustrationer av Kamil Ali Ridha. Den är på 40 sidor, inbunden, i stort format.




***Naturia***

Jag beställer

............ex av *Gelas om våren*,

ISBN 91-604-0247-4, pris 99:- (ord bokhandelspris 131:-).

Namn:..................................................................

Adress:................................................Postadress.......................................................

Skicka beställningen till Naturia Forlag, Box 42053, 126 13 Stockholm
Eller faxa på nr 08-709 05 30. Tel: 08-709 04 13

www.arsivakurdi.org


# Rastkirinek

**Di hejmara 5. a Çirayê de, şiîra Dilbijan ya bi navê Dengê Diholê (r.51-54) bi hin şaşîyên teknîkî hatiye belavkirin. Bi nameyeke agahdarî ya Dilbijan em li jêrê wan şaşîyan li gor rastkirina wî dinivîsin:**


| RÊZ | ŞAŞ | RAST |
|---|---|---|
| 1 | Gava ez hatim min Ewrûpa dît | Gava ez hatim min Ewrûpa dî |
| 7 | Bo dermanê çûme ba Kurdan | Bo dermanê derd çûme ba Kurdan |
| 10 | Da ku ji wan re vekim baxçekî birînan | Da ji wan re vekim boxçıka birînan |
| 12 | Xudê dizane dil bû gola xwın | Xudê dizane dil bû gola xwîn |
| 14 | Ya ku min dixwast bi dil û hinavan | Ya ku min dixwast bi dil, hinavan |
| 17 | Ceger peritî dil birîndar bû | Ceger perritî dil birîndar bû |
| 20 | Dujmin berhemd kir zor bi nemerdî | Dujmin berbend kir zor bi nemerdî |
| 23 | Nanê xwe dixwin li nav Kurdan | Nanê xwe dixwin bi navê Kurdan |
| 31 | Min pêşta digot Kurdên me yên lı vir | Min pêşta digot Kurdên me yê l' vir |
| 34 | Kurdî dixwînin bo Kurdan miraz in | Kurdî dixwînin bo Kurd miraz in |
| 36 | Ji bo Kurdistanê ew didin bacê | Ji bo Kurdistan ew didin bacê |
| 38 | Ji bo welêt didin rûh û can | Ji bona welêt didin rûh û can |
| 40 | Hemû mirazim hewekî xew bûn | Hemû mirazim herwekî xew bûn |
| 47 | Min dît sosretên giran li çavan | Min dîn sosretên giran bi çavan |
| 63 | Min zeft neanî, ew xeber pirsî | Min zeft neanî, ev xeber pirsî |
| 64 | Bi lerr û ricaf bi gelek tirsî | Bi lerz û ricaf bi gelek tirsî |
| 65 | Min go hevalno! li min biborîn | Min go hevalno! li min biborin |
| 72 | Ew ji Turkan re gelekî xweş e | Ew ji Turkan re gelekî xaş e |
| 81 | Wan hevalan bersîva min dan | Wan hevalana bersîva min dan |
| 83 | Bersîv ev bû hûn jî guhdar bıkin | Bersîv eve bû hûn jî guhdar kin |
| 100 | "Dengê diholê li dûr ve xweş e" | "Dengê diholê li dûr verra xweş e" |

www.arsivakurdi.org

# Ji Weşanên APEC'ê pirtûkên nû




Biha 80 kron




Biha 80 kron




Biha 80 kron




Biha 40 kron



Biha 150 kron





Biha 40 kron

Her kes û dezgehên ku ji 10'an zêdetir pirtûkan bikirin, ji % 20 ji wan re erzanî heye.
Her weşanxane an jî kitêbfiroşên ku ji 100 daneyî zêdetir pirtûkan bikirin, ji % 40 ji wan re erzanî heye.

Navnîşana xwestinê:
APEC-Tryck & Förlag
Box 3318
S-163 03 Spånga/Sweden

Navnîşana seredanê:
Spångavägen 345
Tel: 08-761 81 18
Fax: 08-761 24 90

www.arsivakurdi.org
















www.arsivakurdi.org